

**Gêj dimeşe,gavê te**
**yî westiyayî**
**li ser her deştekî**
**sexte  ji deştên**
**welatê min e**
**dagirtî birîn .**
**Ev cîhan bi êşê**
**dagirtiye**
**dema ji boriyên**
**hêsiran mîna**
**deqên avî derbas**
**dibe**
**xema afsanî ji xwe**
**re dibe.**

Rêber Hebûn   Rewrekên xwînî   Deq

**RÊBER HEBÛN**

# REWREKÊN XWÎNÎ

**DEQ**

RÊBER HEBÛN

# REWREWKÊN XWÎNÎ

DEQ

*-Çapa yekem: malxaneya Sersera 2021*

**-Amedekirina wêneya bergê: Rêber Hebûn**

*-Navê pirtûkê :Rewrekên xwînî*

*-Daner: Rêber Hebûn*

*-Cure: Deq*

***(Mafê çapê ji daner re parastî ye, ne ji mafê tu sazî an çi kes ku bê erêkirina nivîskar vê pirtûkê çap an kopî bike.)***

- **Jimarkirina navnetewî :** ISBN 978-3-96640-160-9

*Sersera ( Dr. Med. Bashar Moustafa)*

*www. Sersera.com*

***REWREWKÊN XWÎNÎ***

***RÊBER HEBÛN***

## Diyarî:

Ji herdû çûkên min in niyaz re

Cêwiyên dil û mêjî

Pêljîn û Pêlvîn.

Ji Hebûn re

## - Hebûn - destana heyîna dilgeş

**Bi germbûna niviskarên perwer,dixwazim li ser te binivîsim, evîna te neqşeya birîna giran e, di jiyanê de di ziqaqên wateyan de derbas dibe,niviştê gotinên bi bandor xelatî te dikim,seyrana herî demdirêj bilêv dikim,dema ez li ser jinekê,ji min re dibû ew navenda berz dinivîsim,li dûr wê hemî xewinên min ên destpêkê û dawî dizvirîn,jina welêt, bîr û nirxên sirûştî .**

**Ew legena lihevhatiye,têde nakokî bi aramî dijîn,hemû êşên jiyanê û hêviyên wê dirazin,û bi dawiyê,emê bi mirinekî werin xelatkirin,bê ku ji vîn û mezinahiya me şerm bike.**

**Ew viyana ku me pê rikberiyê hember wêranbûnê kiribû,bi hemî şêwe û pêveçûnên wê.**

**Ji binî nawestim,dema behsa evîna xwe dikim , giyana ku min bi her bêvilbilindiyê hembêz kiribû ,min xistibû buhiştên nalîn û hêviyê, dev ji min bernedabû, ji ber ku dinav de her nepeniyên zaroktî û kenên navnîşanên çirûskî diyar dibûn.**

**Nivîs jî derbirîneke ji pirsên me yên avis re , dikeve bîrê me û di me de digere , bi nermî me nîgar dike , ji bo me li ser tabloya xewindar û lihevhatî de bineqşîne , dema dixemile bi rengên gulên nû vebûyî .**

**Ew peyv ji bêdengiyê hez dike, di gavekê de ,hezarên peyvan ji zikê xwe derdixîne,wan ji zîndanên kûr û tozgirtî**

**rizgar dike, û  evîn  wê bi şewqê rehniya xwe ji nû ve dixemilîne,zendê xwe ji xewinên min re vedike, dema bedewbûnê dimeyzîne bi çavekî xewî ,û di vê gavê de ez bi her çaxekî hestbûyî mijûl dibim, ji sertbûna tal û gêj dilsar dibim, madtirşiya dêmê bi kenekî girs pêşwaz dikim, û di talîzoka mezin  de pêxwas digerim , mîna xewindarekî dimeşim,bêhêviyê diçirînim, û di bîrêkirnê de her kovanekî bêhiş li ser kevirekî digurînim,bîrêkirina xwe ji te re hildigrim,ta dawiya jiyan û cîhanê.**

**Ez derbasbûyî me mîna sihan, tenaziya xwe ji sêwir û nîgaşê re diyar dikim, û ji dawiya xwe re hestekî durist ava dikim, ji ber ku ez rastî dijîtiya leylanê dibim,gava evîna pîroz dinirxînim.**

**Ew leylan mîna mirinê ye, tiştekî berçav e,goştekî xav e,li benda dîtina êgir e.**

**Ji te re dinivîsim,hewesdarê evînê me,henaseyên me lêvekar in ku bi heman şêweyê  bi bedewbûnê re bizewicin ,ji ber em doza xelasiyê dikin,di riwê demê de, û tîpê xwe di cîgeha giyanê de dineqişînin.**

**Xwe di leylana te de vedişêrim,dibim tîrêjekî gêj, bi avên helwestên nermûk têm şuştin,û de her kêliyê de ez xwe bi buxçeyên tenikbûnê digerînim,ziman dikim e**

**ezmûnê,ji bo ku bibînim heta kîjan radeyê dikare henaseyan têbighe.**

**Cîhaneke ji stranan xwe di min de binyad dike,di ziqaqê wateyan de parsê dike, xwe bi aramiyê jî dipêçe, bi**

**rehjenên me re dibe yek,ta bigihe dawiya rê,ta bi bê re bibe dostekî durist.**

**Dema reben bi te re paşguh dikim,bi kenên te yên sibehî ve hespên peyvên xwe yên bê bask difirînim,bi her şînbûnê ve,ez di buhiştên sîngê te de xwe dişom,ta ku ez mîna jîndarekî rehnîkirî derkevim,rengên xwe dirêjî qadên ezmên dike.**

**Mîna bahilkêşanekî ji binefşê û henaseberdanekî ji çemên çiyayan,temenê nîgar dikim.**

**Dinivîsim,taku ez hêjayî ramanbûnê bim, hember bejinê çiyayekî bilind dixwazim rengê zaroktiya te li ber newal û kendalan de bibînim,berve min ve ew bayê tenik tê,xwe bi eyazê ve girêdidim,astên rehjenê gav bi gav jiyan dikim,xemên bilûrê diparêzim,bizqa winda ji devê talanbûnê dûr dixînim,û ez wî radestî aramiya bi guman dikim,bi awayekî cuda hêrsa nivîsê jêdibim,sirûda avê ji buharê re dibêjim, şîn e ew pêl dema di hundirê min de tê sotandin .**

**Gêj dimeşe,gavê te yî westiyayî, li ser her deştekî sexte ji deştên welatê min e dagirtî birîn .**
**Ev cîhan bi êşê dagirtiye,dema ji boriyên hêsiran mîna deqên avî derbas dibe , xema afsanî ji xwe re dibe.**

## Arezû

**Jerkî henasên me bi xembariyê ve hatibûn girêdan,me hewlidabû ku li bayekî bihinxweş bigerin, ku sibehê ji mêyatiya serhişk re vegerîne,û têkiliyên me bi bîrêkirinê re destpêkiribû,bilbil û qulingan ji penaberiyên bîrêkirinê rabûn,ta ku hewl bidin par vegerînin,bi her êş û awazên xwe,destpêkiri bûn bi hewldana vegerandina rehniyê ji zelaliya şevê re.**

**Şemalên hêviyê, bi xemê nameyên westiyayî ve dileyztin, xemên me yên kevinar pê bandor nebûn,xwastinên me li gel arezûyê mezin dibûn, bi felekê re di cîhaneke gerdûnî de em dibezîn,di şewatên me de pîzotê dilivandin,xewinên me yên veşartî aşkere kirin, bawerkirinên bilindbûnê berve jor ve berba kirin,ta ku siberoja dûr biçespînin.**

**Di vê tuxûba fereh de,em rêwind dibûn,û me ferehiyê pîroz dikir, pelên me yên tevlîhevbûyî têdana me pesindan dikirin, di hundirê me de nalîn û şopê tengezariyê ranewestiyan, her bi dû kûrahiyê diketin.**

**Adar sirûda bîrêkirina bedew e, ma wê çawa me neyne ziman,û ew di me de dijî, çavên me bi kilê baranê ve rengîn dikir û depên xwe di me de nîgar dikir,bi bihna şengebiyê xemilî bû .**

**Xewinên tenik hewil dabûn ku kovanên bihinxweşiyê bi gulên xwe yên dirêj û qirik xwar ve dergehên ronahiyê vekin.**

**Êvara bêdeng, bîriya birînên me yên bêdeng dikir, û roniya tariyê  reşiyê di hundirê me de vedimrîne.**

**Destên xemgîn ji berîdê qurmiçkan ve berz dibin,di gulxaneya gul de rehjen radibin, mîna xewinên me dipijqin,li pey xezalên metirsiyê dikevin, hêsirên heyvê di asîmanên ezmanan de,dûr belav dikin.**

**Ev  hêsir di dawiya  ziwabûnê de gulgulî dibin,ji vedenga henaseberdanê ve dertên, di hembêza mişextiyê de mîna alekî hildayî dimînin, rikberiyê bi mirinê re dikin,  kenê şîn li ser maseyên hevdîtinên qurs de vedikin, tovên xembariya durist diçînin, û şitlên gulên terikî belav dikin,dikevin genciya bîra gengaz de,mîna çilpika xunava dev bi ken,çendîn em li ber zivistanê dikevin,û di zivistanê de em bîriya havînê dikin, û di  payizê de,toz me jibîr dike,em pencereya odeyê vedikin, ta em ji nû ve xema heyvê pêşwaz bikin.**

**Gelek caran em ji  dayîn û ciwankirina jiyanê diwestin,dewsa em piran çêbikin, em xwe di paş piştê bêdengiyê vedişêrin, xembar dibin, tiştê min diêşînê birastî,ku ez di hemî şerên evînê de serkeftî bûm û rastî çi sikestinê nehatim, ez di hola evînê de,bi rola hişmendekî dirabûm, lê ew yar, bi rola gelê ê ronakbîrê xwe bi kevir têwer dike dilîst, lê vê carê ez li hişmendekê digerim,evîna xwe bide min, bi her rebenî, tîbûn û bedewbûn,û ezê jê re bibim,gelê ê başiyên wê yara nemir di xwe de dihêle.**

**Ger ew evîn,hundirê me neguhêrand, sûda xwe li ser me çiye?!**

**Eger di me de cîhaneke aram ne afirand,wateya hebûna wê ji bo me çi ye?**

**Eger reweştên me jênebir,ew çi evîna perîşan e, a ku em bi serê zimanê xwe yê tevizî tînin ziman?**

# Azadî

**Lajeyên eyazê ye,nayê qutkirin tevî bendan.**

**Şepêla pêngavên bê hijmar e .**

**Bisteke eşobûyî ye, di kûrahiya huş û sewda de .**
**Kerxeya xwe di nav tehtê tariyekê de berqef dike.**

**Golek rizgariye, di nav nizimbûnên mildanê, hemî dilên westiyayî bi ponijiyeke dirêj şad dike.**

**Ji maskên sextebûnê direve, di kêlîkên me de derbas dibe, çîrokên jiyanê û romana felekê werdigerîne, dergehên penaberiyê lêdide.**

**Ji azadiyê re zimanên erdê , gûşiyên zeviyê, kulîlkên naring û gulnarê, ahînên bin xirbeyan, vejînbûna şoreşên xwedawendan e .**

## Bangên du dînan

**Ew ji bermayên bîrêkirinê ye,di jiyana giriyê min de ye, niha hêsirên wî kêm têne dîtin di salên zuhabûna min de ye, dema ew koç kir, rehjen pê re çû, û bi rasthatinekî qirêj mîna kutrakoviyeke barkirî wenda bû.**

**- Kî ramûsanê te yê har li rêyên aramiyê û dêmê wê de winda kiribû, ji min re bibêje ?**

**- Ez jî dipirsim, kî maçê min e niqişandî li ser eniya wê wenda kir, nayê bîra min , çi têkçûn ez çekirime li kêlek cihê gemarê xwe de,ez dojeha xwe , gilêza şadiya xwe yê rêwî dimêtim.**

**- Kî girnijîna payîza zer ji riwên te yê penaber jêbiribû,ey evîndarê yê di zîndanê nehişiyê de rûniştî?**

**- Nizanim hevalê min,baş bawer im ku ti roman nikarin diyar bikin tewanbariya dîrokê di sizaya xwe ji me re, ez bi stûpêça dilê wê ye tenik ve girêdayî me, hezar ax di westabûna min de serberzik dibin, milyon qêrîn di zengelorê min e xirbelixbûyî û dengketî de, cenga xwe amade dikin .**

**Zêdetirî milyar hêsir min di her şevê de reşkuj dikin,tevî vê jî leylana wê bi azarî û biyaniya min e xweperest ne diramî.**

**Ev çi hestekî bêjiye hewl dide ku bêdengiya wê min jibîrkirin bide,bêdengiya wê ya fetisî, paytûnên sersaxiyê rahijtin.**

**Ji min re mermerê gora min çêkir, xewinên min roj bi roj tên e jêbirin,êdî cîhan pêş çavên min nema fereh e, ta dilê wê di nav dilê xwe de rakim, dengê wê di keserên xwe yên rêwî de ,di ferehiyên pîzotê de hilgirim, bila rondikên min bibin find, keşe û nimêjgehan ronî bikin, zengelorên pepûkan rabikin.**

**Ezê giyanê wê di dil û gorê xwe de hilgirim,ta bibe zengila mehderiyê, di jiyana nemiriyê, herdû rêyên me dirêj in heta dawiya cadeyekî jêkoçbûyî ji cadeyên koçberiyê .**
**Emê peyalê bi mey , westabûn û rikeberiyê ve av bidin, xebata me ku em bibin penageyekî ji her balindeyekî hêlîna xwe winda kiribû, ji her kaniyekî re bi bêdengî û tewandina zelal ve dimeşî.**

**Emê nepeniyên firindeyên barkirî parve bikin,ta vegerin hêlîn û çûkên xwe, tevî ku rêya min ew pîzota sotandiye,ezê di nav de sermedî derbas bibim, tevî ku agirên bînvedanên wê li ser qeşaya xemxwariya min de gur dibe,laşê wê ya xemilî bi hevrişm û narengê, gemarê neyartiyê li ser bîçimên mêyatiyê jêdibirin.**

**Çendîn tu ey şeva temenê min sertî .**

**Çendîn awareya te tûj e, û sîbera min nazik e, dema pistepist dike, leylana yara min vexwastin dike, dema bihnxweşî li dûr tengalên wê yên dagirtî û di nav lêvên wê**

**yên xwe tevlî bonga deryaya gilover dikirin, û li ser memikên wê yên hingiv jê dinqutîn.**

**Ew mûdiya sar e, di şaneyên tevinê min de cîteng dibû,çendîn ew dudil û kujer e di kûrahiyên min de,ew bêxewiya min e , min ji piştrastî û hejêkirinê vediqetîne,xwezî ku serdemî ez jê rizgar bibim.**

**- Tu ronîkirî yî bi zelaliya giyanê xwe, û kî jê re zelalibûn par be di vê hebûna qircir de,ewê xudanê jîndar û leylanan be.**

**Giyanê te di kenarên sêwir de ajniyê dike,stûxwar e mîna stêrkên zivistana sar beranberî hembêza te yê lerizî.**

**Hîn hêsirên te yên nazdarî ,bi dan û standinên rondikên wê gur dibin,eynikên çavên te yên ronîdayî xwe pê dorpêç dikin, şevbuhêrkên fetisandina xwe li ser milên te de di bîr tîne,li jor sindîgana diyarbûna te de xwe ditewîne, pala eniya xwe li ser baniyên hilma te datîne.**

**Ew peyva gazindê ye, hêsirên hûrikê, darêjeyên seqemê ye û fermiskên tozê ye yên dev ji benderên bayê min bernedan.**

**Ji wê şerfiroşiya neyînî rizgar bibe,ew te tar û mar kiribû,fêrî tembeliya hêviyê nebe, çênabe ku em bi ahînên bêkêran lajebêj bibin,lê pêdiviye em li rengên ahînên xwe bigerin,berî ku li deriyê ahînên kesên din bidin.**

**Bi qerebalix û xuşiya fetisî,li ser evînê ji min dipirsî û bi xwe jî bersiva xwe da : ewa hestbûna bi têrbûna ji laş e û**

**dûrketin e ji wan keçika nimûne,yên wekî mêran e,  û eger evîndarekî xwest  ku xwe bi wê re têr bike û raze,wekê ku bi mêrekî re bike, ne zêdetir.**
**Gerînên vê jiyanê kurt in û helwestên wê yên hêdî hêdî têne guhertin û jêbirin, jiyana me ne romaneke,lê wekî hinek kurteçîrok in zor kin in, rewşên me yên rengîn û guherbar dişopînin.**

## Bangên jinekê

**Ji mêyatiya xwe westiyam e,ez penageya nîva xwe yê binpêkirî dibim,dilê min gulistaneke,payîz wê her salê dixe girtîgehê,jiyana min rastî kenara wendabûnê dibe, gewdeha min dirêjiya derya û ezmên e,giyana min jî gemiyeke di nav xwe de giyanên jinê hildigre,li mêrekî digerim,tariya min êrîş bike,di tariya bêdengiya min de awaza şahiyê vejîn bike,li ser porê min e zêrîn pife bike,ta ku di keziyên wê de çirûsîna rojê sax bike,bi çavrîna tiliyên xwe sêvên sîngê min damale,çendîn bêdengî wan westandibû,û gihabûn wan bêzar kiribû,û rakêşerî wan bê rewş kiribû.**

**Keçkaniya min jêdera zelalî û pakiyê ye,nepeniya xwedawendiya jinê û pîrozbahiya wê ye,mildana mêr bi viyana xwe yê evîndar jê re ye, di hizrê min de hinek raman li ser evînê hene.**

**Ji jinekê re ku li ser eynikên evînê hate rûxandin, ketina xwe pê xweş hatibû, li ser eniya xwe de jî  wê ketinê tomar kiribû, di eniya dilê xwe de bawernameya rojbûneke din danîbû .**

**Ji jinekê re ku serdemên evîna xwe vekir,nîşana dilsoziyeke berz .**

**Ji mêrekî re ku hez kiribû.**

**Ji her jinekê re ku çû qurbanî têgehên jêgirtî ji bapîrên xwe  jina binkeftî , dinivîsim.**

**Ew welatê yê  em daxwaza wî dikin, ji ber vê yekê jî,evîn mezintir e ji ku bê danasîn  an em xwe jê re bikin berdevk .**

**Rizgariya tek ji tenahî û hestbûna bi wendabûnê ew e : ku em di jiyanê de bi hevbeşê xwe re yeksan bin, ji ber ew tevahiya temenê me ye,di mêyatiya me de ew xemgînî û koçberiye,bîrêkirina dînbûnê di me de ye,ma emê çima di cîhana xwe de pê mikûr nebin ,û bibêjin ku pîrozbahiya me bi rewşa wî  ve girêdayî ye,yê naveroka me dagir dike,ew evîndarê ku dîlaweriya xwe di me de dibîne,de em wî rizgar bikin, ewê yê bi xemgînî û bêdengiyê bihinkirî,de em wî bahilkêşan bikin.**

**Ewê ne diyar ji çavên me,ji kevinê kevin de,de em wî hembêz bikin, ji ber vê jî,ji ber ku ez li ser xwe diaxivim,li ser henaseyê xwe yê bîriya hembêzkirina kesekî dike,weke jineke xwedan dil û hest, pêdivî bû ez vê yekê piştrast bikim,di belavkirina peyvan li ser yên beşdarî min dibin, bi vê hestê mirovî.**

**Emê çawa bi çanda evînê re a ala wê,rêxistina yekîtiya zayendî radike  binyad bibin!?**

**Di hundirê min de xewinên rastî hene,bêhêviyê vedişêrin,şewqdana jiyanê vedigerînin, rêk û pêkbûna xewinê dûbare dikin.**

**Bang dikim ji bo rabûna jina ku binkeftiyê bi hewldanê dişo, û bi qerebalixa xwe pevbendên baskan derbas dike.**

## Bazdan ew penage ye

**Netirse ey sih, xemxwar nebe,çavên min ji dîmenên te yê bi êş qerimî bûn e,bizdana te nûnertiya rewrewkê dike,dem hat ku tu neynûkên sermayê bi keritînî,bi kelgiriya xemgîniya xwe.**

**Tu nameyên min ji sindoqa têlxaneya zivistanê vedikî,tu mîna tariyê yî, li ser min dibarî,ez ji te ey ajal bêzar bûm e, min bi lêmiştê gumaniyê çiz neke, dem hat ku tu ji sîberê min bawîşka avê ji sîngê avpijînkê vexwî,cilên gularezan bikirî ,di gomên dînbûnê de noq bibî, hejar nebe dema tu ji şeva min bê guh derdikevî, tu ê li du qoçan digeriyayî!**

**Ey sîber,rengê xwe jibîr bike,li ber xwe dikevim ji ber ku ez vegeriyam e careke din bi te şobe bibim,piştî ku min te bi deqekî berê da axaftin,û va ye dîsa li dû te dikevim,
ey sîtava dilreş,ji dûndê xwe dûr bikeve,ji ber ku sexte ye,hêrsa wê li ser ra firya,bi bêdengiyê serpereştiya te kir,te bi qutbûn û dûrketinê kevir kiribû, de aram be,û pozbilind be mîna gavînê,tazîbûna giyanê xwe bi serkêşî binixumîne,ji jiyanê re bibe xwelî, li paş xwe nenêre, bi kesên ên li pêş xwe re hevdîtinê çêbike,ji ber ku ewan wekî çi kesên ên ji paş te ve derbasbûn e,dev ji sawîlkên arezûyê berde,pirên borî vepeçinîne,ji kokê ve hilkişîne,li ser kavilên tirsa xwe ji birînê re raneweste, rabe ta ku bermayê bersiyan,çav li gavê te bikin, nebe ji bilî ku tu nebûyî ta ku bibî, wisa çavên yên te li nav çaterên pirsên xwe ve avêtinbûn wê te pîroz bikin.**

**Ey saya jiyanê,tu paş reşatiyan dereng derbas dibî, ji kuxika raketiyên ên di zîndanên teng de ditirsî,zîndanên ên ji kesên şipya tije bûn e.**

**Xilopilo nebe , eger aramiya pêl,te bê omîdî kiribû, jê nexwaze tiştê jorî karbûna wî bibe sayekî hişmend,bi aliyê kûrahiya bê nîşan.**
**Ey sîber..**
**çendîn ez bi bîrêkirinê li ber aramiya te dikevim, ez bergerîna serhişkbûna te me, tu li ser xwe dilovan bî, awir bide neberçavbûna xwe, fêr bibe çawa tu bi seqemên bihndana xwe hest bibî, ji filanekî nexwaze bi te bervenêr be, dibe ku ew di têgihiştina te winda bibe,û dibe ku erd ji bendewariya xwe,di wî de teng bibe,bê bawer be jê,dema rêjneya silavên xwe davêje te, fêrî penda lêxistinê bibe, dema di deryayên tariyê de derbas dibe.**

**Ji nediyarbûnê,em riwên kesên pirjimar dibînin, û ji birînê em derbas dibin çanda rûmetê.**

**Hêdî hêdî rengên çirûsînê pêş me derdikevin,doza me aşkere ye pêş xefê, û em bazdana xwe berdewam dikin.**

## Bêdengî

**Bêdengî,kêliya destpêkirinê bi gengeşeya hundirî ye.
Hawirekî ji derdanê hest û rabûna wî ji dil e .
Bîsteka nalandin û gazinda peniye,û ponijîna gerdûnê, ken û kûrtê wê ya bi êş e, bi dabeş û tevinên wê ya tevderbasbûyî.**

**Dema em tiştekî winda dikin,û ji kesên din ve vedişêrin, em bi beza li paş xulekên jiyanê bi westabûn berdewam dikin.**

**Li ser asoya sipî de,em bi ramanbûnên xwe destpê dikin,bi sersamî,pêş buyeran bêdeng dimînin, hayhoyên xwe,bi pêtîbûn berdewam dikin.**

**Bêdengî zimanê avrazbûnê ye,di zehmetiyên jiyanê de,rengên xwe di gul û qurçên giyanê de,namegerî dibe .**

**Dema em li dor cîhanên xwe de dizîvirin,bi rêya bêdengiyê namesazên gerdûnê, şîretên sirûşt û jiyanê vedixun.**

**Em ji bêdengiyê,zimanekî ji dilrûniştina taze diafirînin.**

**Em namegoriya hestbûyî a bêhindar, di rûberên zeviyên ên bi stêrkan ve xemilî ne saz dikin.**

## Bêhinvedana şademaniyê

**Ez dizanim ku bedewtirîn xewin,yên hîn em negîhane wê,rûberê xewinê têr nake ku ji me re bibe metirsî.**

**Sîber bêzar e ku me kêfxweş bike,evîn derdikeve ji pencereyekê ta ku têkeve pencereyeke din,bi navekî sext e û cilekî serçemandî, her sozekî ku zimanê wê berdide ,bîrê wê pê ne agehdar e .**

**Dizanim ku çi tiştê ku di riwên me de dikene derew e.**

**Her azariyekî li ser davekên xemên me de dîlanê digerîne xapandin e.**

**Çi pêkenok bi vedengê kenên me ve tê girêdan,wek giriyê ye, em bi bêdengiyê an  bi bêhêviyê hest dibin,ev serdema devgirtina xemgîniyê ye, êdî keser ji sîngên me dernakevin,lê ji xwastinên me yên pirbûyî derdikevin,bi lerzên ku cudabûnê nakin di navbera mermeriya hest û pîsbûna xuristiyê,dema li ser textê azariya bala de rûdinin. Divê em guman bibin bi rastiya ku hest û nihadiyê cihên xwe bi hevdû diguhêrin, dema ku di kiyanê mirov de rûdinin.**
**Henek an jdilî, bijarekî sêyem nîne, henekê giran  an madtirşiya yê mirov digihîne xwîntaliya tarî û çi bijar e nîne.**

**Ev cîhana tundirewî û efyûnkêşiya xemxwariyê dikşîne. Dibe ku xwedayê heyî berpirs be li ser van qerebalixan, derewa wî nakeve di serê piraniyên mirovan yên rêya pêşkêşkirina qurbaniyên mirovî bi navê wî derbas dikin, Ev cîhaneke bi seyr e, seyrbûn êdî bêzar e ku wê şîrove bike û biyan e bi girêkên xwe  van peyvên min nivîsandin, û ez pê hest dibûm bi awayekî hûr, tê wateyê ku nivîs li cem min derbas kir rewşa derbirîna herdemî, êdî bêhtir diket naveroka perwaza lêgerînê li ser tiştên ku di hundirê min de veşartî,tiştê ku ez pê dizanim, ku min dorpêçkirineke bi seyr li xwe danî,dibe ji bo ku ez bigihim rêyên ku ne li ber çavên min de bûn .**

**Ez gelekî dizanim bi tiştê ku min afirandibû,pevçûna dihû li ser min nû bû, ku ez bikevim deverên belavbûyî, zehmet e li ser min ku wan bi awayekî xuyanî şîrove bikim û çima niha?**
**Tiştê bi seyr ku ez tême gêrkirin berve reweşt û pergalên ne girêdayî bi min, ez dîsa bi bêhêviyê matmayî bûm e,  bi nêçîrkirina penageya xweş,lê xewin wek ku ez dibînim, rastiya hebûna aşkere ye di cîhana nivîsê de û hebûn jî nepeniya aşkere ye.**

# Xêr

**Xêr ew bangawaziya mirovî ye,ê mayî û berdewam,bin siha dilxwastin û çavkurbûnê, ji destpêkirinê re meraqekî hemdemiye**

**Bêr berz e,di henaseyan de, çarenûsên me bi xêrê ve girêdayî ne.**

**Kole pir dibin,û bi lez bizdanê belav dikin,ji ber ku ewan,koleyên dilpijînê ne, û kujerê bêrê ne,û dadavanê agirên pepûkiyê ne , di mehrecanên çûk û bilbilan de,di ahengên zeviyan û buxçeyên gulan de berz dibe,bi ola sirûştê bawer e.**

**Ji jîndaran re,çokdanê dike,di çavê hebûna fereh de belav dibe, di firtikên nên ê ji zîndinyan re tên e avêtin .**

**Bêr zaroanîneke rast e ji narvînekî seredayî re,û sozekî ji jiyanê re , û gefdanekî ji nemanê re ye.**

**Û Pabendbûnekî ji xwestekê mirina nexwende re ye .**

## Berî vegerê

**Li ser lutekya pîzotê hildikşim ta ku tozê jê bibim,rengê wî ya bêkêr li ser pencereya valahiyê bihindan bikim,di nermiya sîngê te de derketina xunavê bihin dikim,wek roka memikê te yê li paş kakêşa tariyê de girover e.**

**Bi malzarokê sihikê xwe diqemitim,ev xwastina wêraniyê ye,ku lêborînê ji kokelên qêrînê bixwaze,lerza girover yê di qirikên me yên xwêdayî de bi cih bike.**

**Deriyên mirinê ji hev dikim,ji ewrên ku serê xwe bi pepûkiya xwe rakirin e,pêş sertbûna heznekiriyê û serdavên asêkirî,di katê xwe de vedikim,dîmena reşatiyê digrim,serê xwe li ber dergehên – Hîroşîmayê - radikim.**

**Mîna ewrekî li ber candan dibim,bi roçûnê tevhev dibim,,paş hêlînên marên yên nema fişfişê dikin xwe vedişêrim,ji eniya xwe re sihikekî çêdikim,axdariyên xwe yên dûr bilind dikim,bermayên bê omîd di berxaneya piniyê de datînim,girî bû lîstok,ji nişkê ve hêsirên me li ser boşbûna hest û bênirxiya bi êşê ve hatin xwar .**

**Pakî nepenî bû,seqem cihê xwe li ser darê evînê de girtibû,de vegere ji mirinê narvîna min,derew miriye,û rastî mest e,û valahî şêniya mirina evînê di her cihî de belav dike, wêneyên xwekuştiyan li ser dîwarên awazgehan de diqemitîne,li qeyseriyan de dîmenan weşan dike.**

**Ez nema bergerînê ji kesekî dipejirînim,ji ber benê dilnermiyê qetiya,ez bi ser neketim.**

**Min te winda kir ey hevalçûk,min bi dawiyê,xewinên berşîrkan winda kiribû, dirinde û reşatiyan ketin zîndanên xewinên min,ev hemî ji gavînê re, ji pepûkiya belaş re, ji kîna erzan re,ji kelevajiyekî re nav lê kirin hêvî .**

**Girnijîn di me de bi zorê birin,û zaroktiya me çekirin dojehê, û bihna êşê ket hinava bihinxweşiyê, ji ahînkişandina awazê re,rawestgehên xewinê me dinivîse,ta li berbayê vedengê de belav bibin.**
**Çendîn bîranîn bi seyr in,çawa me mandele dikin,dema min ji yara xwe sozekî xwest, dara evînê di çengên wê de şikestin,û çûm ta ku ez şêniya evînê ragihînim, û ne diyarî simên xwe derxist,yar li birîna xwe xist û bi jibîrkirinê jiyana xwe bi dawî kir, mirina wê gur bû,li aliyên penaberiyê de,bû stranekî nema rawestanê li ser daveka êşê dipejirîne,wisa em çirûsîna xeyidê qezinc dikin, ji keserê jinekê,di çavên xwe de xewinên berşîrkan veşartibûn, wisa em bi henaseberdana evînê diketin, û bi çempilê bîrêkirinê û penceşêra metirsiyan û taya sêwirê hest dibûn, ew tev zora me dibirin, û yê din  sertbûna xwe li pêş çavên me radiwestîne,xwe li ber me digerîne,tenaziya xwe bi sêwîbûna bêdengiyê me dike,ev seyrbûna me ye,rewrewkê çêdike, encamê ji dilsariya me digre,dil pêş wê rabû mîna balindeya bîrêkirinê, ji eynikên seyrbûna me, li ber qeraxên mestbûna me serxweş dibû.**

**Ey çem ,ey damarê dengên min e hatî ji jiyana şewatan ve ,kêlek dîwarên serbirxaneya kirêt,bê tirs li ser pirên gumanî û metirsiyê derbas dibin, ez di peyala vêketina xwe disojim,armanca min ku ez di dirêjiyeke bê dawî de bifirim,min gelek li piniya arziya xwe ji evînê re lêkolîn**

**kir,tevî ku dev ji min berda û pir li ser kêliyên belavbûyî di cihên dûr de,lêgerînê kir, ji ponijiya min re windabûn bi tevahiya xwe xwe dabû min,çendîn bîrêkirin me bêxew dihêle,di dema xwastina vegera rizgarkaran.**

# Bîrnameyên birçîbûnê

**Birçîbûna girover mîna maseya girover e di civîneke dirêj de.**

**Kêşeya xwarinê,di neqşeya serê -Birnadoşo- yê serrût de tê xwyanîkirin.**

**Kesên birçî êdî genî bûn e, bê sizawerî ne,bê hiş in mîna stûvankên mêrên karan .**

**Di her quncekî ji goşeyên gemarê de,- Bedir Şakir Eseyab – li gel - Ezîz Nîsin - digere, ta sedemekî rastî ji kêşeya birçîbûnê re bibîne,û bi dawî herdû bi qalikek moz dişemitin.**
**Li ser yek rêyên yên wan digihîne qultênekî têde hemî hêsirên kûndan û gêncên kolanan civîn.**

**Tenê reşatî bi wan xweş tê , serdankirina malên kavilbûyî û koçbûyî,li wir rastî sihên xwe tên,ev birçîbûna cadkirî ye ku li ser -Urwa bin Werd - diaxive,çawa şagirtekî baş bû jê re, û li ser -Şenferayê - çawa birçî diraza,berve ev bayê kenargirtî,di eniya xendiqandinê de,çîroka wê birçîbûnê û berihiya wî di odeyên vejînkariyê de dibêjim.**

**15-6- 2010**

# Çirûskek xircir

**Kolan bi derbasbûyan cîteng bûye,dengên firoşkaran diçin û tên,qircirên tirimpêlan , toz bi hilma nên û ezmên tevderbas dibe ,li ser katên nîvroya zirz de siwar dibe,hinek stran cîtengiya derbasbûnê dagirtin e.**
**Ez fêrî kenê dirêj dibim,li gel pistepisteke hema nepenî dibe û bi tevinên xweşî û geşiyê tevderbas dibe,nalînên me bi awirên evînê û hilma dînbûnê rastî hevdû tên.**

**Em ji evîndarê dilxweşiya nû ne,bi nûçeyên Nazdarê û Ciwan Haco dilgeş dibin û li pey Şivan Perwer û deng û axaftinên wî dikevin mîna şopandina her siyasetmedarekî an generalekî navdar, evîna me ji jiyanê re ketibû meraqên me yên bêzar,kêliyên me dimînin di me de, mîna xelekên filmên kurt,dikevin xêzên ropelan wek buyerên awerte, xewinên me ji me ditirsin,ji ber vê yekê ji me direvin, li gel eyaza sar û zuha bazdidin.**

## Dema dînbûnekê

**Ji te re dinivîs im,darbestên bêdengiyê dixirxirînim,axîna newalê,pozbilindiya çiyê,bi hemî tîpên yên bi xurtî û matmayîbûn li ser cadeyên êşa dîrokî de rêzî hevdû dibin.**

**Bêdeng hayhoyên poşmankaran ji evînê xêz dikin,û piştî şikênandina qajoya poşmaniya repal lê vedigerin,ji ahînên xwe re ritmên yên bi xemgîniyê lihevhatî pêkînan dikim,ta ku berz be, û li pêş ciwaniya giriyê te de bala bibe.**

**Xewinên min bi giyanê te re bi hev ve ne,li gel wê her dem hevgirtî dibin,sîmfoniya xwe li ser vedenga gengeşeya xewinên binpêbûyî stran dike, ba keziyên porê te hembêz dike,hevjiyanî bi xemxwariya xwe ya veguhêz di me de dijî. Ez hewil didim bibim bilbilekî,çîkvedana xwe ji dengê te distîne,bi evîna te dîn dibe, berve te ve bi xemxwarî xwe ditewîne,giyanê xwe di giyanê te de diçîne, bi ritmên bihinberdana te dîn dibe,dilşikestinên awaza xwe ji dengê te werdigre,balinde li ser te bi min re diaxivin,nûçeyên te ji min re bûkînan dikin,li ser baniyên xaniyan û darên bilind de difirin,qermît xwe li dor kulîlkên avahiyan de dizivîrin,awazên xwe yên dilşikestî min guhdarkirin didin,li ser min tenik dibin,ji bo ez hilmên xwe di nameyên xwe de xelatî wê bikim,ji ber ku ew pakrewanên evînê û azadîxwazên hebûnê ên rasteqîn e ne, evînê wek nameyeke nemir ji mirovahiya rengîn re hildigrin,û çelengên evînê pêtê di tariya henzekirya mirovî de zêde pêtîbûn û birûsk dikin.**
**xwe ji evîneke gewre re yarê amade bike.**

**Di feleka qircirê de,wêranbûn li deverên qerebalixê de bi cih dibin,ez li cihekî ku besî azadiya me bike yarê digerim,çendîn peyvên min ji te hez dikin,çendîn xemên min germ in,hênik in,di deryayê evînê de avjeniyê dikin,bi çavbirçîbûna avê û harbûna nediyariyê,bi bîrêkirin di tênosa bendemanê de nîgar dikim,tenaziya xwe bi bêzariyê dikim,tarî ne rojên koçberiyê,evîna me hema wê taliyê têxe di xefkê hêviyê de,yasmînê li ser sîngê te de guldayî dike,di germahiya hembêza te çêja nemiriya bedew e, ji hilma maçê germ rengekî ji ferehiya baranê ye,di bîbelanka pencereyên vediyar de li ser derbasgehên dûr.**

**Hestê me bi evînê,temenên me dirêj dike,hêviyê dike gustîlkekî di tiliyê me de,cihên rêyan û rawestgehên çolên reş ez derbas dikim,li ser kûrahiya xemgîniyên xwe de hildikşim,bilindiyên wan hest dikim,li dîwarên wan diterpilim,li paş wan ez hêsirên xwe dihêlim,dema bi tirs li pêş afsûna bîrêkirinên min,mîna miriyên bi avê tevdayî belav dibin.**

**Bihinvedana  bêhndana xwe derbas dikim,hewil didim bi aliyê çûn û hatina te biçim û bêm,te tevî mirin û nediyariyê hembêz bikim,wêneya te ya bedew,li ser ropela ewr de nîgar bikim,ava evînê wekî baranê li ser darên zeytûn  û mêwa de birjînim.**

**Sorgula min,te bi xunavê min av dabû, awazên kaniyan te bi min vexwarin dabû, dema zelal  di sêwirê min de sema dikirin.**

**Min di hebûna te de laşên birînên xwe wekî berfa li ser lutkeyeke bilind de belav dikir, pistepistên te bi min re li çol û buxçeyan de bibûn hogir, ji henasê min ve wek pirs û metirsî derdiketin.**

**Tu hilma a pîsbûnê di feleka min e genî de tewanbar dike,kirêtiya tiştan dadgeh dike, beybûn me di katê hembêzkirinê de dipêçe,qerenfîla çiyayî xewinên me gur dike, çendîn bi lez li ser lêvên te de zêde dibûn,dema ez pîçiyên te yên nerm digrim,ji wan  germbûna çi  kesê ku di nîvê berfê de dijî distînim.**

**Ewr xemxwariyên me çavdêr dike,zengilên bazinê di zendê destên te de lêdikevin, tevî gurbûna zêr di te de bi dilşadî,lê ez zendê te bihin dikim,maçekê li ser lepê te de pencemor dikim,li parçeyên laşê te de ez belav dibim,fedîbûna deryayê radimûsim, dema bi te metirsîdar dibe,hingiva xemxwariyê bi tenê xwe dalêsim,dema ez pê re bi tenê ,di aliyeke goşegîrî zerbûyî de ji vê cîhana qîrkirî dimînim.**

**Di hebûneke lal de, awaz têde têkçûn,û bi wêraniyê têrbûyî bûn,bilbil têde hatibûn dûrxistin,bi pêşwazîkirina balafiran desliba kiribû.**

**Te berve sîngê xwe dibim,te radikim ezmên,li ber kûrahiyên te yên  şilbûyî wek awaza vedengê û straneke ranaweste bazdidim.**

**Li bendê hatina te dimînim,li ber maseya  dîdariyê de bêzar dibim,guh  didim dengê kaniyan,li dengên bilbilên yên ji asoyên çavên te ve koç kiribûn e dibhîsim .**

**Mîna rewrewkekî berve sihan bar dikim,di ken û kûrtên êşê de mişext dibim, xemxwarî li ser riwên min de wek sirûdek baran  û keskesorê belav dibe,benên ewr li ser çoxê min e şîn de dibarin,hemî kulîlkên sor ji bona me çêdibin,ta hêsirên xunavê  dakevin xwarê,ji ber ev xemgînî dirêj e, û ev zerbûn di bîrê me de û rêyên wê yên bi tunebûnê  cîteng bûn e dimeş e.**

**Zayîn me xwedî dike,û eynikên pak yên bi ser me de, ji lêvên ezmên ve dibarin ,haj me hene,strana min e dilşikestî tu yî ,û rojbûnekî tu ji hêviyên gelan di azadiyê û jêbirina zorê.**

**Tu desmala min e rengînî,yê  ez pê enî û hêsirên xwe dadimalim,ev peldeng û hilm û goma rakêşer min bi nazdariya xwe hembêz dike,nuxumên germ me vexwendî dikin, ta ku em bi rêya wê,hevdû hembêz bikin.**

**Hilma te digihe rehjenên min in giran,keziyên porê te,mîna gîtara a bi dirêjî êvarê ez pê stranan saz dikim,ji min re li ser nûçeyên bayê zelal bibêje, ma tu dikarî bi tiliyên xwe wî biparêzî!?, ew mîna asîmanê ye, gemarî bûye, di asîmanekî vedeng têde hilma te hilnagre.**

**Gêncîniya şanaziyê ji memikên xwe li kûntarên çiyayan de berde,wek qurşîneke afsûn, sermayê herdem binçav bike,nameyên min belav dibin,li deryayên pêlên te de niqom dibin,wek sirûdeke winda, ez mîna yasmîna sipî li ser nivîna te de û kurtika xewa  sipî de ditebitim.**

**Xulekekî tenê ji hembêzkirina me ji hevdû re,dikare çirûskeke gurbûyî di deryaya xemgîniyên me de pêkbîne.**

**De bila tîrêja te mîna rokê,di çavên min de derbas bibin,de bibe heyvekê,mîzgîniyê ji awirên min re bûkînana bike,de mîna baranê li ser dilê min ê yê di tariyê de fetisî bûye bibare.**

**Ev cîhana evînê bi tijebûna ferehiya xemgîniyê û çelengiya bedewbûnê dilive,di nav de gulistanên dewlemend hene,avweşînkên lehîbûyî di her goşeyekî ji goşeyên wê de radibûn,rehniyên xwe li kêlek me de datîne,min dihêle ku ez bi temamî şadiya xwe li pêş te de rawestînim,heta ku her gulekê êdî xwezî dike ku ez wê çinî bikim,ta ku bidim te, li her bajarên evînê, nîgaşa giyana niqombûyî di lehiyê bîrêkirinê de diçe, çirûsîna xwe mest dibe, ritmên xwe ji stranan werdigre,bi sirûda dilê te re dimeşe, li kêliyên ku dikarin germahiyê û aramiyê di me de ji nû ve vejîn bikin dinêrin,di ritmeke dilşikestî de,bi şanazî di asoyên çavên te de avjeniyê dike,min di şevbuhêrkên dudiliyê de dibe, nîşanên rehniya xemilî,li bajaran de dûr dike,lê belê dêma te,bi aramiya gund berdewam berz dibe,hilmên çiyê û rehjena wî ji sêwirê min re dişîne,qircirên bajaran , cîtengiyên wan û endîzên cixareyên westiyayî di xalîdankên xweliyê de wê neguhertin.**

**Bi evîna me ya kûr,me destnîşankirinên dema demsalan guhêrand , zivistan bû kolkek bi berfê pêçayî ,me li dor agirdana qirşan de dicivîne, di dema ku havîn dibû danekî tije ji şevnişîniya nediyar, ji kûrahiyên me  du stêrk çinî dike, deryayeke niqombûye , bi pêlên xwe dudil bûye,dêmên perwînan ji hinavê xwe derdixînin.**

**me zaboqên bê, mîna du firişteyan derbas kirin e,û payîz tê ku li pêş me derbas bibe, bi me diponije,reftarên evîna me li xwe dike,mest dibe,ta bibe gewahbînekî li ser peymana evînê yê me pê hebûnê brûsk kiribû,ta em bibin berve rojbendên demsalan , demsala viyaneke nemir.**

**Li deryayên hevgariyê , ez eniya xwe ya xwînçûyî bêdeng pêş te radikim,bi tiştê ku hêsir di riwê te de hîştin diramim, bi tabloyên êşa dirêj diponijim,tiliyên destê te digrim, termên dilê xwe bi rêya sekinandina xwe ya dawî li pêş te hembêz dikim, sirûştê dîqet dikim,hilmên te bi kulîlkan tevderbas dibin, bîna şengebiya şil bi baranê çêja bêhndana te ye westiyayî ye, heta ez ew solav dibînim, ku çavên te ji xwe re kir e navgehekî,û li pêş deryayê de ez te dibînim,te xwe bi pêlên wê mîna şûnekê pêçandiye, deryaya şîn bûye ji te re nivînekî , beybûn û gelî bûn e tiştekî ji min û te , çavên te, ji derveyî hemî talîzokan awir bi min vedidin, rehniyên girnijîna te li her cihên ronahî û tariyê,dûr û nêzik, bi dû min dikevin,min ji binî xemê û nalînê ta xelekeke din ji xelekên azadî û ramanbûnê derdixînin,hemî keserên stêrkan ji bona te dicivînim, dabeşên xêzên şîn yê kirasê te,di asoya tariyî de nîgar kiribû difirînim, di dema ku ez bi cudabûyîna ezmên diramim ,bi meraqa stranê hest dibim,çendîn ji weşîna baranê niha hez dikim,birîna min şerpîn e ,mîna weşîna wî xweş e, li zengilên rêwîbûn û dîdariyê didim,henas û hêsir û hizran bi qasî dikarim amade dikim,bi tenê xwe dimeşim, helwestên watebûnê dibîrtînim,her ku baran dibare ez ahînên asoyê û laleyên xwe yên nexweş bi hev didim, li dor girnijîna te de di kata seyrangeha aram de belav dibim,bi kûrahiya felekê,biskên te yên şahberûyî,pênosên lêvên te û cizdanê te ez diramim,eynikê te yî biçûk di goşeyekî de ji vê**

**pencereya ya ku şewqa xwe ji dûr ve dide pencereya min xwe bi cih dike.**

**Pêdiviya me bi ewlehî û aramiyê bê sînor e,li ser min êrîşê deriyên sîberê bike,di min de derîkên tariya hov bigre,min ji xemgîniyên min in hînbûyî rût bike,bîranînê û deriyên wê yên deherok,di min de êrîş bike.**

**Rojan di min de birêsîne,ez naxwazim di navbera min û te de tiştek jî bibe kelem,di min de êrîşî balefirgehên rêwîbûnê bike,çenteyan binpê bike,wan dûr bavêje,min dûr ji benderên gemiyan û cihên cengê veşêre,ez hez dikim bi destdaneke evîn, desthejandinekê û maçekê ji lêvan ,deryayê bidestbixim.**

**Ji zengelorê min e westiyayî çi maye ji deng bibe,û ji dilê min rehjenê raje,wê tu bimînî eynika baranê yê roçûna rokê li ser asoya virmor de berevajî dike,ji min re di nav ezmên de hinek ewr û peyv in,û ji min re li ser rêyan de,karwanên xemgîniyên ên nayên hijmartin,sozên hevdîtina evîna me yên di bin pelên payizê zer de me dabûn hevdû,nediyar bûn e,evîna me cihê biryardana balindeyên koçber e,ku bendên xwe bişkînin, û ji penaberiyên xwe,li hêlînên xwe vegerin,evîna me berdevka vîna bilbilan e ku azadiya xwe di hundirê rekehên xwe de çêbikin,ne tu yî yê mîna rokê diçî ava,û ji kenara şevê wek heyvê diçî,û ne tu yî,yê ji hilmê mîna gangilokê valayî, lê di zinadên te de têr dike ku buhar nemir bibe, serma û germahiyê bi hevdû re hembêz bike.**

**Ey çûk,vê carê bi vegerê li min biramin,ezê bi rêya name û tîpên xwe, pirsgirêka mişextiyê li bajarên qircirê de**

**bibêjim,ezê ji nû ve avahiya evînê ya ku felekek du felekekê wêran dibe durbare ava bikim, ji van peyvan re li ser koçberiya xwe gazindan bêjim, û tenê ezê rondikên xwe biçirînim , û xwe bi şorbûna wê bişom, û henasa xwe li pêş te bikim, ta ku tu bi êşê mest bibî ,piştî hemî evîn , ji bilî êşê çare nîne.**

**Dilê min rehjenê xwe di nav van deveran de vedişêre,bang li stêrk û balindeyên penaberbûyî di nav ewran de dike,û bê rêberîkirin ez diçim,cem wan perwînên sipî,bi buxçeyan re dipeyivim, xwe ji şaxên yasmînê re ditewînim, çawa te ji fermiskan re,di kêliyekê de demsalek baran çêkir?!!,û te di nav helbestên min de,gomek av çêkir, bîçimên te pasvaniya min dikin,ezê çawa bê te xewin bikim, ezê çawa te ji nû ve dubare,di bîrê xwe de nîgar bikim, bê ku tu nêzik min bibî,bê ku şopên te di dema rêveçûnê de, hogirê min bin.**

**Ji min re ye,dilê te yê gêj her tim,barneke mîna tîpên min in yên ji qeraxên bîranînê derçûn,ji ber tu ne bi tenê ,ya xemê şevê û çûyîna dawiya rojê di bîra xwe tînî,êdî ez ji hêsirên te ditirsim, dema li ser riwê te dimeşin.**

**Li te di nav ketina baranê,li sernameyên payîzê û robarên wê yên reş digerim,li pey bihna te dikevim,di dema ku ez li ser rêyên celb û cenaqê de dimeşim,dema ez gulbeybûnkên şil bi xunav û baranê hembêz dikim,çawa tîrêjên xwe yên binefşî dirêj dikin,ta ji Feratê bikin çemeke bi seyr.**

**Ez êdî bêhtir bawer dibim ku çavên te ew welatê ku têde evîn di nav de penageyekî tenê,ji xwe re dibîne,welatekî têde sîxor û nûçedar me nikarin çevnêrî bikin.**

**Ez bîriya dîtina te dikim, fîncana qehweya min dizane çendîn ez bêriya hembêzkirina te dikim û zîzbû, metirsiyên min li ser şelwera min  de nîgar kir û rijiya,ji bona me zivistan baranê li ser buxçeyên ku hevdîtinên me oxir ji wan nexwastibûn bariya, pistepistên me wan zêde kesktir û rengtir kiribûn.**

**Em ligel baranê ne,bi hevdû re di katê şevbûriyê de,mîna dînên êvarê maç ji hevdû werdigrin,bi te re bêdengî û ramanbûnê parve dikim,min te demsalek evîn bi xunavê şilbûyî,daristanek gul û tirî dîtibû,li ser lêvên te de,ez keskesorê bi maçeke xemgîn xêz dikim,dedrên evîndaran li deverên genî de wedigerînim,bêdengiya te ya dirêj û bihinxweş û nediyar di tariya şevê de min gur dikin,lerzên te di nav deriyên girtî de di min de derbas dibin,kî ji bilî te dikare volkanên giyanê biteqîne,ez heta mirinê bêriya te dikim,ta dengê te bibhîsim,cîhana tarî û nediyar dihejîne,min qet ji hewildanên xwe ku dêmê te li ser dîwarên malê de nîgar bikim bêzar nebûm e,de xemgîniya min li goşeyên odeya xwe de bixwîne, xwe radestî qêrîna evînê di laşên me yên agirî bike, min wek awazeke kehr bispêre rehjenên xwe,dilê min xwezî kir,di mirinekê de,ku bibe perwînekê li ser keziyên te de, derzîkeke şîn,di kirasê te yê ezmanî û taq de tîtikekê, xwe li dor noqê te bipêçe,di hizrê min de tu mîna sirûdekî dirêjî,di golê de mîna masîkekî biçûk pêl dibe.**

**Çema qereçî bi nermî di nav memikên te de û sîngê min de diçe,mîna eyazekê xwe di nav gûşiyan de vedişêre,di nav dar û zincîrên zêrîn de,yên ronahiyê me bi wan dorpêç dike, ewrên sîngê te,di şîşeya hilmê a te di cejina evînê de diyarî min kiribû rikeberiyê dike,wek awazekî kurdî di**

**navbera Dicle û Feratê de derbas dibe,mîna keskesrorekê di nav Efrîn û Kobanî de,wek pêtek agirê evîndar di nav Qamişlo û Amedê de gur dibe, wek stêrkekî sor di ezmaneke moranî de bi cih dibe.**

**Tu rojbûnekî ji elfebaya azadiyê re,di cîhanên xeyd û koletiyê .**

**Tu dawiya peyvanî,dawiya rehjenanî,dawiya girnijînekê yî,ku bi rêya wê ez jiyana valahiyê oxir dikim.**

**Xoştiviya min,dilê min lêvên te yên tenik hembêz dike,dema tu fîncanek qehweya bê şekir vedixwî,bi şîrînî û hingivî mest dibe,di dema ku  hilma te,di demên ronîbûyî de avjeniyê dike,zinar şoreşê li ser sarbûnê û kaş û kûşan de,di nav çiyayên zîv û dûr de radikin,ewrên yên di nav stêrkên xemsar de gelek bi hevdîtinê me geş dibin,xwe radestî dilê min bike,xwe radestî nalîna destên min bike,dema porê te tevdidin,ji nazikiya zendên min,dema te ji qerezê sermayê dipêçin,bayê yê ku te dikşîne, ez çarhêl digrim,ew zengza min e tenê ye, ma ez sax im bê te ?!!**

**Bajarê min bêzar e,westiyayî ye û mest e, pistepista xwînçûyîna min e berve jêrî azariyê min dixirxirîne, ez bi tenê taca pepûkiyê hildigrim, nanê bêbariya xwe dirajim, xwe li ber xêla evînê û darbesta xemxwariya bendewar de ditewînim,tevlî hev xwe ditewînim.**

**Di nav rêyên xwatirxwastinê mîna reşatiya mirinê dimeşim,wek firişteyekî şiyar di nav bapêşka giran de berz dibim,bi şopê tunebûnê didim,dû şopê tiştê wek bêçarebûnê**

**di asîmaneke kevinar û rewrewk de dikevim têde rehnî li zengelora min e windayî de di nav tariyê de digere.**

**Tu zîzî mîna rondikanî,dema tu henaseyên min bi aramî ji çavên min dihêvojî.**

**Ez û xemgînî du cêwiyên evîndar in,bi barên xwe re li derbasgehên şahiyê dimeşin,ta em ji nû ve girnijîn bibin,em du pirtûk in,li ser sehneya şanoyê ne,felekan gur dikin, ewr ji pencereyên me derbas dibin,ta herin ezmên û wî bixemilînin,çûkên razayî çîroka me berî ku razin dibêjin,dîdariyên me dibe ku pêkwerin,mîna çi kêliyeke çavrê,wek ketina baranê di dawiya nîsanê.**

**Li ku dengê te nediyar dibe,li bin amana stêrkan de?!,an mîna gûşiya tirî xwe berdide jêr,reşiya şevê bi gewrbûna sîngê xwe jê bibe,li ser te dinivîsim,gotinên ku ji hemî tawanbariyên xwe derdikevin,gotinên ku naxwazin rûniştina bêdengiyê li ser kabên xwe ,li ser çareyên şikestî dinivîsim,ji amanên kunkirên nehîbûyî yên ji çavên heyvê tên xwarê,bila mêyatiya buxçeyan û keçkaniya gulistanan dilya bibin,ji ber ku em du gul in li ser girê Meştenûrê.**

**Rehnî çîrokên evînê di nav çavên te yên evîndar de didize,ez hîn xewin dikim ku timî gupkirinên memikên te û dagirtbûnên wan,herikînên tengal û germahiya lêvên te hembêz bikim,di kêliya maçeke sekinî,xemgîniya agirdijwariyê dibêje,berz dibim ji te re ji rastê çema ku ji nav memikên te dertê,ta ku di malzaroka te de piştî herikîneke hêdî bicive,û bi dawî mîna solavekî hêsan di nav rehnên te de tê xwarê,ez ji paş çema pîroz dikevim**

**hundir,di cem perestgehekê kêlek ew solava hêsan,bi gêjbûnekî hest dibim.**

**Ez hewil didim li ser rêya evînê de biçim,bê ku destê te ji bê re bihêlim,ta ku sar nebe û nelerize,em bi hevdû re dilerizin,bi evînê dihelin,nameyên baranê yên ji çox û bêhndanên me derbas dibin çinî dikim,yara min wê peyv bi te bijîn,wek destpêkekê ji cîhanek e vala ji êşa mirovî û zordariya diyareyan,ji cîhaneke rengîn bi rengên hestiyariyê û rûnermiya evînê û çelengiya giriyê.**

**Çima di bajarê me de xewin dibin qeşa?!**
**Efsanên bapîran,me wêran dikin,me dikin mirovên mûmyabûyî,em çarlepiya gewreyên sert li ser dikeyên zor û derdan de vedigerînin,ez bi keviran re dipeyivim, banga stêrkên serhildayî dikim,ta bi min re xwepêşandana evînê parve bike,wax ji vê siberojê,xemxwarî û perjengan dikşîne,hez dikim te têde ey geştyara ku reweştên xwe xelatî çivîk û çûkan dike bilind bikim,ji dilberî re xwe çok bikim,ez rastî dengê te têm, maneyên bêdengiyê dihejîne.**

**Di dengê min de bonga ronahiyê vedişêre,ez ji wê zîndanê hez dikim,çendîn di wê de hêsirên min e agirî û qêrînên pênosên yên namirin hene,û ji peyvên bihêrsbûyî ropel jî hene,min di sîngê te de jîndarekî navê wî azadiye livand,lûlepereke hema maye ku bicivile,min wî wek davekekî niqombûyî bi xemgîniyê rakir,ew jî xemgîniya min e.**

**Wek akinciyekî li warên rikeberiyê de,ala evîna sor ji xwîna xwe radikim,ez lêvên te maç dikim,heta bêhindana ya têde mirovahî mirina xwe ya dawî radighîne,û di dema tu**

**disojî,ji agirê min nifşekî bi şewat,dijwartirîn gurbûn jê zayin dibe,em herdû mîna kaniyên kelandinê ne ji hevdû derdikevin,ji balabûna hêsir û maçên me,yên lêvên me wan çêkirin û naxwazin qet ji herdûka dûr bikevin,wek ku narvîna wan be ku bergiriyê li hevdû bikin herdem,min te bi dijwarî hembêz kiribû , min xwezî kir ku rehjena min ji qutanê raweste, ji ber ku min lutkeya xweşiya têkûz di jiyanê de hizr kir, bi rêya kêliyeke yekîtî wek wê nîne di jiyana mirovahiyê.**

**Tu ew zelaliya yên nivîsên min dike dehl û daristan,bi hervdû re, emê azadiya xwe bidestxînin,û di tariya zîndana me ya takesî de,emê kulekekî biçûk vekin,ta ku di nav de hêvî derbas bibe.**

**Di dêmê te de ez rakêşeriya felekê dibînim,ji nav dûriyên fereh de,ez bi kûrahî bang dikim te,di agirê argûnê de,ez gurvedan dibim,dema ez li kêlekê wê derûdinim,dibim êzing,li cîhanekê digerim,min bighîne gewdeya erdê,li pelên darekî an kaniyek av biçûk an bibim çûkekî ji sertan re stranê bibêje,ta ku karibin zaroktiya xwe di şikefta cîhaneke din de vegerînin,ez timî zaroktiya xwe di çavên te de û çêja şekirê yên di lêvên te de vedigerînim,gengaziya xewinê di dilopên avê yê ji dêm û porê te derdikeve distînim,hêsirên xwe li ser akinciya neçar de,di çavên te de neçar dikim,bi wan herdem dişewitim,evînê ji zîndanê wê ya nemir berdidim,dil toq dike û digrî,heta ku bîrên çavan,ji avên xemgîniyê zuha bibin, hilmên şevbuhêrkên sar,di biskên porê te yê şahberûyî de biherikin û hîn bang li te dikim,di aliyê ku ez bi rêya wê diçim cem te, dudil dibim,wek reweşta her kesê hez dike,û nalîna tiyekî wî**

**berve mişextiyê li ser cade û qadên hevdîtinên jê koçbûyî bi rêve dibê.**

**Ez dîlê van kêliyan im,dîlê van şevbuhêrkên xemgîn im,dîlgirtiyê dengê bedew yê naxwaze ji sîngê min derkeve,zaroktiya evînê di nav kaxizên min de xewindîtin dike, û perdeyên evînê tên girtin,ta awazekê ji awazên peyvên min in şewqdayî di vê felekê de gîmîn bibe.**

**Min dihêle ku ez bi te niqom bibim,evîndarê xewinê te bim,evîndarê berfa li kêlek pencereya te bim,ta sirûda min di ferehiya asîmanê de nemir bimîne.**

**Tu raperîna min di dilê pela zuha  de yî, ji ser bilindî daran ve hatiye xwarê û kurtejiyanekê ji çûkan re li ser awaza min de di çaxekî payîzî de pêşkêşî ewran dikî.**

**Agirên laşê te di hembêzê min de vêdikevin,hest dikim ku tu bi min ve qemitî yî,te xwe bi ser sîngê min de berdaye,kelandin di bîçimên pênosa min de gij dibûn,li benda werîbûna yasmînê li ser memikên te dimînim,mîna weşîna tîp û pel ji zîndanên girêdanê bi şaxan,di xemên te de keserên min bibûn pel,min ji hebûna te wateyekî afirand,ku tu timî bi avên şîn di cîhana celb û cenaqên reş de biramî .**

**Ez xwe di te de digerim,di çavên te de,li xwe digerim,di wan de li welatekî digerim, hemî neqşe rewrewk in,û erdnigarî bi tirs û nîgaş in, em demsalên hevgariyê ne,di jiyanê de bi rêk û pêk dûbare dibin.**

# Deqên gelek kurt

**-1-**

**Çû , ta êşên xwe amar bike,û li beranberî roçûnê de rûnê,belkî dilê xwe ji bîra tariyê re veke,ji bêdengiyê re ferhengekî ji wateyên yên nayên şîrovekirin nivîsand,lê dema ji rastiya sozên bêhêviyê piştrast bû,ya ku zivistanê li ber payîzê de berdabû, peyalên bîrêkirinê bi axîna bi qircir dagirt.**

**- 2 -**

**Bedewtirîn tiştê ku di wî de,ku ew êwareyî bû ji bênirxiyên kesên yên li dora wî ji mirovan,ji ber vê jî bi rêjneyên sixêfên ne diyar ji zimanên nenasan hest kir,bîçimên wan çûn hêdîka di wî de,di xwe de milmilîn dibû,katên revînê li hênijîna wî zehmet bûn,berî ku raman bibe ku derbasî hembêza xewinê be,ji şevê re li ser hevgariya nivînê nivîsî,sîberên wî li xwe kiribû,û digot:**

**- Êdî xuleka xewinê ne belaş e, pêdiviya wê buhaye,bê şîk tê dehfîkirin di benka xemxwariyê.**

**-3 -**

**Dem barê xwe li ber deriyê wî karkerê westiyayî de vala kiribû,ew li ber deriyên kendalan de radiwestiya,û zehmetiya bayên bîrêkirinê dikşand,bê ku firingekî ji hêviyê bi dest xwe xîne,beranberî bendewariya xwe li ser cudabûyê bîranînê,ewa bi dirêjî roja biqircir dimeşiya, ta rastî nan û xweşecaniyê were,û ta ku ji hestê xwe bi**

**mizgîniyeke ezmanî xelas bibe dakeve li ser wî ,her ku berê xwe bi aliyê ezmên dida, bi yek peyvî,dengê xwe yî bawîşkî bêhêvî berda û qêriyê : Azadî!**

**- 4-**

**Mîna stêrkekê di ezmana wî ya zerhimî de hilat,tîrêja heyvê ji şevbuhêrkên leylanê,wî berve nalînê biribû,bi nivîsandinê li ser henaseya xwe de destpê kir,li ser rûbara cobarekî biçûk de , dudiliya xwe rabû ta bigihe dûrtirîn arezûyê, li pîzota veşartî di giyanê wê de vekoland, bi lez bi bizdanê ji dilê xwe girtibû, ta metirsiya şikestinê bi ser wî nekeve, nigaş kir ku yara wî hespekî raper e, berdewam şehinî dike, kestekên tozê ji bîra wî kirkişîn, bi awirê xwe dûr berve asoyê ponijî, bû ewrekî şîn ji ewrên din dûrket, wisa bi lêgerîna xwe ji siha wê ya çekirî li holên xemgîniya wî de destpê kir, li ber dergehên payîzê lorand, hêsirê xwe ji ewrekî derbasbûyî dagirt.**

**- 5 -**

**Wek evîndarekî bi nivîsê destpê kir, ramanek wî arand, hevokekî xwe jê sar kir, rêzekî wî hembêz kir, peyvekî pê re agirbest kir, wisa xwe bin dilovaniya peyvan hîştibû, ji ber ew bi dirêjiya temenê, di nav simên wateyan de jiya bû, li rêyekî ku tenahiya wî bi cih bike digeriya.**

**- 6 -**

**Ew çemê bapîr yê xwe li paş gelî dirêj kiribû, hata bîra wî ku li cem wî çemekî sêwî hebû parsê kendalekî kiribû, li ber çiyakî , ji dilşikestinên xwe girî , pişt re hêsirên xwe yên**

**zêrîn malişt, belkî bextewer bibe, bi xanenşînbûnekê bi bîranîna wî ji çemekî re pê re meya sirûştê vexwaribû ,li ber çavên devên şivanan , yên fîxan dan , bi rêya bilûrekî mest, ji tengiya devê wê de bahilkêşanên tengezar û mişextan tên e dîtin.**

**- 7 -**

**Jê re go :**
**tenê biçûk û wekên mêran înan dikin ku derya pêdiviya xwe bi dilopek av heye.**

**Bersiv neda , rêya xwe bi serî kir û keniya , li paş wî ew rawestiya bêdeng, mîna peykerekî!**

**- 8 -**

**Hewl da derbas bibe, derya pirsî di nav kûrahiyên xwe de, ji tiştê ku di hundirê wî mêrî de digere, pê diponijî bi bîrêkirin û xemgînî, piştî wan hewldanan, derya xwe dîtibû tevderbasbûye bi ramanên wî , geşta xwe ya kûr di hurgiliyên jiyana wî de destpê kiribû.**

**Pêl xwe di henaseyê wî de şerê hev kirin, bi vê yekê hest kir û rabû, bi meşê destpê kir , nêzik sotina deryayê bû, bêhtir û bêhtir.**

**Derya xwezî kir ku wî heta mirinê hembêz bike, lê ji nişkê ve wî dît dilekî mirî, ti car ne hatibû zayîn û jiyan ne kir, derya nerîna xwe guhert, biryar dabû ku dev jê berde,heta derya nevêtibû wî bifetisîne, ew fetisîbû berî zayin bibe, wê çawa bi fetisandina wî birame, di wî mêrî de tiştekî bi sûd**

**nema, xemgîniya wî deryayeke kûrtir e ji wê, ji ber vî jî derya hest kir, ku ew ji deryaya xemgîniya wî gelekî bi çûktir e , biryar dabû ku heta bê dawiyê bigrî.**

**-9 -**

**Ba sermaya xwe di pişikên wî de jibîr kiribû, seyrana xwe di nav awazên bihndanên wê de berdewam kiribû, yê çûn awaz û axdariyên tevlîhevbûyî di bêdengî û nalînê de berdan, rêya xwe berdewam kiribû bê ku rastî ti cihî were, bi ramanê destpê kir, diramiya bi dirêjî gavên wî û rêyên yê ku bi ser de dimeşiya, kûrahiyên wî bang kirin,rehjenên wî zêde dibûn, û seyrana xwe ya pepûk berdewam dikirû wisa gîha cudabûyekî ase, sînga xwe ya sar li taldê dîwarekî rûxandî danîbû, û bi davekên kuxikên xwe, strana ev rêyên seqemgirtî û ev êvara kor û dirêj destpê kiribû .**

**- 10 -**

**Agir li ser pîzotê dîlanê digerîne, û li dirêjî ahînê li ser cama şikestî de , bîçimên jineke jinbî diniqişîne.**

**Pîzot di wê de jiya , ji ber ku  ji mêrê xwe ya mirî hez dikir, bi dagirtina axa fereh.**

**Şahiyên wê nepenî bûn, û destpê kiribû bi kedîkirina xemgînî û felaketên xwe, hêsirên xwe mişek dikir û ji bona rûmetê bergirî dikir.**

**- 11 -**

**Bi dirêjî dûrgeştê , mêrik bi stranê destpê kir,û carne dilorand, strana xwe bi nalandinê tevderbas kir, bû heyranekî bedew, rêyên çipil dît, di hizrê wî de bêhtir avraz dibû, hez kir ku xwe radestî êş û sîbera xwe bike, ji nişkê ve ji dûr ve mêrekî gavê xwe giran û hêdî dike, li beranberî wî de dimeşiya, leylanên bedew hatin e wî , dît di bîçimên mêrê kal de, yê hêdîka tê ,bîçimên bavê xwe, bi bîrêkirin girnijî, lê belê bi lez lêvê wî şihetî û girnija wî xwe da alîkî , dema berket ku sêwirên wî derbas bûn e û ev mêra , ne bavê xwe ye, bavê wî tewr venagere carekî din û biçîmên wî ne wek kesên din in , sêwir jî nikarî careke din berz bike li ber .**

**- 12 -**

**Keça evîndar rojekê li ser cadeya birînên xwe meşiya, biryar dabû ku bi kesekî ku kiyana wê dagir kiribû rast were, di felekekê de evîn têde hemî tişt bû jê re, lê belê kevil û jankekî din dîtibû, ji ber ku yara wê tenê nînebûnek bû di çepê evînê de, nema ew buhara ye, mijol bû û meqatebû ku wê paşguh bike, dema jê nêzik hat ji wî re got :**

**- çi bi te re çêbû ye , çi bi giyanê te hatiye ?**
**- dûr biçe , çima tu hatî ?**
**- ez nehatim , ji ber tu mirî ji dema te ez hîştim!**
**- û niha … çi tê xwestin**
**- ne tiştek.**

**keçik biryar dabû ji wê çaxê ve, ku bibe rewşanî ,û efsana evînê jê bibe û fêr bibe ku tenaziya xwe bi dilsoziyê bike, û bi rastî jiyana xwe jiya û niha jî raber e bi hilbijartina**

**bedewtirîn gotin, ta bidê xortekî nemûnî paqij, weke wê bû demekê , wî hingaft bike û di wî de rewanê mirovan bikuje , bû har ji dema ku tevlî cîhaneke din bû, ew cîhana ku berê , şerê wê kiribû, lê niha ew dîmeneke jê !**

**- 13 -**

**Ew asayîşê yê di beşê Trafîkê de kar dikir, matmayî dibû ,ji wan serpêçîkirên dûbarebûyî , di xwe de diramiya , çima min kirin berpirs li ser van serpêçîkir û şaştiyan, pasên kesk li pêş û paş wî de derbas dibûn,pîpika wî ya bedew bi dest wî de ye, jê matmayî dibû, her ku tîpekî ji devê wî derdiket , an dema di riwê ajokarê Teksî û pasan de di qêriya, ji wan re serpêçiyan hildigre, û nizane wê heta kengî bibe ji wan cadeyan re, parastvanekî , êdî rê ji gav û şopên mîtora wî fedî dikirin.**

**- 14 -**

**Li pêş hemî westabûnan de, ew mêrê hatiye çavdêrkirin , û dezgehên ewlehî hemî bi şopa wî diketin, destkarî kir bi aramî û hişyarî , ji ber ku nizane wê kengî bê girtin,û dibe ku aniha were girtin, xwe di hembêza hevjîna xwe de veşartibû, xwe tevlî sîngê wê kir, hewl dabû ku di hembêza wê de dewleta aramî û demûkrasiyê bibîne, an odeyekî biçûk têde bibîne ji bilî ew zîndana takesî, xwe têde bispêre heta dawiyê, lê bi lez hevjîna wî nexweş ket, û pişt re rewşa wê têkçû û mir, û di nav çûn û hatina xwe de ji xestexanê re û pişt re goristanê , ta serdana gora hevjîna xwe bike, hest kir ku bolkeyekî ewlehî nêzî goristanê dibe, çare nema ji bilî ku xwe li paş gora hevjîna xwe de veşêre , binê**

**mermerê ya nav û dîroka mirina wê bi ser de hatibû niqişandin, kevirê bi zor û tirs hembêz kir heta radestî rûdana xwe ya dawî bû .**

**- 15 -**

**Jiyan bûye lîstokekî pêş çavên kurê lal, biryar da ku lîska çavgirtînê ligel birayê xwe yê kor bilîze, kurê lal çavên xwe girt, û ya kor çû xwe li cihekî de veşêre , ta nikaribe birayî lal wî bibîne, xwe bin nivînê veşart, û wisa kurê lal çû li cihê ku ew xwe têde veşartibû bigere, rabû qêrî bi serkeftina xwe , lê ya kor guman kir ku birayê wî hîn bi ser ve nebirî, û herdû kur man e li ser vê lîstokê , heta por sipî kirin .**

**- 16 -**

**Evîndarekî, mêrekî serxweş di şeveke bê heyv de kuşt , û bi tewana xwe mikûr hat dema hatibû girtin û got :**
**Ew tîpa pêşî ji navê xwe û yarê xwe li ser dîwarekî kevin de danî bû, û ewê serxweş çû bi ser wî dîwarî de mîztibû, ev bû sedemekî ji kuştinê wî , lê ji ber xwe axivî piştî lêpirsînê bi hevokekê her dûbare dikir bi dînbûn :**
**( yara min ji gemarê paktir e, û mîz ji min û wê paktir e!!)**

**- 17 -**

**Xewin xwe di wî de bi cih kirin, wî li ser raperînê dihêvotin, hest dikir bi rakişînê berve zayenda rûxweş, her ku ramanekî kete hizrê wî ji bo biqêre , xwe dîtibû di lutkeya xweşiyê de, bi zikmakiya zimanê xwe hest kiribû, ramanekî dîn wî vexwendî kir li ser hilkişînê, çax dû çax, bi lêkolîna**

**xwe destpê kir, ji nepeniyekî guman kir wê wî berve dînbûnê birêve bibe, wekî ku hin kes guman dikin , got:**

**helbet evîn dimîne metirsiya min e tekûz , ji ber vê yekê min hez kir ku tevlî refên stêrkên ronavêj bibim û têkiliya xwe bi wan mirovên mûmyabûyî qut bikim .**

**- 18 -**

**Tiştê ji henasan kûrtir e , rastiya wê ne, tevî ku felek ne yeksan e bi lîsteyên xwe di xelatkirina xweşmirovan û sizakirina xwedan çapkerên nexweş, mêrik ji dema ku zarok bû, her bi kûrahî dipirsiya, gumanî wî bi rêve dibir û şaş nebû di rêya ku wî digihîne dil , bi vereşiyekî ramanî hest kir, hîn negîha ti çareyê, deriyekî din li ser xwe de vedikir, jiyana wî li gumaniyek ta gumaniyekî nû destpê kir û wisa.**

**- 19 -**

**Qeşmer ji xwe pirsî , çima ewqas pêkenok e heta vê astê? , xwe di serşokê de rût kir, lê xwe ne şuşt, diramiya gewdeya wî hîn saxlem e mîna gewdeyên din , û ti endamên xwe winda ne kirin e, û ne jî reşepêş e an awareye, û kete pirsekî din, bi ken hest kir û kenî, bi dawî , bi rehetiyê hest kir, kenê wî bersivekî misoger bû ji pirsên wî re , wê demê dît ku kenê wî nepeniya jiyanê ye û nihêna wê ya di nav xemxwarî û nebediyê de ye.**

**-20 -**

**Pêlava nû ji birayê xwe yê kevin re got :**
**ez ji te bedewtir im , çarenûsa te di gemarê de ye, pêlavê kevin xwe radestî giriyê kir, û nikarîbû bêrûmetiya birayê xwe jê re vegerîne, roj û sal derbas bûn, pêlava nû xwe dîtibû qepalekî repal , û pêlava kevin tenaziya xwe pê kir û got :**
**tu ji min kirêtirî, çarenûsa te di gemarê de ye, bin lingê min e .**

**- 21-**

**Tirimpêlê bir piştî ji bavê xwe yê razayî desturê wergirt, keta xewekî kûr ,dema tirimpêlê ajot, di ajotina xwe de, û ew razayî , pêle gemarkarekî kir, firûşkarê şîremeniyê li gel girgirkê xwe, pisîkeke sipî qels , û pîrekeke mezin û xwe li darekî mezin xist, tirimpêla wî sekinî û ew ji xewa xwe şiyar nebû.**

**- 22 -**

**Dema çû Elmanya yê yekem car , salên mirin û azariya xwe darizandî jiyan kiribû, nikarîbû vegere welatê xwe ji ber ew darizandî bû, ji ber ku bi qêrînekê hest kir nikarîbû di hundirê xwe de wek her carê hilîne, wî nehiştin kar bike, û her ku wî dîtin bê nasname kar dike, carekî din wî ji kar qedexe kirin û pereyê wî ji dest wî giritin û bi dawî çû li ber deryayê rûnişt ,diramiya bi hêsir, girî û qêrînên xwe yê ku derya bi devekî zordar daqurtandibû.**

**- 23 -**

**Marên biçûk û mezin ji kûrahiyên kesan derdikevin û herwiha jî , hêkên yên di nav de marên zarok dijîn, di wan de xuya dibe dêmên rûpakî û rûdaniya zarotiyê,**

**hemî mar derdiketin û ji zimanên mirovan û sinciyên wan, ji dayik dibin.**

**Di her havîn û zivistanê de , qehwexane deriyê xwe vedike, xelk têde dicivin û bi danekî marîtî nû destpê kirin , maran bi diravên buha ji aşkerebûn ,derew û devavêtina xelkê bi pevdiguherin, lê yek marî dernedikete qehwexaneyan, derfeteke wî tenê hebû ku xwe çebike li ser qurbaniyan ji ber vê jî zehmet e li ser mirov di vê felekê de ,ku bigihe vî marî , ji ber ku bûye ji cîhanê re yekem metirsî, her sal ew mar artêşên xwe belav dike, ta ku kiryarên xwe di hişên perîşanan de pêk bîne, rengê ramanên xwe weşan bike, serên xwe bi serbilindî li ezmanên asîmanê rabike ta ku rengê erd, elfebayê û narvînê biguhêre .**

**- 24-**

**Bedewtirîn cureyên xwedawendiyê , ya ku bilindtir dibe li ser pileyên pozbilindiyê bi hişên afrêner, û ne kesekî ji xwedawendan , fermanek jê re heye ku jê re bihêle bi guman û raperînê azad bibe, sizaya vê yekê hatiye naskirin, û pêdivî bi du kesan nîne ku li ser biaxivin.**

**Her xwedayekî dibêje : ez a yekemê nemir im û şêweyên nêzikbûnê ji min vekiriye, mirov pêlek matmayî û lêpirsîn**

**bi wî ketibû, biryar dabû ku gumaniyê bi baweriyê qut bike, û rebeniyê ji xwedayê yekê re bike, wek pirsyarîkirinekî ji bêsînoriya bihndayî re.**

**-25 -**

**Balindeyê rengîn yê nêzik şînbûnê xuya bû matmayî ji dîmena buxçeyên , yên êdî eyazan destên xwe danîn li ser darên wê yên dirêj nîv rût, roj destpê kir bi tifkirinê li ser germahiyekî diltîr û bilind, havîn û dûçika bongê xwe li gel sirûştê berz dikir, û ew balinde hîn hêlînekî ji xwe re nedît, di nav daristanan de, li şaxek dar digeriya,ku bi ser de hêlîna xwe ava bike, xwe bi axê qemitand , di dîmena dîtinekî dudil de jê re tişt, bedewtir li ber çavên wî yên hûr de xuya bûn, li ava tozgirtî meyzand mîna xemxwariya xwe , xwe li ser darên qutbûyî gerand, û rabû jor, heta gîhabû bajarekî mezin, berdewam kir bi gera xwe li cihekî têde hêlîna xwe ava bike, dûrî tevnê pendepîrê, û malên şehetî û bêkesmayî, firîna xwe li ser cihê gemarê rawestand , xwe li ser gemarê sist kir û kûr ji westanbûnê raza, di sibehê de gilêşvan cihê gemarê vala kirin , di galîskeyê xwe de , wisa balinde di nav gemarê de winda bû, û ji wê hîngê ve heta roja îro jibîrbûyî ma .**

**- 26 -**

**Ma helbestvanekî zîrek, jîr û bi awazên rewanbêjiyê hunerkar bû, û hevok bi hêsanî li ser zimanê wî de dimeşîn, dostên wî nav lê kirin mîrkur, ji ber ku afrêner bû bi hevanîna gotinan , yek ji dostên wî yên evîndar jê xwestibû, ku nameyeke evînî jê re deyne, jê re danî, pişt re dostê wî ji keça ku jê hez dike re şand, û bi lez bersiv jê re hat û têde :**

**( bedewtirîn tişt di te de xorto, ku tu derewçîyekî bi nimûneyekî bedewî, çendîn ku derew çeleng be jî, lê wê ne bi qasî cîgeha rastiya hevokekê be , şansekî bêhtir li gel keçên din !! )**

**- 27 -**

**Kelereqî li ser wî siwar dibe, ji serî wî heta binê lingên wî , di rojekê de lêpirsî li ser nepeniya windakirina xwe ji zîrekbûnê re , û çima ase dimîne ku derbas bibe serê wî, biryar da ku serê xwe di balgiyê de deyne, xwe ji sêwirkarî rizgar bike, bi ser ne ket, hewl da ku raze , belkî şiyar nebe piştî wê , bê ku jîrbûn vegere û derbas bibe serî, ji qulekî ku di nav mêjî de, bi zîrekî derbas bibe, lê bi ser ne ket, nikarîbû raze ,di rojekê ji rojan de , xwe dît ku di gulistana giştî de dimeşe, bi daran diramiya, û hinek dep li ser de hatin nivîsandin xwend; gulan çinî neke , û hin din ; pelgan çe neke , gulistanê biparêze, ew ya hemiyan e, û paqijî navnîşana şaristaniyê ye, û tiştê bi vî rengî.**

**Bala xwe dabû keçekê , bi kûrahî pirtûkekî dixwîne, û li eynî demê li çenta xwe lêgerînê dike, li bedewiya wê , rengê cil û çermê wê nihêrî, ji xwe pirsî , li ser tiştê ku keçik bi gulistanê ve girêdide, û depên buxçeyê , bi sêwirekî sivik û xweşik hest kir, li gel ramanekî bi tiştê ku di hundirê wî de diqewime, û bi demê re hest kir ku bandora jîrbûnê hêdîka dikeve reh, henase û ramanê wî.**

**- 28 -**

**- Naxwazim tu biçî, hevalê min , pêdiviya wî bi hevdîtinekî germ bi te re heye!**

**Di wê kêliyê de , kûnde lê nihêrî û got:**
**- lê belê ez dixwazim şeva xwe bi te re bibhurînim.**
**- bi hevalê min re pêşî.**
**- wek tu dixwazî.**
**Kûnde matmayî ma bû , çima ew wisa zarzar kir, û ji xwe pirsî, ma xweşrabêrî dibe ku girêdanekî bala be di nav wan de !!**
**û çawa dibe girêdanek hezkirin wan bi hevdû re dicivîne.**

**- 29 -**

**Meyxan e bi  serxweşan tije bûye , û jina reqasker ,bi pîlebazî û arandin berçêlka sîng ji memikên xwe kir , li gor xwestekên lezgîn ji hinek dewlemendên rûniştî, yek ji serxweşan , şoşeyek wîskê ji destê wî ketibû, rabû xwe xingilî kir li rex reqaskera tazî  , û destpê kir bi werkirina pereyên pelgî yên ji berîkên xwe yên ferh derxistibûn, û bi ser porê wê belav kir, di kêlêkê  ku hêsirên wî evîndarê xizan bariyan, di qurzîkekî de rûniştibû, rondikên wî her dihatin xwar mîna barîna pereyan li ser laşê  reqaskerê.**

## Rojbenda xewinê

**Ey cîhana girover ê ji rengên xwe xeyîdiye, tovên zordariya xwe di riwên westiyayan de biçîne, ta bi hêz hember desthilatiya te şoreşê raghînin , şeynê xwe berde di ferehiya rêyan de, berkenê xwe belav bike li ser aliyan de , cîhan xemgîniye, di nîvê wê de bêdengiyekî xemsar e , aram e, vedengê xwe qut nabe , barana bê qurşîn qul dike, cîhan riyeke biryar dabû ku xwe bi dawî bike, û nîşanên xwe li ser eniyên kesên birçî û ji mirinê têr ne de datîne.**

**Cîhan zivistaneke dirêj e, Tirk e , kolanên Serêkaniyê dide ber xwe ji serî de ta dawiyê , û balindeyê nalînê hatiye serjêkirin ji roja ku pêlavê ahîna xwe li xew kiribû û bi cenazeya kurdan re derketibû, cilê xwe yî tarî qetandibû bi dînbûnekî har , di nav sermayê û berfê bêhiş de digevizî .**

**Cîhan rêyeke tije navber e , ji mîrên cengê re , û vegera welêt , nepeniyekî ne zelal e.**

**Ji evînê şiyar dibim, ji temara giran , bajarên min bi teniyê dixemilî ne, temara miriyan bûye navnîşan li warê me yê virmor de ,dil xwe ji kînê re ditewîne.**
**bi şewata xwe ez şiyar dibim, ji qalibên bûzê , timî diramin ku min bixin peykerekî gêj, êşa min e qelew dilivîne ,ji birçîbûnê û mirinê şiyar dibim ,ji lanetê êşê direvim , ji xuleka evîneke dirêj, li bajarê barkirinê de rêwî dimînim , û elesa sibehê, ewrên xwe yê lawaz li ber çavê heyvê belav dike, ji şîrê ewran dimête, belavbûn e ,bi qurmên darê ve qemitî ne ,bi pelên gulan girêdayî ne, û hebûn tevî ku tê xwarin , zengilê agahiyê lêdide, sirûda vegerê dibêje, berî ku dem bibe dereng , û tiliyên lingên me, bi rêyan re**

**biaxivin , li dilên bawermend digerin , evîn ji xwe re dibînin ol û hebûn ji xwe re dibînin dayik , ta bigihên lutkeyên zanînê .**

**Li ser êşê dinivîsim ,di nav mijangên gurnijîna fereh de , behsa kêşeya evînê dikim, di bajarên qirecirê de, ta ez wateyekî veşartî bikşînim .**

**Behsa hurgiliyên wê di pêveçûnan dikim , û biderbekê ramanbûna min radiweste, hewl didim ku ji wê ramanbûna tirsdar şiyar bibim, sêwir jî metirsiya min e, ramenekî saxlem e, derket meşê , bizdayî rabû ji hizrê min.**

**Peqikên dûdiliyê li ber min belav dikir, wax, ey bangên nalînê , refên keseran li ber min derbas bûn e di nav xemên dergehên asêmayî de , û çûkên roniyê paş min reviyan, xweziyên xwe hiştin çekirî li ser lêvê min , xwe radestî dengên qirgurgan dikirin, tabloyên xwe yên xemgîn li rojbendê xewinekê de şêwe dikirin, li ber yadîgariya min , ez bi şopê şadiyekî ketim , ji derveyî geravên tozê û geşbiniyên wê yên bi guman, li pey rehjenê dilê xwe diketim , li yarekê digeriyam , min westanidibû, dema min wê naskiribû.**

**Dibe ku şaştiyekî qewîmî be, ango aramnc û derecam nepenî rawestiyayî bin, dema ku alî li pêş me dizivirîn , wisa bi me re çêdibe dema nîgaş ji me nêzik tên ta sihên rastiyê veşêrin , bi me re wisa çêdibe, mirin gotinên jiyanê a dawî ji me re dinivîse,em jî dikevin di xirêna dûrçûyînê, em bi katijmêrên tenahiyê diramin , metirsiyên me dimînin bêdeng li ber tirsê giran , û dimînin dûrî rehniyê , mîna sêwiyan , gavên xwe yî sêwî amar dikin, tevî vê jî xewin , ew**

**nûnerê bitenê ji me re ye, deriyê ronahiyê dikute ,ta me ji tunebûnê dûrxîne , me ji jiyanê ta mirinê veguhêzîne, û ji mirinê ta jiyanê , û jiyan naye jinavbirin ta tevger heye.**

## Diltehlî

**Stranên bedew û kirêt li hev dicivin, li gel hev dîlaneke gelerî digerînin, stranê çeleng bi destê stranê kirêt digre, bi rengekî cuda ji hevdû li gel hev dîlanê digerînin, her tişt bin guhê hev ketibû, wek ku dahol li Enteriyê be , û dawet li Cirnikê be , û tiştê ku axê çirav dikir, amadebûna reqesekar û helbestvanan ku bi hevdû re xanîşêdanekî reqsekar bê manend saz bikin, û şandên helbestvan û kerxançiyan diciviyan , ji bo ku komek nakokî daner bikin, û wisa ev lîstok bi dijwariya dijwateyan hatibû lîstin, mirov têde bi hev re dîtin û rewşetên xwe li gel hev parve dikirin, ji hev dûr dikevin û nagihin hev, jin ji rewşê mêrê xwe û serberdayên wî dilgiran e, jê tol digre , ji ber ku ew li ser girêkên wê , sarbûn û helçûnên wê yên mezin berpirs e.**

**Mêr ji hevjîna xwe dilgiran dibe jî, ji ber ku tiştên wî paşguh dike, û xwestekên wî pêknayîne, di jiyana wî ya xwezayî beşdar nabe , dikeve di rewşên derveyê û venagere ta dawiya êvarê, di hembêzên ku xwe radestî xewa giran kirin e .**

**Bê karî pişa xortan dixwe, û li pey wan dikeve wek sixûrekî ewlehî , heta demeke ne diyar.**

## Êşa peyv

**Ew êşa bi tevgerê  xendiqiye, di me de xwe dikuje, bi bayê me dilîze, pêvexwandinên bertengiyê ji çavên me  dibarîne, wisa westabûn dirame, bi lîstikvaniya êşê me ,di rûbarên ramanbûnê .**

**Paş wermîbûna veşartî di bîr de , xewinên me birêve diçin, ji çirayê rehniyê  qendîlên omîdiyê ronî dikin, ta ku erdnigariya aramiyê belav bikin, ji ber ku ew pêvema bêdengiyê vedişêrin û tînin ziman her carê  bi windabûnekê di dema gotinê rastiyê de, pîzot jî gelek bawişk dibe di xulekên bêhnfirehiyê de, daxwazê roniyekê digotin wê nêzik were dike, di awazê de, bavlîsokên veşartî di rûbarên hestên me de hene, me ji meraqên me  vediqetînin, ji nirxên xwebîniyê, û têrbûnê ji bêhinxweşiya tengezariyê.**

**Bayê rojhilatê ji tarîbûna ew soza dûrketî derdikeve, çavên mestbûyî, xwe di qehwexaneya semayê de  xwar dikin, ew gewdeya ku bi mirina xwe  bi kêf e ,  sivikbûna ew xwêdana qirêj hizr dikim, û ew şilbûna dilçûyî binê nêfkê.**

**Tenikbûna qet û qut çênabe ez kom dikim, ta ku  wê di katê hevdîtina azad de berz bikim, ji wê mêyatiya zarok çêja lîmonê ye , di çaxê nûgîhabûnê , û rehetçûna xwînê ye ,di meyîbûna wê , û hevxistina fêkiyê ye di xoşava firêzê .**

**Ji kesê ku  kovana axînê hizr dike di katê çûyîna rokê , ez jê re di vê şevê dinivîsim, ji kesê ku ahîna evînê di kêlîkên dereng de hest dike, ez wî li ser fîncanek poşmaniya sivik vexwendî dikim, ji kesa ku xwe dibîne di cihekî ne guncan**

**de , û demeke ne geşbîn , bila bi tenê di hola bendemanê de di mala xwe de kêlîkekê bireqise, û bila keçkaniya dilê xwe qasî dikare hilîne, ta ku ez cilê ramanekî rizgar ji hizrê wê re bênim.**

**Perwînên ezmên li ser eniyê direqisin , dema xilêlbûnê hatin min, ji berkenê min bertîlekî standin, û ji min pir dipirsîn, li pey bersivên min  di demê dereng de diketin.**

**Çiqas ciwantir e dema ez li pey peyvên xwe dikevim , mîna dizekî zîrek, mîna şivanekî li pey keriyê xwe yî jê dûrketî diketibû, wekî ku ez bangewaziyên zaroktiya xwe hilgrim.**

**Ez bûm e ew ewrên sipî di ezmên de, di nav de kevokên zîv difirin .**

**Weke ku ez di wê kêlîkan de du çav bim, çavdêriyê dikim, û dilekî dîdariya guhdarkirina nûçeyekê dike, gelo ,ew çi nûçe ye?!!**

**Wax! , ez çendîn ji dîtina zincîrên ên bi zengarîbûnê de xendiqî ne matmayî me,  li ser texta xêvê de bi cih dibin.**

**Çendîn ez westiyayî me wekî vê pênosê, bi sipîbûnê hest dibim, di hundirê kesera westiyayî de, rûbarên xewinê derbas dikim.**

**Ez bi xemgîniyê giran bûm e, bi koçkirina berkenê, dûrî benderên dudiliyê, û xemsariya kor, birçîbûna min xwe dirêjî tozê dike, ew birçîbûna  dil ji bihna dilê dûrketî  û koçber paş rewrewkên ên bawerî nema pê tên.**

**Li ber pencereyên bêdengiyê, axaftinê te ya aram dinêrim, sîmfoniya bendemanê awaz dikim, li pey awir û gerdenê te dikevim, xwe sist dike li ser sîngê te , bi germî, ez xwe bi kurahî derbas dikim,êşa deryayekî qerrisî dikşînim, ji gewdeya te hatibû sazkirin,û ji alavê qirecirê hatibû ristkirin.**

**Kuxika min , min difetisîne , û bi herdû destên xwe yên mezin bi zengelorê min digre, xewin dikim, wek ku ez Iblîs bim , bi çemandina Adem bi tevayî, û guhertina mêjiya xwedê, ta ku bihêlim xwe ji texta xwe ya paşguhkirî ji dema Habîl û Qabîl dûr bikeve û li ser vê yekê erê bike.**

**Ez di mêjiyê te de mîna şeytanekî firişte sêvê dixwe têm e çandin, sêva Hewayê, bi her dilçûyînê dixum.**

**Wax! , çendîn ez ji nihrandina şewatên ên xendiqîne bi êşê ,di çavên te de matmayî me.**

**Çendîn ez westiyayî me, mîna ew rehjenê avis, dagirtîme bi keserên azarkêşan , di lutekyên xewinên me yên bêhêvî bi cih bûn e , ez bi xemsariyê û barkirina berkena dûr , berve benderên dudiliyê û xemgîniya kor giran bûm e, ji awazê bendemanê pergalê dengê te yê bendewar e, tu mîna gerdena windayî di kûrahiya deryayeke winda de mîna erdnigariyê yî, evîn li min ket, mîna tayê û tu mîna kaniya mirinê yî, tu weke veguhistineke ji rewşek ta rewşekê .**

**Xewin dibim wekî ku ez mîna avekê bim, bi evîneke tûj û meraqbûnekê ku ez bi êgir re razim, dema lotdanên zivistanê dibûrînê, û mîna pîzotan, xwe bi ser volkanên dilpijîn ve davêje.**

**Ev xemgîniya min bi tenê li bendê dimîne, bi xewinên xwe , rep dibe, û xwe ji kesî re rût nake.**

**Birînên kûr mîna qerenfîlekê vedibin, bi dînbûna xwînçûyî mîna qurşînekê ristçûyî dibin, di merasîmên xwînçûyîna mirovî beşdar dibin  .**

**Ji birîna te re ey ezman, çîrokekî dirêj e , têr nabe ji qestkirina giyanê, dema diçe li dor benderên meraqên jinavçûyî.**

**Ji keserê  jiyanê re pergalê vedengê ye, dema li hawirdorên xemgîniyê  mezin dibe  di  hundir de, dinêre, êşê vedişêre û kurtas nake.**

**Tenê xewinên me yên destpêkê, ne ji sermayê û ne ji germê ditirsin, ew mîna vedengê ne, bi tenê li ser me dinalin, dema em hest dibin , ku her tişt li dora me diçe û namîne.**

**Çendîn ez bi hêrs im , mîna vê giyanê , dema li ser xweziyan gur dibe, di min de ji nû ve şadiya matmaybûnê şiyar dike, û sermaya hewayên wê, dema di êgirê xwînçûyîna min de derbas dibe.**

**Derbasgehên birînên  valabûyî ji mirovên hestyar  me tîvland dikin, tenikbûna bêdengiya dirêj di me de vedixwe, û xweziyên tenazûk, ên diçin berve hola jinavbirinê , dîwarên wê yên wêranbûyî li ser evîna me ya xwe komkirî, mîna dipûşkekî şilîbûyî di qurzîkekê .**

**Çendîn sal li ser eniyê me dinivîsin, bîranîn bi dawî, li pêş evînê de tûbe dikin, û me ji giriyên kevin tazî dikin, em jê re hinek hijmar û nepenî ne, bi nivîsên nav û navnîşanên giyanên me .**

**Nivîs li asîmanê ,ji me re tekes dike ,rastiya nerînên me yên zûyî, û zaroktiya me, ji ber ku ropela mezin a di asîmana bilind de, xemên me yên lehîbûyî pê xweş tê, xem hildikişe li ser me, navên me li ser ropelên xwe de datîne, xwînçûyîna tûj a gurbûyî ,me dorpêç dike, zirava birîndar, bi jêhatîbûn li ser rêza xwînê di çavên ên xendiqî bûn ,bi êşên rojane dinivîse.**

**Êşa kûr min mişext dike, di hundirê min de xwe dikuje,çendîn ez mîna cenceran , xewin dikim ku ez deryayê saman bikim, bi samanê mêya a hîn tu kes nedîtiye diramim, û mabû mîna ramanekê.**

**ji şewitandina min ey derya çêkirineke ji sazîbûneke nû, û xewindar ji nerînên nû li ser siberojê, ji sotandina min de nalîneke bi arandin e, li ber barandina hêsran diqêre.**

# Evîn vîna bedewbûnê ye

**Dema ew keça ji ser piştçavên yarê xwe , şopên hêsiran dadimale, wê çaxê ,ewa li ser xemgîniya her evîndarekî ,li her cihekî ,di vê cîhanê de, derbirîn dike.
Li ser gavîna wan çiyayên zîvînî, tiliyên bê aşkere dibin, li ser tiliyên bîrêkirinê zorê dikin, bangên wan bi yek dike, rê diçûn rû yê deştê, newal bi  çiyan re, hêvî di nav ewr de , dinêre, ji sameya dîmenê ,hêviyeke nû û timî distîne, dema keç ji çavê yarê xwe riswabûna xwe dadimale, bi vî awayî ewa viyana dildaran, di ezmên de radigihîne, û rêya şoreşê ji bo rizgariyê ,ji koletiya diravê û mîrkarî û hayîna sexte xêz dike.**

**Pîroz be ji wê yara wêrek re , ê her derhozeke jiyanperest an dawîperest sernugûn dike.
Seqayan hêsan dike ,  dimeşe, bi tiliyên yarê xwe digre, ewê sond bi mirinê xwaribû, ku wê biparêze, ji şemalê eger hewlda bêbextî bike, û ji avê , eger hewlda bilîze, û ji rokê eger hewlda ku çermê wê şewb bike.**

**Tiştên ku jiyan dizane, bêhtir e ji matmayîbûnê me, pêş pendê evîndaran û dînbûna wanî bisaw, em hîn dibin, çawa jiyana xwe pêş de bidin,ta em xewinên xwe şareze bikin, lê bi lez û bez , ronahî ji holê radibe, dema di me de mirî dibe, û vîna evînê di me de, ji hev dikeve, dema em wêraniyê dibînin , di her cih û her demê de, destê xwe dirêjî bedewbûnê dike.**

# Evînekê

**Ez bawer dikim ku rûniştgeha a em li ser rûniştî bûn, bêriya vegera me dike , piştî evqas dûrketin, em ê ji zivistanê re karwana wî ya winda di qerebalixa aliyan de vegerînin , nerîna te çiye ger ku me dîmenên hembêzkirna xwe ji binî dojehê afirand?!**

**Çavên te ,welatê çokên gurandî ne li ser ewrê reş , ji bilî firtikên birçiyan ji neviyên têran re tiştekî nehîştin, ez û welêt em du şahid in û me tiştekî nedîtî , û ez bûm e hewesdarê mirina we û ez hîn sax im .**

**Min di te de wateyê nimêja ên filîtînbûn ji xendiqanidina gemiyê dîtibû, û ez hîn li cîgehên germbûnê digerim , di wan nameyên yên hûtê deryayê daqurtandibû, di nav lênivîsikên kevin ên ketin e celbê, hîn lêgerîn bi dawî ne bûye, wekî ku narvîna bêhiş xwe ji lepên xêvê derxîne û were min .**

**Başiyên narvînê ez xapanidim e dema ku devê çekê xwe berve te anî , me neqşeyê tîpên navê xwe li ser dîwarê gulistanê de vedigerand, li ser darên me jî , ji bo bibin şahid li ser evîna me, û dilsoz bin ji nepeniyên me re , evîn hemû perwîn û kevir û gul û stran mecburkirin dan, ku xwe ji vîna hebûn û azadiyê re bitewînin.**

**Bangkirin di mîrnîşîna me de sozekî windayî ye, di xwe de, bêhêviya bedewbûnê radike .**

**Veger ji sozê di yaseya evîndaran de , mîna mendalekirina xweda ji pirtokên xwe re, lê hestbûn bi tirsê û dudiliyê mîna roxwandina evînê li ser kevîkê paşdemayîn û bindestiyê .**

**De bidewsîne li ser birînên min ta ez bi êşê hest bibim, ti wate ji evînê re nîne ,eger em bi êşê hest nebin , ez dixwazim peyvên min dûrî aşkerekirinê bin, ta mîna te ne zelal bin, ta ku ez bi zîrekbûnê nîşanê hest bibim, dûrî diyarbûnê û titşê hêsan û xuya , lê ez pê raman dibim ,her ku te bihin dikim, û nêzî lêvê te dibim ji bona maçekê.**

**Ez naxwazim her dem firindeyên koçber li hêlîna xwe vegerin, ta hestê evîn û êşê di nav wan de nemire, dixwazim tim ew bar bikin, ji ber em ji rûniştinê paş perdeyan têr bûn e.**

**Ji êşê re hevpeymanekî nemire, ji me re birîna nemir vedike, tenahî kesekî nû ji min re peyda dike, kesekî ne normal, darên bi qasî metirsiyan diyarî min dikin, û bayên ku bêdengiya şevê di girtîgehê de dihêlin.**
**Çendîn aramiya min xweş e ,dema dikeve di nav sêwirê min de , xemgîniyên min gazî dikin û min vexwendî dikin , ta ez ji qirecirê xwe şiyar bibim, çawa wê dudilî kurtejiyana min binivîse ?!**
**Çawa wê tarîbûn li ser ba û qerebalixên min binivîse, û tiştê ku ez pê hest dibim?**

**Alîgirî ji tarîbûnê re , ew dergûşa nerînên me ye, destê xwe dide li ser azariya me ya zuhabûyî, dikeve nav henaseyên min de, ta ku ji pergalê wê ya virmor de bîranîna jineke xemgîn û bêdeng were zayîn.**

**Ew evîna nepenî  di me de ye, di feleka jibîrkirinê , wê çawa aram bimîne?!**
**Ew evîneke serhişk e , xusletên wê bi ecêb in, me fêrî giriyê dike, tevî ku çav zuha ne, û mîna moriyê reş li ser lênûsêkên me dimeşin, û di nav dîwarên derizî  û germ de mîna dilên me yên westiyayî ji pirsdayînê derdikevin, û li ber rawestgehên dawî digrîn.**
**Ji tiştan re azadiya wan e ku têkevin ziqaqên pirsê , ji hemî leylanan re  meraqê wan e, ku ji nîgaş û hizrên  mirovan rizgar bibin, û ji demsalan re azadiya wan e ku demsalên din bênin li ser riwê cîhanê , û ji vê reşiyê re ew berferhiya vala ye, ku têde xemsarî bi şadî bileyzin ,û têkevin kûrahiyê henaseyan de,û heta hizrê evîndar bize , çiqas pêwîst e  ku were bicihkirin, tevî zordariya demê ?**

**Ku balinde hêlînên xwe bibînin , dûrî cîgehên maran , wê bi ku ve herin?!!, û wê çawa xwe ji bo  êrîşê rokê  amade bikin?!**

**Wê çawa zarok karibin tirsê şer ji xwe  derxînin, û birçîbûn devê xwe ji wan re vedike, û tirsa reş wan dorpêç dike?**
**û bi celb û cenaqên kampeyan girêdayî ne ?!**
**Wê çawa cîhan karibe ku xwe ji şaxê teror û zordariyê dûrbixe?!!!**
**Wê çawa evîn karibe kurtejiyana xwe bi mirovan re binivîse, bê ku pêwîstiya xwe bi pênûsê hebe?!**
**Girî parê xweziyên me ne, meraqbûnê mertirsîbûnê ne, û lêpirsîn ji me mezintir in, ne ji ber ku li bersivan digerin , ji ber ku bersiv carne dibin bihane ji rûniştin û bêkariyê, dema ku bi hêsanî tên e nêçîrkirin.**

# Ey sih

**Peyv lalbûna dil li ser kevirên roçûnê de diniqişîne, kenê te di zikê ewrê avis de derbas dike, ewra ku radibe mêvanxaneya sehwîrê, ta ku bibe mîvanê zivistanê, çirûsîn wê bi ava pakiyê dişo, artêşên tavekê dajo, bi bejina xwe  li ser dîwarê bê û dîrekên wê yên kût de radibe.**

**Ey sih tu paş çi rûdanê radiwestî,çavdêrî hemî diz, hizirvan û derewçiyan di welatê min de dikî, yên dirajin gemarê peyvan û mîna sipiyê di porê de dimeşin, û binkeftiyan cîwî dû çîwî tînin, û bang dikin bi navê te lo sih , ey nezanî!**

## Ezmana şadiyê

**Min lê dinêrî , çavên wî, dîwarên xemxwariya min derbas kirin, ji cara yekem bi min re axivî, di wê demê de , ez nediyar bûm ji têgihijtina xwe,bi bandora awira yekem li ser mirov , miroveke ku bi zelaliyeke bê sînor dan û standinê dike, hinekî diramiya , bi min diponijî , wek ku êdî bihna xwe bi rêya min berdide, ramanên min dixwîne, sebaret min nepenî bûn, çi dixwaze?!**

**Ez bi fedî û zarokbûn ji xwe pirsîm, bi tenê gavên xwe dişopînim , nêzik cadeyê bû , kêlek min, bi girnijînekê silav li min kir, û bi rê ket, gavên xwe yên hêdîka dimeşîn, nîşanek bûn bi nexwastina wî ji çûnê.**

**Evîn hêdî hêdî , di min de diçû, destpêka seyrbûn û hezkirinê ji wî û ji min diyar dibûn, hîn tenahiya min li min goşegîrî tivî kir, deriyê odeya xwe bi aramî li xwe digrim, di çarçovê xelekeke ji ramanbûnan, bi min dizîvirîn, girnijîna wî di nav lêvê min de derbas dibû, geşiya tiliyên wî , destê min bi nermî girtin, di nav tiliyên min de dirazan.**

**Destê xwe danî li ser xewinên min in nepenî , di gavekê ji xewineke di nav sîngê min de wek du dilopên xwêdanê biçûk , di gewdeyê min de bi dizî derbas bûn.**

**- tu hîn ji evînê re biçûkî keça min !**

**Yaw!, mirin!!!, kesek tênagihe min , diya min naxwaze bizanibe, ku ez mezin bûm e, laşê min bi rakêşerî û niviştê dagirtiye, û li ser şaxê sîngê min de ,du sêv çêbûn e,ji min re**

**li ser mêyatiya min e zaroktî diaxivin, ez mezin bûm , êdî ez têdigihim dûrbûnên ku têne min ji hestên ,ku gurzên nermiyê di kuncikên henaseyên min de belav dibin, xewin min ravêz dikin, ji min hestên xemxwariyê distînin, xweşikbûna rakêşeriyê ji min digrin, dûpişkên katê ji fedîbûnê , di hundirê min de bi hevdigerin, li ser awaza wî de ez şiyar dibûm, min ji kûrahiyên xemxwariyê û keseran derdixistibûn, ji bêdengiyê xweşiyekî nepenî dirêsîne, di min de hêdîka derbas dibûn, ji gerdûnê re bi seyrbûnên wê zimanekî nediyar heye, ji odeya xwe derdikevim, piştî ez nivîna xwe sererast dikim, balgî , çerçev , dimeşim, gavê xwe li wê derbasgeha bedew de dişopînim, yê têde ez û wî yekem car , em rastî hevdû hatin.**

**Hevdîtinek nepenî û balkêş bû , giyanê min bi nermî çinî kir, xewin dikim bi germbûneke li ser dilê min de dabikeve, xwe ji çûnekê re dibe ku dirêj be amade dike, lê hîn ji min tê ku ez girnijîna xwe bi xemê dagrim , di asîmana xemên xwe de , melevaniyê bikim, mîna geştiyarekê ku bi ponijîna xwe ji deverên bedew balatir dibe, ji sîbera xwe dîroka mêrekî hîn nehatiye datînim, di xwebera mêrekî nû , jiyanê bi şêwazekî hîn em fêrî nebûn e dijî, û hîn mêyatî ji dema zîndanîkirina xwe ya dirêj de nedîtibû.**

**Ez jê xweziyan dibînim, min di gulistana giyanê xwe de diçand, ta ku bi qasî azadiyeke nehatiye bicihkirin , di cîhana bendan de bîstînim.**

**Hevalên min hewl didan, bibin ragir ji min re, di derbarê pêkanîna tiştê ew dîtin ku qet û qut çênabe, bi sazkirina peywendiyekî qayim , li gel mêrekî, yek ji wan ji min re got :**

**-Tiştê tu li ser mêr di rewşê de dizanî cudaye ji binî ji tiştê ku tu di sêwirê xwe de dirêsînî, di baweriya te de , ku wê tu karibî nîgaşên xwe li ser mêrekî dûrî xwe deynî, tu xewinyarî , û dibe henasên te birîn bibin, eger tu zarzarî bikî, bi girtina xwe ji ramana hezkirina mêrekî efsanî ku şareze be, meraqên harbûyî di me de , di evîn û aramiyê de av bide, ev yek ji gotinê yê min guhdar kirin e , ji gelek şîret û rûmendarî û hewildanên bergirtina min , û pêwîstiya ku ez hew hewil bidim , ji ber ku her hewildanekî ku hêsan hewildan be , bê sûd e , wê zêde bike ji nîşanên binketinê ,dibe her tiştê ku li ser mêr tê gotin rast bin, ewê herî desteserker e ji xweşevînê, di katê ku gerentiya wê bike, hevala min Mizgîn pir destedirêj û giranfiroş bû bi hestê xwe bi aliyê tundirewiya yarê xwe de ,yê bû  pişt re dergistê wê , pişt re vepêçana dergistbûna xwe jê ragihand,ji ber ew bi ser bir ku ew bi wê û hemî jinan hatiye  xapandin, serpêhatiyên wî yên cur bi cur bi jinê re ,vê yekê aşkere kirin, mirin! , çima wisa hestên me tên e erzankirin, heta di qunaxên me yên hestiyar de, wek dergistbûnê , wax ji hovîtiyên mêran .**

 **Evîn ew jî zewicî, û dîsa min jê pirsî di serdana wê ya dawî ,ji min re , li ser sedema berdana xwe ji mêr re , got :**

**- Ku bimadeyiya wî jê re wek  bimadeyîya Hitler e reweştên wî mîna ajalên çiyê ne, haj wê nebû, wax ji vê jiyana ku**

**hemî xêlîbûn û heznekirî ye, hinek tişt me dihêle ku em li paş eynikan vekişin, dudil bin ,carekê ew bi min re axivî û got :**

**- Wax delala min Hêvî, min ji te re got û piştrast kir: ku dîtina mêrekî temam , bûye nikarbûnekî , an heta alûziyekî, û ez te dibînim tu niqom dibî bi hizirkirina xwe ji mêrekî nêzik te be an wek nivîsên te be û tu çîrokvanekî wek ez te nas dikim, fişarên jiyanê , ji ber ku serhatî cuda ye ji tiştê ku em hezdikin bijîn, an gûncan e ku em wê jiyan bikin, ji ber vê yekê pêdiviye ku em fêr bibin, ji ber ku hevjînê min ji destpêka rojê derdiket û venageriya ta dawiya şevê, û carne nehat , û min xwe dît bizorkirî li ser vê jiyanê , ti çare pêş min nebû  ji bilî ku ez pê re biaxivim , bêzariya xwe jê re diyar bikim, ji sedemê derengmayîna xwe yê hertimî.**

**- Ez hew dikarim vê yekê ji binî hilgirim .**
**- Ev ne kêşeya min e**
**- kêşeya kê ye êdî?**

**Di wê kêlîkê de bêdeng dimîne û piştê wê, şîvê dixwaze, ez lê dinêrim , bê sûd , bêzar , wek ku ez di otêlekê de bixebitim û akinciyan wêzimkar bikim, bê nirx e ew hevjiyana pûç yê reweşt wê rewa kiribû û reftar wê sext e kiribû, ji ber vê min veqetandinê hilbijart, jiyana min berî wî bendewarî û didarî bû, min xwe ji dema binkeftiya xwe, di evînê de winda kir, binkeftin di bin siha tenahiyeke filîç de berdewam dikir, ez rewşa  xwe cuda ji kesê pûçbûyî nabînim, xwe pir bi xewinê newestîne hevala min!**

**- Heta hundirê te wisa zelal bimîne,bi hebûna wê bi temamî birame  , ji ber nîvê te bê guman wê were!**

**Dema Hêvî axaftina xwe bi dawî kir, bêdeng ma, min qehweya xwe beranberî wê vedixwar, bi girnijînek e dudil, nîşan dide, ji tiştekî ez bi dudilbûn vedişêrim.**

**Nalîn ew keça  rêhevala min bû di demeke buhirtî de, ji çaxê rojên dibistanê , tê bîra min, dema ku min bîçimên wê dixwend, dawî carekê çawa ku bi êş jiyan dikir, diya xwe jiyana xwe ji dest dabû , dema  destpêkê çûna xwe li zangoyê , ez tenê  jê nêzik bûm weke heval û dayikeke dilnerm  , berevajî çi takes ji malbata wê, heta bavê wê  jî be, dema diya xwe mir piştî salekê , yarê wê xwe da pêş ji bo wê bixwaze, lê bav wê nepejirand, ji sedmên civakî , malbatî, û çînatî, û piştî wî bi hinek salan , ew neçar bû ku dev ji zanîngehê berde û bizewice û derkeve derve û wisa jiyana wê bi gîştî hat e guhertin, di penaberiyê de, welat , dayika xwe ya barkirî, û yarê xwe yê pepûk di sîngê xwe de binax kiribû, û piştî pênc  salan  ji veqetandina xwe ji mêr  ,li xwediyan  vegeriya, xwe fêrî dilşikestinê kir, û dudiliya xwe jiyan kir , li paş êşên zorbaziyê û kovanên demborînê .**

**Min geşiya xwe winda kir , dema min kesera nediyarbûnê ji gewdeya xemgîniyê vedixwar.**

**Evînê dijîm , guh nadim êşên xwedan serpêhatiyên tal, siha wî xortî hîn dirêjî min dibe , bi bîrêkirineke tê li ber min , ezê  di guhê tenahiyê de pistepist bikim, ji pepûkiyê re cihekî bala di henasên me de heye, ji bîçimên min re  tîbûna xemê ji dîdarî û baranên hêviyê ye, pencereya min bi çirûsîneke xumirtî hol dibe, li ser derbasbûyan vediyar dibe, dabeşên cih , parçeyên wê di bîçimên Nalîn û Hêvî de**

**hembêz dikim, bi ponijîn hol dibim, bi aliyê tariyê nediyar dibim, ji xelekên pirsînê û jimartina xem û metirsiyan, westiyayî me , pêwîstiya min bi dilnermiya a din heye, tevî ku çi li ser hatibe gotin.**

**Ez demê dikim e destê xwe, jiyanek e werê dîdar dikim, bi ramanbûnê ez dinivîsim, her romanekê , her hevokekê an wek hevokekê, ji xwe bawer dijîm.**

**Kovana min, min vedigerîne, ramanekê li ser deverên beyar de, bi pergalê kurteçîrokekê dinivîs im , wê bihin dikim, ta ez bibim dîlê xewina wî ciwanî, yê ku ji dilê wî hestiyarî û nivişt dihate xwar, bi dilşikestin ez pistepist dikim, mîna şaxek zeferan , li ser cokê dadikevim, li germahiyê digerim, ez wê nabînim , ji bilî ku dudil e, vala ez li deverên xemê dilşad dimînim, bi gerdûnekî geş û xweş xewin dikim, bi wê giyan çendîn xweş dibe ,ta ku di cîhaneke, têde aramî û ramanbûn xweş bibe.**
**Henasê min bi siberojê ve girêdayî ye, hestbûna bi hêviyê wî dixapîne, û ji nişkê ve , dayika min tê ,lehiya hibirdanka pênosa min radiwestîne û deriya odeya min vedike û li min dinêre û dibêje :**
**- keça min ez bi nivîsê te kêfxweş im.**
**- jidil yadê?!**
**- belê , tîp êdî di nav destên te de mezin dibin , û dibin huner .**
**- yadê , min dirêj çîrokên bêhêvî û bêzariyê yê ku ji xwbereke ku tehtên bêzariyê wê sotandibû, guhdar dikir.**
**- keça min , çavekî bide kulîlkên siberojê, dema hêsirên hilmê wan şil dikin, û berî xwe nede bêzariyê.**

**Dayika min ez hîştim , ku bibim evîndara binefşê û xemgîniya wê di çaxên roçûna yekem de , min bi ramanbûna çîroka bi êş ji dîmena barkirina rehniyê destpê kir, di dema ku meraqên min, di roniyê de tije gazind bûn, bi firînê dagirtî ne, di ferehiya vê asîmana lawaz de , di dema ku banga henasê bi ferehbûna xwe dijwartir e , ji siha asîmanê , ji ber ku rengê bi ken ji zelaliya gavên wî ciwanî ye, dema nêzî min dibû wisa axivî:**

**- Ax , ava zelal , ji amana kaniyê dilive, çirûsîna a ku ji davekê derdikeve, ji nivişta dêmê te berz dibe, dêmê te yê ku hêvî û êşên cîhanê têde diciviyan.**

**- Bi te xewin dibim û di zimanê min de, rehjena şermbûnê û qêrîna wê ye, û di xuleka xemê min de , kedxwariya xunava xwarbûyî li jor siha xemxwariyê ye.**
**- Ma ji jiyanê giringtir heye, ya em wê dixwazin  û kûrahiyên me ji tîbûnê ,tevî çiqas buyer bi ser wê , nayê avdankirin.**

**- Rev nîne ji xwestina mirovê  rasteqîn e,  ewê ku kilîtên şahiyê bi dest wî de ye, di me de dilpijîna bendewariya siberojê vejîn dike, di hundirê min de hestên pepûk têne cem hev, ta ku lêborînên germahiyê tevî talîbûna rewşê, xelatî te bikin.**
**Bersiva wî didim :**

**- pir in yên wek e min dixwazin xemxwariyê binax bikin, ta ku di dilan de, tovên lavên xwe di ezmanekî de, ku jê hêsirên şahiyê tên e xwarê, biçînin .**
**- belkî**
**- erê weye.**

## Gewdeh

**Bi meraqekî hest kiribû ku qerenfîla bê omîd bihin bike, di nav ropelên pirtûka xwe ya biçûk de, bi temara şiyariyê pêjin kir, piştçavên xwe girtin, keserên xwe ji paş bîçiman ve dişopand, xewin bi dizî wê bindest dikir, ji ker ve hêdî hêdî hate wê, bîçimên xemxwariyê bi tewatî li paş rûkeniya wê de winda dibûn ,binefşa dilborî ,li ser nermiya balgiya wê de firî , dîmenê xema wê ya giryayî xwyanî dikir, ta jê re bibêje dema şiyarbûnê çi pê kir , nermbûna hevrişmê li ser nivînê de li xwe kir, bi tenikî xwe zivîrand, baniya mermerkirî pêçand.**

**ji pistepistê xwe şiyar bû , şehdarî newazên wê dişopand, di şanoya keserên wê de, bi nermî , di binçengên wê yên zuha de derbas dibûn, nivîn bi xemgîniya wê ya keç diramiya, bi giraniya hayhoyên wê yên bi tayê deryayê ve dagirtî bû, çerçev gewdeya wê ya liyan hembêz dikir, wek sirûdekî mest heta dawiya xulekê, cefayên bestê û gefa tariyê lihevxistibû.**

**Kutanvanî çibû ku sirûda xwe ya niştîmanî di nava memikên wê de binivîse, wek ajanekî xwebexş di navbera xêza a veqetandibû rûtbûna wê ya jorîn û jêrîn , xwe derbas dikir, li devê nêfkê wê de terpilî, awaza hatî ji aliyê şeva bê şerm ,vedenga temara wê temam dikir, kêlikên xwe ji keserên wê birbû, yên baran û xunavê li ser erda reşatiyê şandibû, û dema stêrk awazên şevê bihîstin, ji nişkê ve li ser mil, sîng û piştê wê de hatin e xwarê , mîna xalên qehweyî reng, laşê wê dibû gerestêrkekî veqetiyayî ji gerestêrka dagirtî mirin, gemarbûn û qircir.**

## Girî

**Mestbûna xemgîniya sar e, xwe di damarên me de dirêj dike, bi rêya rakêşana jiyanê , di me de germahiyê hizir dike, û çelengiya axaftinê bi awazên ahîna ku di hundirê xewinê de dinêre.**

**Zengelorên me bi stranê re radibin, ji ber ku bi jiyanê bawer in,  me  pêş de dibin, ta ku em komekên baweriyê di rojbenda tariyê û çivîkvedana hêrsdar de awaz bikin.**

**Girî di me de bi şewqa sirûdgotinê  rikberiyê dike, stranên çiyayî di bîrêkirinê cîhanên me de gurvedan dike , bi berdewambûneke tekez, em bizdana kesên revî jiyan nakin , ên ji rastiyên xwe  behitî mabûn, em bi sertbûna dilgirtinê dêşin , dojeha bêdengiyê û radestbûna bêhêviyê dema digihe lutkeya pozbilindiyê.**

**Xemgînî di me de tevinê dudiliyê dilivîne , bi rêya ketina wî di qerebalixên keserê, bi wê re çavên me yên lezgîn diçin.**

**Dûmahiyê bi berkenekî xewindar hembêz dikim ,bê tirs ji tariyê, bi gulê evîndar ez bi hevdîtina tekesbûyî yeqîn im.**

**Em wekî  awazekî sar derdikevin, ku xwe ji ruknên quncên westiyayî  veguhêzînin , bi kûrahiya tariyê derbas bibin , tenaziya xwe bi pendê wî bikin.**

**Dilê min bi ser wê dimîne , xwe radestî viyana qutbûyî dike, ez pîsbûna bendewariya xwe li ber deriyên baranê de dibînim, û li ser rêyên ritman de , ji sosinê kewekî distînim ,**

**û ji şaxekî kevokekê û ji sozekî dilmayînekê û ji eniya xwe bavlîsokên xwatirxwestinê tevradikim , bi rêya paldana xwe li ber melkesê karkerê dibistana me ya seretayî.**

**Ez qorekim ji çi sirûdê ku min di wê çaxê de ezber nekiribû, xatirê xwe ji depreşê û tebaşîrê û tîpa B û T di nîvê peyvê de dixwazim.**

**Na ji sertbûna rawestandinê li ber dergehên zengarî .**
**Na ji tundya zimangerendinê re ê gelek zora wateyê û zimên dibe.**
**Rêwî diçim di cîgehên bilindiyê de ,pênosa xwe dihêlim, xwe ji hibirdankê re ditewîne, û mîna sûlafeke ku ji cihê xwe dûr dirje , ez xwe dikim di xulekên xendiqandina xwe de, ji wê roja çûyî matmayî me.**
**Cihê xwe yê germ di beybûnên jiyanê de bihin dikim, ji ramûsanên qereçiya xwe û memikên wê yên wesiyayî bêzar nabim, diçim berve wê ta ku ez zirneyên zengelora windayî vegerînim, di maçkirina devê bilûrê de, û şahiya paşveçûyî dizivîrînim , di nîvro de li ber maseya xwe rûdinim, neqşeya revê şêwe dikim .**
**Girî ; naskirinekî giştî ye ji rewşeke sert re ,bi giyan û pêdiviyên peywendiyê ,bi giyanên windayî di henaseyên jiyanê de , di wê de enkêtkirina xweyetî di rahijtina pirsa zehmet de berz e , xweziyên serkeftî û sozên bumbekirî kedî kiribû, ji bîrekî ku baş bi ramanbûnê bawer e.**

**Xwe di hembêza hêviyê de dikemişînim , ew hêviya ketî di kokê dar û gulan de, giyanên me beranberî bizdanê de xwe dicivîlînin, di deştê fereh de xwe vedikşînin , û hêzên roniya dijwar hildigirin , radibin , tozê ji qerqodeya bêdengiyê berba dikin.**

## Girtinhev

**Serwerê rûniştî  li ser textbendê paşî de  ji vê felekê  , hemî têgehên mêraniyê û birûmetiyê têk dibe , dema ew tişt bi yarê wî ve girêdayî dibe,  a hemî nasnavên mezin di wî de têk biribû , dema nêzik yara xwe ya bi çûnê lez kiribû hat, bi xembarî pê re peyîvî :**

**- Çavên min şopa hêsirên te didin û dilê min lêvên te nîgar dikin, di her rehjenekî bi keser berdide, û tu hîn zelalî , germî dema tu digrî.**

**- Başiyên xwe bide min û biçe, dengê min êdî ne ji te re ye, û jiyan tenê carekê ji evîndaran re sevkekenî dike, te ez lawaz kirim û bê te ezê misoger bi hêztir bim, û ji vir û pêve ez nema lawaz dimînim.**

**- wisa nebêje, ez di bextê te de me , buhar wê were û bi şahî wê xemên me binixumîne, qerenfîl li ser sîngê te bar kir û êdî findên vemirî tu hembêz dikî û dirazî , û ez jî stêrkan dijmêrim û bi şopa her leylanekî dikare evîna te min jibîrkirin bide didim.**

**- Birastî !! ?, ev şêwazeke erêniye.. û niha titştekî din dixwazî?!, vê şêwazê dubare bike , û tu nêzik dem wê hebûna min jibîr bikî , oxir be!.**

**Mêrê perîşan pir êşiya, di riwê wê di qêriya û zendên wê bi herdû lepên xwe girtin û qêrîn da û got:**

**- Ez di bextê te de me, bi bîrêkirin û êşê hest dibim, biyaniya min dirêj bû û neynûkên awirên  te ropel û**

**nigaşdanê min peritandin, dema tu li gel min dimînî , hest dibim ku cîhan bi tev ya min e, dema tu li ser milê min dirazî, û zîziya xwe didî min , hest dibim ku rewrewkên jiyanê û westandinên wê têkdan dibin, lê belê bi lez ez çavên xwe vedikim, li ser rastiya tal de, li dor xwe dimeyzînim , dibînim tu nînî, û bi vî awayî ez dizanim ku ez xewin dibim .**

**- Hêviya me di ezmên de veşartî ma , ezmana ku ti kes ji me pêve baş nedîtibû , çima ?!, ji ber ku em dikarin bihaneyan bidin dînbûnê ,weke ku qêrînên te bandora xwe li ser min heye, lê bawer bike lawaz e, min biryar dabû ku ez te bihêlim û dûr biçim , dûr ji çavê te û cihê guhdanê te, lê min nikarî bi te re biçim, ji ber bi dirêjiya evîna te , ez qet biserneketim ku gavekî bi pêş ve herim, pirsên te rikberî min bûn ,bi derbasbûna çûn û hatinên min.**

**Ez bawer im ku paytûna penaberiyê hînê li bendê gavên me yên ne diyar û hizirdar e, berve qircira terman de em diçin û derbas dibin, ma êdî çi wê di jiyanê de biqewime, ez nema dizanim, ji bilî çîrçîra pênosê bi tiştekî nabihîsim, dibe ku te dibihîsim, dibe jî ez bi dirêjî jiyana xwe şaş bim, lê em ne heta dawiyê du firişteyên ezmanî ne , qet û qut nîne du evîndar ji hevdû bi qasî hev hezdikin, û di yek astî de ne ji dînbûnê, û niha oxir be, min yekcar jibîr bike, ez ne yek jinek im an dawî jinek im, û jin diçin û tên wek hûn mêr ,vê yekê dubare dibêjin.**

**Ew evîndar çû , eniya bê û polatê hembêz kir, û ne xwest seqem û agir bi tenê wî bihêlin, dêma wî ya vala û sar şil kirin mîna şevên nezaniya rojhilata xemgîn, li rastî**

**kevokekî tilîbirî hatibû, mîna zarokekî kurdistanî li ser xeltika rêyên bumbekirî de çekirî , ew kevok di riwê wî de qêrîn dan, dêma wî ya mîna perakî hesinî zîv, ji kenara berbagê bar dikir, nixumî bû, bi reşatiyekî ji nişkê ve nîgar kir, û li rûxiserên xwe de, bingehên avahiyên xemgîn û êşê şêwe kir.**

**Peyvên dîwarê zîndankirî wî gêj kiribû, mîna deryaya kûr di dorhêla tarîbûyî bi êşa ku dilê bîr de mayî ,nivî kir.**

**Dîwar hemî cadeyên êşê hilandibû, li mirovan digeriya, yên di zîndan û girtîgehan de girtî mabûn, tomarên dînîtiya xwe dinivîsandin û destkeftiyên xwe yên veşartî li ser rûxiserên xwe yên rizî de ezber kirin.**

**Dema seqema zivistanê bi me re diaxive, em wî dibînin erza me dide , mîna teresekî qelaş, zivistan bi mer re tund dibe, agirên kîna xwe bi ser ronahiyê dibarîne,bi dêmekî sersam bi armancên çavbirçî û ezez xwe bidarve dike.**

**Zivistan bi destê çepê dinivîse, û nêzî nîgarên zarokên germ nabe, ji ber tiştê ku em nîgar dikin wî dixin di helwestên şermîn de, ezman kiribû pîrejinekî , hêsiran dibarîne û tav berda li ser mîna hevjînekî ne rewa , ketibû jiyana ezmên bi zorê.**

**Bi riwê xwe yî parçekirî biaxive , bi tiştên nepenî nepeyîve, hewl nede ku tu ji pirsên min rizgar bibî, ew li pey te ne, heta tu rastî mirina xwe werî, de hew bi bez e.**

**Ey zivistan , ji lêvên te yên bêhiş min peyvên xwe wergirtin, min li ser derdê firindeyên koçber a xemgîn**

**nivîsand, li ser vegera welêt, piştî penaberiya zehmet, kûrahiya min pencereya axaftinê bi nehêniyan nepeniye, bi hêma sersafbûnê di  lêvan de saz dibe, wek mebesta periyê di çavan de çêdibe.**

**Ciwantirîn tiştê em li ser diaxivîn ne zelal bûn, kêfa min ji vê tenahiyê re nayê, lê ez çi bikim, ev tariya dudil ne li gor min e, ya baş ku ez rûnim li ber çavên tîrêja sipî  .**

**Di şeva dînbûnê de , em bazarê dikin, û  kes tênagihe min û temar di hestê min de parsê dike, tarî xwe ji henasên min re ditewîne, ezman wan ji leylana bajarên min  diqewitîne.**

**Ramanên yên ez li xwe dikim ciwantir in ji arandina cilên hundirî li ser jineke parseyê awirekî ji hin kesan dike.**

**Ezman ji sêwirên me yên vala ,lêborînê naxwaze, va hêdî hêdî di nav valatiyê de dimeşe.**

**Ez siha te di nav kûrahiya xwe de dibînim, û ez ji tirsa hilkirinê xwe pê digrim, gavê te mîna baranekî li ser dergehên bîranînê de derbas dibe,kî cutbûnên me yên jibîrbûyî wê vedigerîne, ewrên te yên sipî xwe ji qêrînên binefşê re ditewînin, de diltaliyên hevdîtinên yên hîn li ser balgehên bîranînan  çarmêrgî rûniştî ne vegerîne , ufkufî nebe ji bendemaniya dirêj ve, tenê zivistanê kal bi dildariyê dizane, û baweriya ponijiyê jî, xwe bi şîretên binefşê dinixumîne, û xwe ji agehê sirûştê û xwesteka hejîr û zeytûnê re dixemilîne.**

**Ne bêje li ser xwe tu çûkî, kêmasî ew e dema em xwe bixwşînin piştî me temenê zaroktiyê derbas kir, û kêmasî ew e dema em nexwazin guhdar bikin û ji kesên kehr di eynê çaxê de bixwazin ku me bi xurtî bibhîsin.**

**Lutkeya evînê  di bêdengiyê ye , ne hevaltî bi pepûkan re.**

**Zivistanên yên di hizrê me dimînin , yarîgehan nîgar dikin û carne westabûnan  saz dikin.**

## Dewlemend û xizanekî

**- Xizan : bêzar im , ji ber ku ji dema ez bûm e , min bêhêvî û pêdivî jiyan kirin, bi jiyanê qayîl bûm , min berdewam kir, kar kir û li ser bendemana hêviyê jiyam, bi rêya çend parîkên nû hema birçîbûna min digrt, li ser regeza ê qayîl dibe wê bijî , min ji ava bîrê tenahiyê vexwar, toza tengezariyê û mişextiyê min kişand, di her kêliyê de, min lîsteya yaseyan dîqet dikir, ta ez ji derbaskirinê wê şiyar bibim.**

**- Dewlemend : min berê xwe dabû tiştê nû , gijkirî û ciwan, ez di hundir û derveyê xwe de pir têr bûm, meraqên min şaxdayî bûn, mîna binxaniyên bajarên kevin, zêmarên awazê , bi min xweş nehatin, xemên min mîna pereyên min bûn, ahînên min bilind in, mîna eywanên min in, li aramî û rehetiyê digeriyam, lê belê ez ji nişkêve dawiya xwe min didît, zû kal dibûm .**

**- Xizan : ez bi dilxwazînên yên nayên dîtin hest dibûm, bi xewinên yên şerê metirsiyê dikirin serbilind dibûm, bi dirêjî jiyana xwe , ez li pey aramiyê diketim, li pey malekî, tirûmpêlekî, cihê nanekî, lê belê bê rawestan dimeşiyam , ta roja dawiyê ji jiyana xwe , û li ser pirekî navketî de derbas dibûm, min biribû kolanekî ne têxistî, ji sedema leşgerbend û pevçûnan, ceng hat ta min bi malbatê re çeke ji derve, berve heldêra siberojekî ne diyar .**

**- Dewlemend : min li ser tiştên geş jiyan dikirin, û min parçeyekî herî giring ji xwe jibîr kiribû, ew parçeya bi**

**qîmbûnê ve girêdayî bû, ew ma tarî û reş û ne çandî di jiyana min de , min bi sertirîn cureyên birçîbûna rastî hestiyar dikir, baranên ji êşa metitsîdar ji nişkê ve bi ser ramanê min dibariya, û ji bilî wan , dîwarên min nedîtin, ew sexteyan ji min kûrahiya jiyanê û hêsaniya wê veşartibûn.**

**Ciwantirîn tişt dema ez di erzêla te de bijîm, dûrî şevpestên koşka xwe ya zorbaz.**

**Jiyana te xweş e , û tu xewin dikî ku tu wek min bî û ez jî xewin dikim ez wek te bim, û bi hev re em xewin dikin ku bijîn li cihên ku têde birçîbûn an têrbûn nebe , ji ber herdû bi ser me de tund in, ez ew parçeyê rikeber im ji hêza te ey belengaz û tu ew beşê hêzdar û kiryarî di nav de, em herdû valahiya a ku di jiyanê de derbas dibe parve dikin.**

## Xwezî min ji hebûnê bar bikra

**Xwezî min ji hebûnê koç bikra, ma ev birastî ew hebûna aşkere ye pêş me ?!**

**ewa di me de , dilpijîna mirinê û xweşiya cankêşiyê dipejirîne!**

**Ma ez im ewê xemxwariya tevderbasbûyî bi wî ve girêdayî ye, an ez ew tevinê nalînê me, di nava tiliyên tevinkaran de, pîzotên xwe hildigrim, dûr wan çedikim, ji bîrêkirina a hîn bi girsî hêlecan dibe re dinivîsim, pêş vê gavîna westiyayî dimeşim, henaseberdanên xwe yên bêjimar rûşan dikim.**

**Çêdikim keskesorê, erdê seransû dikim, belkî ez rastî gerdena rizgariyê ,di perestgehên jibîrkirinê bibim, ji bizdanê belav dibim, pêş dojeha hingemeyî şiyar dibim, xwe tevlî min kiribû, navêtibû xwe ji min cuda bike,çi tiştên ez derdê wê dikşînim, min zêde mirîkirin û xendiqandin dike, ez ew rizgariya aşkere me di feleka dawîbûnê de, elfebayê xemgîniya xwe vedikim, bi tijebûna dudiliyê keser berdidim, eza xwe nîgar dikim, mîna gilêza zuha li ser tilankê sêwir de , ez hîn tevî dojeh û metirsiyên xwe , bi vegerandina selûya gêjbûnê diramim, bi vexwarina dilopên hêviyê ,ziktêr dibim, belkî ez aram bimînim, belkî hogiriya min xewinên xwe ,ligel hewayan vegerîne.**

**Belkî firindeya ezmên li pey avraza bêdengiya min bikeve, basikdarê wî ya belavbûyî wek xweliyekî di ezmanê paxirê û eniya polatê de gur dibe.**

**Eger sozên payîzê bi vegerandina wê ji xewinên asê û sozên rûken  pêkwerin, eger ez ji feleka ta û germahiyê dûrbikevim, dudiliya xwe ji vê felekê re binivîsim, û meraqa min bi destxistina reweşta bilind ji bêhişbûn û zirmitînê re ,di rojbendekî vala de, ji derveyî rêxistinên jiyanê de, ji vê bayê re çira dikim ,rehniya a timî ji şûrbeya pêlên virmor  vedixwe, berçav bikim.**

**Eger ez ji bilindiyê re welatek bûma, welatekî ji devên wî , qêrînên şoreşgeran diteqin,yên raperînên kotelan dipejirînin, kêlek zorxaneyên xwînçûyînê , ji birçîbûnê têr bûn e, ev welatê belavbûyî di hewayên bergeya westiyayî de, tabût têde kevok in , serok têde xwedawend in, şehîd têde neyar in , neyar têde şehîd in.**

**Eger min karîba li paş şahiyê , gulwazên rimên repkirî li ser maseyên westabûn û bîrêkirina dawî de , berpêş bikra, wê ez bextewer  bama  bi ramkirina demê li kêlek xwe .**

**Mermerên sersafbûnê di eniyê demê de diniqişînim, difirim , xwe tevlê eniyên bê dikim, rastî mirinê têm,rastî bendemaniya bê hêz  têm .**

**Di nîvê cîteng  û vê fişafişê de ez difirim, ta ku bi şadbûn û geşî belav bibim.**

**Ezê hemî reşatiyên gêleşokî ji şanişîna xwe  biqewitînim, ezê bişkujîna xwe ya zirbûyî  ji riwê te ya zirkar biqewitînim, di rastîhatineke sexte de , di hebûneke sextekar de, tenahiya wêrek dixwazim, tenahiya newêrek hurhurî dikim.**

**Kuliyên kesk in, ewên li pey mezinên newêrek û dilzar dikevin, xwediyên hûrên kirêt û tijebûyî ,di riwê birçiyan de nûşecan dibin.**

**Zelaliya berdera bê qircir dixwazim, di nav hebûna neçandî de ,ez ew bendewariya bê hêvî, sozê gunehkar û gefê piştdest im, ez westabûna xewinkar im di bihinvedaneke paşîn de ,û ez ew westabûna dorpêçkirî me di destê hêviya nandoz .**

**Ez ew henaseyên mişextbûyî me , di nav xweliyê şewatan de, eger min ji hebûn ,soz, ponijîn û sarbûnê koç bikra, wê min karîba şahiyê bida, bi barkirina xwe ji vê hebûnê , ji hemî kesên ku bihnên xwêdanên xwe , di bêhindariya gul û kulîkan de bihin dikin, û xwe ji kêliya sistbûnekî dirêjdem re amade dikin, ji wan re dibêjim , dem hat ku em xwe berdin li ser çavbirçîbûna meraqên xwe de, berî rîşalên xwe çêbibin û belav bibin ta li ser tiştên mayî de, ji gomên rambûnên me yên dûr de tune bibin.**

**Eger em ey jinavçûyîno, li ser piştê lepên qereçî de neqşe bin, eger ez ezmûnekî tehlatî pêş wê bûma, ta ku hûn wê pêkanîbana , bê pêşbazî an pêşhevanî, wê min bikarîba bi we bifiryama, ji qelşandinên perestgehên jihevketî , û dîwarên kavilên wêranbûyî, wê min li ser şala qerenfîla sor de , hinek xweziyên bedew binivîsanda, eger min ji cîhanê bar bikra, wê min karîba bin axê de, şahiya xwe ya dilçûyî pêkanîba.**

**Eger ez ew soza dudil û welatê westiyayî ji bangên xwe bama, wê min dînbûna tîp û nifira wê pêkanîba, wê min gerdûnê bi palgîbûn bikra mîna mezintirîn seyrbûn , û**

**xweliyekî winda , wê min li ser eniya şahiyê de, xemgîniya xwe ya dirêj binivîsanda, wê min bihîşta şahî li ser destê min biba şagirt,ta ku min li dawiya xemgîniyê de, di kêliyên xweşiya cenegirtî de ,xelatî wê bikra.**
**Eger min ji hebûnê bar bikra , wê min karîba nifirê xwe li alên erdê û dirûyitiya wê bikra, wê min li ser maseyên barkirinê de, hinek bîranînên rizî binivîsanda, ji bona ez hertimî vegerînim, û di hundirê min de , felekeke mişext e, ji giraniyê min radibe, û bi hêz serê xwe pêş min radike.**

**Eger ez ew mirina şîn bama, wê min ezmana şîn birevanda, wê min bi derbekê wê dawetê şîva navberên kor bikra, belkî bihatana li ser rêya rast.**
**Eger ez ew evîna sermedî bama , wê min karîba deziya xwe bida henaseya xwe, eger ez ew mija dudil bama , wê min zimanê zelaliyê bihin bikra, bi hemî çirûsîn û pozbilidiya xwe, wê min zordariya şevan ji dilên evîndar re, şermezar bikra, wê min li ser wê feleka kor a ku bi şopa gavên feleka hestyar dide berve şadî û nemiriyê ragihandiba.**

**Eger ez ew temenê mayî, di cîhanê de bama, wê min karîba ji bêçariyê re, kulemergiya xwe binivîsanda.**
**Eger ez ew evîna mayî di vê çerxê de bama, wê min karîba ku di paş bedewbûnê de bimeşiyama, wek evîndarekî , bêhêviyê qet nasnake.**
**Eger ez ew çirûsîna lihevhatî bama, wê min dengê xwe li ser eniya şikestinê de nîgar bikra.**
**Eger ez!**
**Eger ez?!!**
**xwezî min ji hebûnê bar bikra.**

**10- 6- 2010**

## Hembêzkirin

**Ew meraqa giyanê ye , bi destxisitna xulekek yekbûn, temenê wê ya rastî , bi temenê erd û hebûna mirov e.**

**Dibe mîvanê me , di dawiyê rawestgeha xwatirxwestinê de, di nîvê vejînbûna roçûnê , li bîranîneke veşartî digere, deng jê dernakeve.**

**Hembêzkirin ; destanek oxirbûn e, jibîrkirin wê dibêje.**

## Hişbûn

**Bêdengî nemabûna zîrekiya xwe ji ber giriyê radigihîne, bû awazekî lal, perdanên xwe ji bêsûdiyê wergirtibû.**

**Ji axaftinê dikizim, di talîzokeke girtî de, dîlgirtî dikevim, bi şewatên tozgirtî de, pêçayî me.**

**Çûk dirêj min temaşe dikin, ez bi wan nigaş dibim,wek ku ji min re dibêjin : ( em li ku me , ji henaseyê te yê westiyayî , hevalê me, tenê hevgarî , mirovan çêdike, an diyar e tu li ser destê xoşrabêriya veşartî de  şagirtî bûye, ji ber vê yekê êdî te destpê kiribû bi hestbûna valahiyekî pêkuj, rabe hevalê me , bangdarî maye ew bangdarî, bi rastiyê  girêdayî ye, bin siha wê de mirov , ji têgehê mirinê dûrtir, xwe bilind dibîne, di stranê xwe de şîrînbûna siberoja werê hest dikim. )**

**Berî xwe didim sirûşt û henaseyê,nameya min  ji dawiya gerînê re dişînin, ez li dawiyekê  re, destpêkeke nû radigihînin.**

**Tenê hevgarî, sloganên hêsirên zelal derdixînin, ji hişbûnê , tiştên ku min di cihên qircirê de fêrnebûm  e,ez fêr dibûm.**

**Ew min fêr kiribûn wateya şûrtbûnê, bihinkirina evînê, di kulîlkan de, û çêjkirina wan di avê de, û dîtina wan , bi rengên sirûştê , li wir bedewbûna serguhayî , bi şahiyê xwe dipêçe.**

**Ey rêya dirêj , omîd dikim ji te , min hîn bike, çawa biçim, ji bo mîrekê ,di jiyana min de, bû rondikeke mezin, ji çavên payîzê weşî .**

**Ez diramim, û dibe li palgiyekî bigerim, serê xwe li ser deynim, xwe radestî dîtina stêrkan bikim, dirêjkirî , li şeva xwe guhdar bikim, ji çîrok û axaftina xwe bi min re, li nalîna xwe , a di me de binyad bûye, lêbelê çi ji bo min ?**

**Ma êvar ne hêjaye , ku romanekî şûr mîna hêsiran ji devê min guhdar bike?!**

**Hindî ey şev ,min bi te re rûdinştibûm, bêhtir bi naverokê pendê te yî jibîrbûyî kûr pê diramiyam,ew bi ser pendê kalemêran e.**
**xwedan porê reş , dema tu wê dibînî, di reşiyê te de, bi derya de diçe, ma tu çavekî lênaxî hinekî, hayhoyên min diyarî wê dikî, ma tu jê re piniya giriyê min e misoger nabêjî?!**

**Ji şewatê min , êşa bîhok û derdê çefteliyê ye, talbûna hemî gengazên xewinkar in, bi awayê jiyana nû.**

**Tu ey şev ji çentakên rêwîtiya me dernakevî?!!, ji ber sarbûna cilên te hîn bi germbûna jiyanê û qurisîna aramiyê dorêgirtiye.**
**Pelek dutabû, ta gelek pelik vebibin, ta ku cokên çemên min û mizgîniyên xweziyên min e tarî hilgirin.**
**Me jê re nedigot çawa şahjina ewran, xwedan porê reş ,ji mîrê erdê re bûkbir bibe, jê min destpêkiribû bi hestbûna xwe , bi derbasbûnê jîndarên nû li cîhana me ya bêhêz.**

**Ezê êdî ji nû ve, destpê bikim bi axaftinê , li ser şîniyên penaberiyê, di welatên ku ez têde jiyam, ji ber a rastir divê em bipirsin , li ser derdên kesên , ên biyaniyê li welêt, mal û di nav xwdiyên xwe de dîtibûn, bi taliyê xwe dijwartir e ji biyaniya koçkirin û hîştina cîgehê.**

## Jibîrkirin

**Hemî êşên xwe jibîr kiribû, li pêş revî, li pêş û bi lez, , tu jê çi dixwazî ey laylana sar ?!**
**Xwe ji germiya wê bide alî û dûr bikeve, lê pir menêr e ta ku hestkerên te xera nebe.**

**Di bîçimên tancîka hêsirê de , ez bînvedana qîra êşayî li ber dojeha heriyê vediguhêzînim, li ber amana celbê vehese, li ser zeriya rokê û sipîbûna heyvê  mîna gularezê binivîse.**

**Ey mêya ku nayê tenê bi hatina nediyarbûnê , bide min qupika şewatên xwe ,di gurvedan û nûbûna wan, agirê evînê xelatî xêzanîna min bike, agirê nayê vemirandin, wek ku tu çawa bi yekîneyên bê re şer bikî, tu  hatî bi bazdan ta min hembêz û maç bikî, camên bêdengiyê dişkînî û ji bêdengiyê zimanên pirjimar çêdikî, te demekî şerê peyvên min kirbû, ne ji bo xwastina rikeberiyê lê belê bi qêrînê, ta ku tu ji gotûbêjiya zorengê , pênosekî nû bi avê kelîbûn û kînê li ser wê cîhana hişk dîroknas bikî.**

**Çima herku ez diketim odeya xwe, hest dibûm ku balgih dimeşin, nivîn xwe dixirxirînin,  ma ev dawiya cîhanê ye, ez têgihiştim te , êdî tu hez dikî ez bişewitim bi awayekî cuda , çima ne wek ez fêr bûm e  bi kêmanî?!!**

**Min, sotandinê li ser çiyayên bilind  hez dikir,  ezê bisojim û wê carek din aferandina min dûbare bibe , yên wek min û te ji carekê nayên sotandin.**

## Kêmbûn

**Li gel sirûdên şevbûriyê, stêrk bi çavên me yên mest şeyda dibin, em radibin û me giraniya xemrevîniyê li ser piştên xwe rahijtibû.**

**Geşiyê çinî dikim, li ser tariya rewşên me yên derûnî de îmze dikim, ez mîna lêkolînvan û şopînerekî ji rastiyê bi tevahiya wê demekî dirêj pê re derbas dikim , di sebaret jiyana min de ji min re dima mîna metirsiyekî wek nemiriyê û hewildanê berve temamiya tiştan, bi rêya berdewamiya peywendiyê li gel jina nimûne û barkirina jina penage .**

**Leylanên mirovan mîna nimûneyan berz dibin, nêzî jinê diçin ,ji ber ku ewa di talîzoka gerdûnî de, yê ku em di nav de dizivîrin dijî, û axaftin li ser kêliyên matmayînê buhatir in ji çi axaftinên yên ez wana li ser sehneya xêzan de vediguhêzînim.**

**Ji ber ku jin dikeve pêşî lutkeya seyrbûnê , ewa metirsiya min e hertimiye yê hişt ku nivîsên min herin berve buxçeya bîranînê û çîroka evîniyê, axaftin li ser evînê di civakên me yên rojhilatî de, wek ku tu di xelekeke vala de bizivîrî, çi tiştê bi evînê girêdayî bi guman e li cem çavdêriya sixûrî yê serdemên zordarî û gendeliya yekem binyad kirin e.**

**Eger nivîs şanoyeke munûdramîk be bi dîmenê xwe di zikmakiya resen ji mirovan re nîşan dide, tê wateyê wê henas biaxive wek temamkirinekî ji reftarên zayinê û metirsiyekî ji metirsiyên tirsa min ji tunebûn û sistbûna hundirî , ji ber ku mîna her cîhanekê ye ku di nav de ,viyan**

**û xwestin dimînin, û rolekî dilîzin ji dan û standina diravî bi rewşê re ji bo rakirina giyanê li tiştê ku pêdivî be, her tiştê ku ez li ser wê diaxivim , tiştê li min zor dike li ser axaftinê , min dihêle ku ez dîlê xêzan bim, yê ti xem an keser jê re tune ne, ji bilî ku peyvên min çinî bikin, bê ku bi şînbûna wan têbigihin an ne başiya wan bidin xuyakirin ,ewan timî dilên xwe yên fereh vedikin bi dilçûyin, û tîpên min in belavbûyî hembêz dikin ,bi germbûna jineke ku mêyatiya xwe jiyan nekirî bi dirêjî demên xwe yên dembuhirtî.**

**Ji min re ew xêzan, diyarbûnê mîna cîhaneke vala ji nîşanên derbasbûnê diyar dikin, hemî tiştê xwe dabû nivîskaran û bedewtirîn cil helbijartin ku ji xwe bikin ta ku peyvên wê yên hatî ji hundirê nivîskar pêşwaz bikin .**

**Zayîna rastîn ji evînê re ji derveyî talîzokên nivîsê û sanca wê ye.**

**Kêşeya wê ew jina tirsok û li qurzîkê rûniştî ,ti carî li ber eynika xwe ranewestî ta li xwe di hundir de bibîne, lê bi dirêjî temenê xwe li pêş eynikê radiwestiya ta li sexteya xwe binêre û derewên xemilî li xwe bike, dibe ku gewezî bike pêş hinek mêr û bêje ji wan re li ser hijmara evîndarên yên li ser çûngên wê girîn e, û nikarîbûn nêzî nermiya dilê wê bibin, û xwe dike pêş çavan wek jineke ji xwe hez dike, li gel mêr an dostê xwe ,û eger te ji jinekê pirsî li ser nerîna wê bi Can Cak Roso û helwesta wî li ser jinê ku ewa bermaliyeke, xwezayê wê danî di xizmeta mêr de, wê bigota ku Roso xwest di vê gotinê de nirxekî cuda bide jinê û li ber mêr wê zêdetir ciwan bike, wek ku bi vî nerînê xwe nêzî**

**rebeniya hêzê dike li cem mêr, ta ku kêmbûna xwe ya gewdehî veşêre.**
**Eger min karîba ku ez awirên yara xwe û tîrêjin wê yên dilrevîn mîna wêneyekê bigirta dema li ber çavên min şewq dan, di wê kêliyê de , pêwîst e ku ez di kardigeya îko ya fîzîkî de kar bikim.**

**Ji keserberdana sîngê hezar bînxweşî heye, dibe ew hilma, ji gelek gulên cîhanê û şînkayiyên wê yên bi jehr hatibin çêkirin ,û axaftin li ser jina ku ez jê hez dikim an ya li ser dinivîsim û bi navê wê diterpilim, ewa cihê xweşiyê ye li cem min û hewldaneke ku ez barê mêyatiyê li ser xwe bi qasî ez dikarim rakim, ta ku ez êşa henasê an werimandina movikên dil nekşînim an kêmbûna xweparastina evînê nejîm.**
**Ez dizanim ku evîn tê jiyan kirin û nayê nivîsandin û dizanim ku pirtirîn wêjevanên dewletketî û bêkêr, yên diman qurbanî pirtûk û ferheng û odeyên sar û bi qerebalix, lê belê ez û ji bona dilsoziya evînî û ta ku ez piştrast bim ji rehjenên dilê xwe û saxlemiya wê, ez petgerînekî pijişkî hertimî bi rêya nivîsê ji xwe re çêdikim ,ta ez ji tendirustiya xwe piştrast bibim, û asta gênciya xwe di evînê de bizanibim.**

## Metirsiya siberojê

**Di çavên te de ,min ewr veşartibûn ta ku bitebitin, berî ku fermêskên  xwe birjînin û min dergehên çîrokên kevin lêdabûn , ta li ber guhên te de weşan bibin, belkî tu ji sertiya rewrewkê û valahiya wê derkevî, em herdû ji nifşê gîha û avê ne, em bi hevdû re di jiyanê de mîna du sihikên daran dimeşin , ji ewran , û lehiya bîrêkirinê re, rizgariyê dixwazin, kêliyên ji dilşikestinê têne sîbera min.**

**Ez fêr bûm e ku lêborînê ji dara sêdarkirî li ber aramiyê bixwazim, dilê min bîrêkirinê dixe girtîgehê , dûrî çavên miriyan wê vedişêre, bi birîna aliyên din êş destpê dibin, ji qelişandinên tirsê derbas dibin, ta ku dûr bidawî bibin, li kunekî din digeriyan ta ku jê derbas bibin, bêdengî hindik mabû ku tenahiya xwe bi dawî bike, ta dirêj ,bê rawestan biqêre, pepûkî ji avên tundiyê vexwaribû, mada xwe ji dojeha xemxwariyê dagirtibû, çendîn bi dawiyeke şad ji xwe re diramiya , lê binket, êdî ti bijar e jê re nema ta ku bi rêya wê ronahiyê pêşwaz bike, ji pepûkiyê re çîrokên yên  ji guhdarkirinên mirovan têr nebûn e, geşiyê ji gulxaneyên evînê hildikşînin û axînê  zêde girî dikin, koşeyên geşbiniyê wêran dikin, çendîn ne zelal  in xemgîniyên bilbil û balindeyên barkirî, çawa bersiva rehjenên dilşikestina min nedan, û ewan ji roçûnê re sirûda oxirkirina dawî awaz dikirin, pencereya  min bi xemgînî li min dinêrî ,  ji nav simên  heriyên zer, lingên jinek e evîndar diqêr e, di bîçimên xwe de beraxaftina efsanan radike , gewdeya wê bi serên aliyan digre, dema heriyê ji dêmên destaran de berba dike.**

**Kîme ez !, ewê ku min berî vê carê nedîtibû, ji ber ku diyarbûna xwebûnê asê ye mîna nebûn û rikeberiyê .**

**Ey zehmetê mîna çima xezalê, dema ji pilingekî har direve, baznede , li cem min nepirçekên dirindeyan nîn in û ne jî kilbên ku li golên maran de avjeniyê dikin, ez kujerê mirinê me di lutkeya zordariya xwe de, ezê zaroktiya berfê bi hembêzkirina xwe û kedîkirina xwe ji çiyayên şoreşger re xelatî te bikim,porzêrînê wê tu nikaribî sermaya avşînê hilgirî.**

**Mîna baz di depên azarkêşan de tu hatiye niqişandin , miskê çavên xwe têxe reşçavên min in westiyayî, ta ku ez ji giriyê re ,dîmenên hêsirên bê mînak biafirînim, çoxê min bibe, eger sermaya biyan ji evînê bi te ket, ezê pêş te bimeşim berî tu bigihî kûrahiya vê serdavê , dînbûna kûr ,seqemên xwe di dilê kulîkê de belav dike, pêş te deryayek e ji matmayîbûna min e , hewl bide tu wê bê avjenî derbas bikî, tu nikarî vê yekê hîn bibî, bê ku tu henaseya xwe yê sarbûyî neman bikî, û rehjena xwe ya keleş amade bikî, paşguhkiriye di hundirê boşbûnê.**

**Ey deqandina serbilindiya nîgarbûyî li ser zinarekî hişk de, mîna rêjnek birûsk ji agirdana qeşayê bilive, bi kilbûyînê xûnçûn bibe, ev eniya xemê ye dijwartirîn awazên xwe ji devê min dişîne, ta ku ev kirêtiya niha bi avên zêr û elmasê veşêre , çavên xwe dikirin du çirayên evînê, ne xwestin ku bi kevirên axê şil û hewarê bişkin, stûpêça xwe ya hevrişmî derxe û di riwê bê de çeke, wisa wê bextê me bibe alîgirê me û em ji bêdengiya aramiya bi guman rizgar bibin,pêdiviya min bi dilşikestina min heye ta ku min bihêbvoje li ser pêkanîna dînbûnê careke din, bê ku ez bi pejiyên bizdanê**

**hest bibim, ji ber ku ez ji talîzoka jêriya jihevketî derketim,ezê ji xewinan re dirêj qala te bikim, ey evîndara payîzî , wê dîrok ji aramiya te fêr bibe, wê ji bêdengiya te encaman bigre, û awazên te ji nifşê siberojê re bêje, wê nifşê nû me di bîra xwe bînin, wê wek me xemgîn nebin, wê nenivîsin tiştê me nivîsandî , û ti giringiyê wê nedin beraxaftinên me, keserên me ji me re ne, lê wê evîna me pîroz bikin, ji ber ku ew şûnmaya ya bi wan re alîkar dibe , ji bo nûbûnê û girêdanê bi kokê, yê xwestina jiyanê di wan de xwedî dike, çi li ser zarokê min?, wê gelek dilnizm be ji bo birêziya ezeziya min, lê wê li paş piştê xwe şivekî stûr rake , ta di serê min de bişkîne, eger min peyvekî derew bilêv kir, wê nifşê bê , xapandinên bavan nepejirîne, ji nifş re awayek wî taybet heye, raman û hovîtiyên wan , ji hovîtiyên me û hovîtiyên bav û bapîrên me tên, û bapîrên me neviyên dapîrên xwe ne, û dapîrên wan tenê ji bapîrên xwe re şagirt bûn , bila nifşê bê, kortên serbizaftiyê bikolin, belkî ku pêşeroj baştir be, de bila baştir be xoşevîna min ma metirsiyên siberojê têne te yara min?!!**

## Metirsiyên dilekî

**Raman bi ser min ve tên, metirsî xwe di darbesta nîgaşdana min de, bi cih dikin, leylana keçeke hetle nêzik min tê, û leylana ciwanekî bêkêr li jor min xwe vedigre.**

**Ezê ji nivîsê rawestim, ey şev bi min re ,li ser xewê alîkar be, ez tenê hêjayî xewê me wek yên mîna min , ne pêdiviye ku şiyar bimînin, ji ber ti wate ji şiyarbûnekê re nîne ku nikaribe di agehên me de kiryarekî bike, ji tiştê ku di hebûnê de diqewime, bi tenê  ew mêrê noqbûyî di derdora dîqetbûnê û girêkên wê yên gênc, rûniştî ye, bi hevalê xwe re demê dadigre ,  dimînin bi tenê , her kes ji wan , di rêya xwe de diçe, bi awayekî cuda ji hevdû digrîn û wekî hevdû dikenin .**

**Bajarê  yê ku têde dijîn tenahî di nav de dimîne, û yên di bajêr de bi tenê ne,  li qeyseriyên qircirê de şiyar dimînin, eynî bîçim , bê guh in , bi dengekî bilind gengeşe dikin, bê ku li ser mijarekî bi xwe biaxivin, tenê gengeş e dikin, li ser aloziya rabûna nirxê mazotê û rabûna nirxên şînkayî yê ,û li ser bêkarî û bertîlî di saziyên dugelî de, û li ser kûndan li rêyan de, û pirbûna hijmara sîxoran, û nebaşiya rewşên deveran!**

**Ew mêrê bi tenê, xwarî axaftinên jinan dibe, û bîrêkirina wî ji keçeke bi tenê re tê,  ku meraqên xwe bi wê re parve bike, mîna çi jineke zelal û bedew.**

**Bi tenê dimeşin, memikên xwe derdixînin ji wan sihên yên gilêzên xwe berdidin, ji ber sedemekî pûç nakok dibin, ji bêdengiyê bêzar dibin.**

**Bi tenê ye -Bêrîtan- ew keça a dilê yê beranberê xwe dixwîne, çendîn bi ramanbûn û kêşeyên xwe yên gênc noqbûyî ye, evîna wî di wê de mabû ,mîna cinawerekî şîn di şînbûna çavên wê de konê xwe vegirtibû, keserê xwe digrî , carne, bi hêrsekî û hinek razîbûn hest dibû.**

**Perwîn tê cem wê û kêliyên ne kurt li gel wê diqedîne, wisa bêdeng û bi tenê hevalkirasên xwe ji xwe dikirin, ji dûrî ,mitrên hindik , dirazin piştî ku hevdû mist didin, berî wê kêliyekê diponijin , pişt re dirazin û xewin dikin bi siwarê xewinên xwe , ji bilî Bêrîtanê, siwarê wê berê hatiye kedîkirin ji evînekê wî biribû bi yek derbê.**

**Tenahî para kesên vî bajariye,di xwe de welatê bi tenê û gerdûna sêwî kurtas dikin.**

**Yek ji wan bi miriyên sax û saxên mirî dirame, û di gurbûna vê zorenga berdewam de, û li ferehiyên giyanên wan de , ew bavlîsok, li dor xwîna evîn û reşatiya şevê xwe hembêz dikir, dirêj û kûr bi dirêjî vê dûmahiya sipî de deryevanî dikir, û di zivistanekê kêm şans de , ku pêlavekî xwe winda kiribû, dan û standina mirovî destpê kir, li ser lingên xwe rabû ,di kêliyekê de, ku Bêrîtanê ponijîna Ciwan qut kir bi awayekî tebitî, û bi dînbûna bahozê, bi wî re axivî û go :**

**-Tiştek ne wek bêdengiya min e û ne wek qerebalixa min e ,ji bilî aramî û pistepistên te.**

**- ji ber ku hemû ji zîndanên xwe bazdayî ne, û hemî bi revê diramin, û ne yek jî bi azadiya xwe agehdar e dema ji nişkê ve bêdeng dibe.**

**- pêdiviya min bi çengên te hene ta ku ez mîna kulîlkekê di axa te de mezin bibim.**

**- pêwîstiya min bi te jî heye.**

**Wisa tilî bi geşî hejîn di hundirê hevdû de ,bi hev re dimeşiyan, gulareza sipî li wan dinêrî, xwe li nêzik wan zivîrand, bi şermiyekê wek fedîbûna birûskê ,dema destê xwe davête bilidtirîn darekî dirêj, gula sipî ji wan re bi hilmekî tîr pistepist kir, bişkojên wê bi bîrêkirina wan hat e dagritin, li wir li zeviyan de , hemî dar bîra xemgîniyê li cem wan de hene , destê xwe li ser qircir û xewinên bê dawî danîne, dema bihnên xwe dirêjî agirên yên venamrin dikin û dawiya tirsê radigihînin , bi tenê bêdengî hevseriyê bi bê re girêdide, di kêliya ramanbûna giran de, ji hêsiran tê xwarê mîna satila baranekî zivistanî.**

**Hemî gav çiryayî ne, di vê bajarê ku dulvên bêhêviya pehn dikşîne, taya xwe di nîvê kolanan de û li paş gemargehê de vedişêre, rêyên wê lingên yên fêrî bûn e li ser bazdanê mandele dikin.**

**Awaz gotûbêjên xwe ji bayê avînê re dihêlin, hespên kûrahiyên xwe ji bezeke dirêj re amade dikin, wisa Ciwan bi katan dimîne, perbendên xwe yên tevlîhev ezber dike, rewşên xwe yên belavbûyî ji pergalê odeya wî ye belavbûyî ye û hewaya wê ya tozgirtî, dilşikestinê bi sistbûn li xwe**

**dikir , bi gerandina xelekên dîlan û awazên xwe destpê dikir.**

**Li vir , di vê bajarê yê bi tenê, firoşgeh , keserên xwe yên berejor dikşînin, li paş karkerên avahiyan yên bahilkêşanên wan gîhane bircên bilind, hemî kesên bajêr , tenahiya xwe dijîn û ji nav wê qircirê,komek zarokên biçûk derdiketin, balafirên xwe yên pelgî derxistibûn û sêwirên ji avên geşiya sargerm dagirtin.**

## Mirin

**Roçûn wekî avê di nav tiliyên wê de derbas bûn, keça ya di qurzîkê de , li ber pencereyê rûniştî, di berêvarê de, bi hêdîbûneke ji xwe bawer diponijî, dema buhirtî, ji rojê wê metirsîdar dibû, bi ponijîneke xemgîn diket di avgerekê . Bi henaseya xwe ,di nav kenarên dudiliyê û deryayên pirsînê, şiyar dima, bêdengiya xwe bi zîrekî, li dor ewrên dirêjkirî , li cem çiyan de dirêsand, di binê bêhêviyê de , li ser nepeniya xemgîniya xwe de digeriya, xemxwarî nikarîbû awirên xwe yên xwarê berve jor de berda , berve wê zerbûyê , di nava kêliyekê û ya din, bîra xwebir ,wêneyên bi êş girtin, li gel her wêneyekê , dilopek hêsir jiyana xwe li ser riwê wê dabû, dilopên din dûr ji tiliyên wê ketin, û hinek jî li ser pencereyê li kêlek perdeyên gulî lêketibûn, wisa ji kûrahiyên xwe dipeyivî , bê vedeng diqêriya , li erdê de sipîbûn nema , ezman maşî, xewin peşirî , xemgînî gavên xwe bi yekbarî birêve dibir, bê li rast an li çepê xwe dizîvirî, çûna xwe berve sîngê wê berdewam dikir.**

**- Çi hatiye bi min , çima ewqas êş , çima tu guhê xwe nadî min xwedayê min ?!!**

**Hêdî hêdî pistepist kir û ahîn berda, di kêliyekê de bi giriyê hest kir, rabû li ser nivîna xwe û li ser wê de ,wek zarokekê xew dikir, balgiya xwe hembêz kir, û li ser ya din serê xwe danî , girî ji bo wê rabû li ser piyan, xemgînî hewl dabû ku bi xuşîna xwe bê rawestan berdewam bike, û di kateke din û zû de, ji sibehê , nelivî, tiliyên wê yên nerm nelivîn, feleka reş wê hêla, sipîbûn ji berbangê bidest xwe nexistibû , mir bê ku yarê wê ji dilê wê bigere, ew dilê westiyayî wek wan rêyên dirêj û şil , û ev tîrêja ku kîna roçûnê ji çavên xwe derdixist.**

## Narînbendên Kurdistanî

**Di te de riwê jiyanê ye, zaroktî û pakiya wê ye , kovana wê di eniya dilan de, xweşiya peyketinê li pey xewinê ye .**

**Asîmanekî tu ji şahiya xweş re , pistepistên baranê yî li ser pişta keskesorê , tu mîna dara Berûyê yî li ser bilindiyeke helemût .**

**Di nîgaşa xwe de ez te datînim, te di xwe de amade dikim,bi te bi yek dibim, mîna pênosa lêvan; li ser lêvên te diçim.**

**Hêdî hêdî oxiriyê ji min bixwaze, ji darên hestên xwe pel bigre wek helbestên yên nayên jinavbirin, di te de giyanê serxweşan e, bi tovên gularezê yên min li ser sîngê te danîbûn tenik bibe.**

**Mirin nêziktirîn bendewar e , ji her kesî bêhitr dixwaze laşên me yên hatîxwarin di destên xwe de bihêre, ev pozbilindiya çendîn wêran e, ew demdemanî çima deziyên xwe yên puç li pêş rastiya me de dirêsîne, berve rewrewkê koç dikin, hûrik in ji turên êrd in em , derzê ji qelşandina banî ne, şopên lingên kurmikan in dema ji gewriyên nepirûşekên kulêreyê diderizin , ji vê felekê me tiştekî wernegirt , ji bilî binkeftinê .**

**Ev dil kêrên valahiyê di wî de derbas bûn, û xwezî kiribû ku hinekî ji mestbûna evîndaran heta mirinê bi wî keve ,û ew di zîndanên nalînê de bimîne , ta ku êrîşê**

**berde li ser evîna yekbar û têr bi rawestgehên evîniyê birame.**

**Min bi evînê kevir bike , ta ez ji hundirê xwe piştrast bim, ez di te de niştecî me , û bi avên hestên te  dagirtî me, de wan berde min , belkî girnijîna min vegere, êdî ez xwe nabînim, hembêzkirina dilşewatiyê, min serxweş dike, di te de dihêle tiliyên min bilerize, mîna peyalên şevbêriya kurt, weke ku vegera dengê te hîşt vedeng vekişiyayî binale, wek ku derya ji girnijîna me teng bû, û rabû, ta gemiyan daqurtîne.**

**Ez mîna balindeya leglegê me, bi quncikê berêvarê diramim, , bi xemgîniyê, kevinbûyî dibim, ji şadiyê hêdîka vedikşim, ta ku bighim naveroka xemgîniya te, ezê  ji bîrêkirinê bikim fîxan, bang li dîdara me yê nêzik û dûr bikim, hingî ez xwe bi leylana te  digerînim xwînçûyîn dibim, mîna bişkoja xunavbûyî xwe ditewînim, ta ku tîrêja te pêşwaz bikim.**

**Ez ji girnijîna te me , eger tîrêj da ,ez jî tîrêj didim, û eger çû ava jî , ez diçim ava , ji te re ne titşê ku min hîn nenivîsandin e, ji te re wêrekiya sîper dema hewil dide ku bigihe bilindiyê , li ser laşê te mezintirîn kom ava dibe, ji hemî xwedawendan re, û di nav wan de xwedayê nêr matmayî li pêş dînbûna te radiweste, di dilê  te de darên sêdarkirinê têne sazkirin, ji zordarên yên fêrî serjêkirina evîndaran bûn e , em yekem dundeyên rikeberiyê ne, û vexwenderê serdema ronahiyê ne, di feleka tariyê de, tu yê xwe li ser gewdeyê min de mîna dêhleşêreke mest  xwe çemîn dikî.**

**Zuhabûna dûratiyê bi meya peyvên pir belav dikî , bihndanên xwe ji min ve nêzik dikî, mîna şanikan li dûr nêfkê te ez belav dibim , min dihêlin ku ez ji dilpijokiyê û nalînê gêj bibim, tu strana ya bi baranê re dikeve pêşbazî.**

**Bi hev re emê pêta siberojê gur bikin perestoya min, û ji bilî lihevpirsînê tiştekî namîne, ku rûtbûnên bêdengiya mayî di amanên germahiyê de rûşan bike, tevî şelûya sarbûnê û jihevketina nîgaşê ji pozbilindiya dûriyê, di navbera metirsî û beraxaftinê , di te de welat xewina hemî kesên mirî û yên jiyan kirin e û yên kê jidayik bibin.**

**Ez te bi hemî pergalên şeydabûnê dibînim, mêya min, li gel te têrhatî di her tiştekî zuha de stranên me lêdide, xaçên me radike, lê evîna me ji wêraniyê re kovanên avabûnê vedigerîne, cîhan xirbeyê xwe li ser eniya gengazan de dibarîne, û em jî hevdû bi pirûşkên maçên xewindar hembêz dikin, baran , şiyarbûn û çirûska keskesorê me serpê dikin, cîhaneke nû û gerdûnekî kesk em radighînin, dûriyên bê dawî em nîgar dikin, buxçeyên nalînan em dihejînin.**

**Ji te hez dikim ey bavlîsoka mirina min , tenaziya xwe bi nûjînbûnê dikim , dema memikên te bin lêvên min raperînê dikin, alên şahiyê radibin, beranberî reşatiya**

**alên xemgîniyan , tevî domanê ez te dibînim , demsalek pêwendî û ewlehî , min vegerîne xwe ey asîman, dilê min li ser mana te bi cih bûye ,giyanê min li ser cihêbûya keserên te dima, ev xemgînî ji her deverên kûr têne me, de memikên xwe gilover bike, bihêle ez neyartiyê bi xweda re ,di çavên te de bikim, ez vê rêbazê têk bidim ,gurmiya**

**şeytên bi dest xwe xim,wek mehnegirtinekê ji xwedayekî nayê dîtin, kesê dixwaze dikuje , û kesê dixwaze azar dike , min bihêle ku ez erza wî bidim, dema ez lêvên te ji bo maçekê qayilkirin bidim, min bihêle ku ez wan jibîrbûyî bikim , dema bin te de dilerzim , an di lêvên te de bi maçekê nediyar dibim , ey xwedawendê , bê wateye canvehatin bê evîna te , li gel avşînên dûr avbaziyê dike, ji gergeroka deryayê re şahiyan diafirîne.**

**Ez bi xapên rewanbêjiyê ne pîşeger im, ji ber ku maçên min ji lêvên te re ,kurtasiyeke bese ji dirûva hembêzkirina erd ji ezmên re , pêdiviya min bi çavên te hene ,bi rêya wan ez xwe ji xemgîniyan vedişêrim, pêdiviya min bi bêdengiyeke ku di nav lêvên xwe de xweştirîn axaftin vedişêre, evîna min ji felekek ta felekekê veguhêzîne , di sîngê te yê dagirtî de buhiştên evînê ez bihindan dikim , arezûyê sirûd dikim.**

**Ez ji hezar gularezên sipî re distirim, deverên minî tu , ba , ax , û beybûnî .**

**Dilê te ew rê, rizgarî û nîşan e, pêdiviya min bi te heye mîna çemekê li rex qebqeba çepelan de.**

**Dem bang li te dike, wek ku dengê dilê min vedenga guhmasiyeke deryayî be, navê te bang dike,û tu li berxew bî jibîr neke ku ez nakevim xewê, eger nêzik hinarikê te nebim, li ba te ewlehî dibe ewr .**

**Tu êşa li paş xêzanî, li ser dengê gavên te xemgînî û şahî saz dibin, awazekê dirêsînin, sirûda jiyanê desdan dikin, li gel te wate destpê dike, mîna şîrekî ji guhanê gotinan**

**derdikeve, li gel te gerdûna kal dibe şînkayîyeke pêlbûyî, ew gunehên kirêt , hindek talanbûn in , xwe di hişên lawaz de bi cih dikin , bi felsefa evînê a taybet bi me, xwe bi çek û rext bike,   henaseya xwe bide ronahiyê, xwe bi baranên kobanî bişo, ji fişafişa tirsê yê mirov dighîne bîra kûndîtiyê netirse.**

**Em felekekê diafirînin , têde avşîn li ser piştê çiyan de ,di bilindiyê kûrahiyên me de ,  avjeniyê dike ,  xwe pepûk neke, narvîna me ye  ku em girnijên xwedawendê bidest xwe xînin, em wê ji mirina wê ya dubarebûyî rizgar bikin, li gel te elfebayan dinalin, mîna ewrekî yaqûtên barana şîn xwedî dike,  ez di memikên te de, ewrên ezmên dimêtim, li ser lutkeyên te yên bilind  siwar dibim, mirinê di nav çongên te de kedî dikim, ta ku were jêbirin, tu nûjînbûna benderên nemiriyê  bi pêçengên xwe digrî, bi werîsên rehniyê yên ji sermemikên te derdikevin xwe digrim,zaroktiya evîndarên destpêkê vedigerînim, di dojeha maçan de ez hêsirên Gelgamişê tevdidim, di çavên te de mêyatiya avê desthejan dikim, zuhabûn û cefayê azardayî dikim,**

**tunebûnê xwerî dikim, tu şengî mîna çema evîneke bi bêdengiyê pendyaran derbas dibe, welatî tu ji germahî , xunav û kulîlka baxbûyî  re,di şevbuhêrkên maçan de, ji te re nalîna min , ji memikên te re xweşiya min e nemir, mîna mafekî namire, tu kovana dilpijînê  yî di asta beraxaftinê , pira ya rastiyê û rewrewkê, hevdîtin û azariyê ji hevdû vediqetîne.**

**De hingivê lêvên xwe di peyalê memikên xwe de berde, min bihêle bi dînîtî ez mest bibim, de rehnên xwe ji min re mîna**

**Dicle û Feratê veke , ez bi serxweşiyê wek xwedayek û jiyanekê , û bi lerzandinê wek çîrokên rojbûn û bercandanê bawer im , ez bi te wek xwedawendekî me, ji hemî kesên yên tên , henaseyên xwe berve welêt rakirin e, û li ser bedewbûnê,ref dû ref, sivik û giran hildikşin.**

**Ji te re ne ew maçên yên li ber hilpekandinên memikên te,dema berdana derengmayî têne gupkirin, ji te re ew kêliya a jiyanê kurtas dike.**

**Em bi êşê pêş dikevin, mişextiyên xwe ji lehiya hêzê hembêz dikin, ji tiştê em li ser fêrbûna xwe têde dişiqitînin, ta ku xulekên jiyana vala ji me baz bidin, bê qêrînekê ji ezmên re bibêje li ser dilxwastinê me bi berzkirin û belavbûnê di dêmên ewrên sipî de, dûrî derbasgehên azariyê.**

**Ez bi xwe re diaxivim bi te re, û te dikim paytexta gorandinê ji her baskekî mêrkuj, bi kunêlên çermê te ,**

**ez bi yek dibim, ronahiyê di hundirê xwe de dihêlim, girnijîna xwe li pêş te de venaşêrim, bangên evînê veneşêre, têde xwedawendî û serwerî û pozbilindî berve asoyên dûr e.**

**Em tune nabin, bi evînê biçûk dibin, emê mîna du hevrişman li ser pela dehla kesk û tarî de bixuşin, ta em bibin bi qasî dilopek xunav, di sibehên avdarê .**

**Li vir , li ser kendalên evîna te yê bala de, ez bi xwe re dipeyivim, di lêvên te de hejandina meyê di nava peyalan de, û axaftina kutanvaniyê ye .**

**Ji memikên te re sirûda qazan e, dema bi baskên xwe golê sîle dikin û zikêşa laleyê diarînin .**

**Tu cewhera seravbûyî bi serxweşî û bi sirûda elendê cîtengbûye, di te de ez avjeniyê dikim, di perjengên sipîbûnê de û belavbûna demsalan , ez temenekî bihin dikim,li ser kevîkê niqombûnê bi te re derbas dikim, li ber çavên bahozên evînê hawarxwastina te dikim, tu ew taya işkî , semaya reşmarê yî di damarê zuha de, hêsira qerenfîlê yî di destpêka buharê de, sirûda keskayiya zelalî, min vegerîne zayînê li dema ez bûm e, wisa emê bighin lutkeya şeydabûnê bi tiştê pak yê me rahijtê, dema em bi ala evînê digrin û dihêlin di ezmanê pakiyê de berba bibe , bi hebûnê em bawer in , giyanê comerdiyê em didin e bîrêkirinê, ji laşê te hilma daristanên yên dihejin werdigrim, bi derperîna agir di giyanê min de û di lutkeya dînbûnê de ez bi narîna evîna te xwe dişom, heta tunebûn bimre, ji te re ne lavayên maçên min yên agir li dor wan de her êvarê xwe dipêçe.**

**Tu yî ya ez bi sivikî tême cem wê, di katê zêdebûna bîrêkirina tîr, gav xwar dibin, evîna zêdetir şiyar dibe, dema tu hilat dibî, giyanê min di rehjenê xêzan de derbas dibe, wek sirûdên evînê , xwe ji dengên êşan re natewînin.**

**Ji nişkê ve, di raperînên xwe de ez felekê dibizînim, li pey te dibezim, wek gokên êgir bi evînê heta dawiyê têm birajtin, ez ziyana kelandinê di xwelîdankê tunebûnê de jibîr dikim.**

**Bi rêya te ez strihên salên xwe yên vala hildikşînim ,em herdû li gel ferehiya asîmanê niqom dibin, nêzik hevdû dibin, bi tijebûna şahiya xwe em dibin keziyên keskesorê û**

**difirin, hevdîtina me ji nemiriyê nêzik dibe, em dikin awaz, lava dikin, tunebûnê dikujin, sînorekî em di navbera wî û dilên xwe de saz dikin, xemgîniya xwe xelatî wî dikin, em xwe ji yaseyên wî rût dikin, hevdû em hembêz dikin, bi cêwîbûnê em binyad dibin, di kêliyên maçan de em dengê xwe yê ketî distînin.**

**Rêyên min revînê ji gavên min radighînin, li ser rexên dûr paşguhkirî dinalin, rêyên min bi min derbas dibin, sirûda rêwî di jiyana min de didizin, dilerzin dema ji dûr ve gavên min silav dikin, bîçimên min bi tenê xwe rûdinin , hatina te distrînin, banga rohilatina te dikin, xwe amade dikin bê ku guhê xwe bidin dengê payîza xwîntirş, bi te re û bê te tunebûn dibe mîvanê katên yekem ji sibehê, wek ku zayîn bê te tenê avrazek be, dikeve ji mirinê di mirinê , bi aramiya hespên girêdayî di hevşiyê de , wek amadebûnekî ji rêwîbûneke dîn û nepenî re û li ser piştên kutanvaniya dîn ,awirekî didim çavên te, di sipîbûna memikên te de tazîbûna berfan li ser çiyayên olûmpê radimûsim, li ser deştên gewdeya te xemgîniyên Torûsê bihin dikim, awaza seqemê yê bi dengên bê di lutkeya Êvrêstê de bi hev digere, bagerên yên evîna me hildigrin ji bajarek ta bajarekî vediguhêzînin.**

**Kobanî mîna stûnekî li ser volkanên evîna me rep dibe, ji wêraniyê xwe çêdike, me dinivîse ,ta me di nav sozdayan de nemir bike, ji awazên maçên me re xwe stûxwar dike, bi anûvaniyê dişewite, bi laveyê gur dibe, raperîn dike ta ronahiyê ji dawên keserê derxîne, di te de ez mêrga şeydabûnê derbas dikim, wek stûnên rehniyê li daristanên dûr de rêzî hevdû dibin, li paş wê şaxên temenê dûr**

**dilerzin, têde benderên tilêliyan vêdikevin , bi rondikên yên dixwazin xwe ji girnijînên şadiyê re noq bikin.**

**Di te de xewinên xweşiya kor berz dibin, li ber çavên evîna me ya zelal de, deryayên sirûdê û xemgîniyên gewdeyê gêj dibin, li ser lutkeya sîngê te de,ez wekî hespekî bi bask xuya dikim, û li geliyê lêvên te de ez welatek im, ji gerdûnê re li ser evîndarên xwe lihevpirsînê dike, ey pêla şewatan, ji ku ronî tê , hemî sinc girtîne, hemî rê bîçimên wan zengarî ne, evîna te ya hov li ser dilê min de deqekî Mîdî dikute, û li ser eniya min de xemên kurdistanê diniqişîne.**

**Ez xwe nabînim ji bilî baranekî li ser sekûya şewatan de, hindî perdê awazê di min de diheje, ez xwe dibînim, direvem cem te , û ez daholên bîrêkirinê li paş te lêdidim, ji bilî fîncana qehweya min e sar tiştek bi hawara min were nîne.**

**şahjina min , ji te re ye serxweşiyê , tu zikmak û çavkaniyî , pakiya dundeya şahjiniyê yî, serkeftinên me li ser nivîna çolan de, ji me re bejinên sosina geş diyar dikin, bihna zeyzefûnê ji memikên te min gur dikin.**

**Tu li ser laşê min de mîna dilfîneke kedî xwe noq dikî ,tu efsanan di min de bê westan binav dikî , rawestandin li ser textê şaşbûna lawaz de nevêtî dikî, bi her zerbûnê zorengê dikî, ev reftara te ye bi min re, di şevên avdara lehengî de derbas dibî, ey pêta pêldayî di xwîna min de, de lêvên xwe bide min û di xweşiya min e pendiyar de mest bibe, em ji bo ku bighin kutanvaniya cîhana bala xwe dikujin, vaye em li pêş dîrokê ne, şûrên meraqê,**

**dilpijokiyê û arezûyê ji sirûştê re dikşînin, berî jîndarên mirovî diyar bibin, pişt re dibin hogirên me, vaye em tazî ne ji derew û durûtiyê ,ji mirinê hemî, û dojeh ji cankêşiyê dibe kef li ser dengê ganê me ya berzbûyî, wek lingê zarokekî di nav tehtan.**

**Li te rehjen vedigerin tevî ku li gel leylana derewîn de neman dibin, li ber dergehên te de karwanên arezûyê herdem rêzî hevdû dibin, de destê xwe bide min , ew bi sêwîbûna min hest dike, û bi germahiyê dadigre,di kata ku artêşên seqema mirovî êrîşê me dikin, ji bilî te jin mîna orispiyan in, xwe li ber lerzên derewîn de digerînin.**

**Te berdidim zimanekî serhişk, di te de serkêşiya xwe dijîm, ta ku ez bawer bibim ku jiyan ewa afirandina êgir e, û xwe xistina şûnê roniyê ye di rêyên tariyê.**

**Tu ew çiyaya ku di min de cîgîrbûye , û bê te felek bêzarî , pepûkî û wêraniye, de lêvên xwe bide min , ta ku pê şîndariya çeman û şînbûna deryayan bixemilînim, tu agirê êgirî, ez ji dola nifirê me , yê xwe li ser gîhaya nemiriyê de da rûniştin, bi devê marekî, ku hate li ser nemiriyê ta wî tarûmar bike, di wê demê ji nişkê ve Gelgamiş bi hêsirekî tazî li kêlek solafa nalînê rawestiya.**

**Lêborîna te xwedawenda min , em gunehkar in ji kevinê kevin de, û hilpekiyên jîndaran in , dema qerezan bi tunebûnê re dikşînin û vala pê dileyzin.**

**Dilovaniya te perestiya min , ez li ber keserên girnijîna te ya dilşikestî de bê rewş im, di te de ez şerê kirêtiya a di**

**dilxwastinê de heyî dikim,di evîna te de  xwedawenda min laveyên xwe ez distirînim , belkî sipîbûna min e gêj berz bibe, di rehjenên ku ji bilî te tiştekî hizir nakin, cîteng nabin ji bilî  ji dengên gavên te.**

**Ew hêsir ji ber çi damarên êşê derbas dikin?!**

**ew eynik çima li ber dîtinên bîçimên me de dişkin??**

**Ji arezûya min re wateyekî nepeniye, ji derveyî şîrovekirina tunebûnê û hejandinên cankêşiyê,  gunehiya min e ku ez li ser leylana te dijîm, ta bighêjim naveroka dîtinan, bi gurzên yasmînê û hêza şoreşgeran ez dagirtî me, û daxwaza min ku di te de bighim kulîna rokê, di quncê yê kirêtiyê bi birûskê lêdide, di axaftina bi evîna te re xwe bi cih dikim, derdê dijwariyên azaran dikşînim, dûrî bilêvkirinên neqişînê û xefkên wê , ez dibêjim: tu xweşiya ne asayî yî ji gotinên puç re,û evîna vala  ji bezên rewanbêjiyê yî û kulîstrola şengiyê,  dilpijîna dilxwastinê dertîne, û penaberî tirsê peyda dike, û her wisa li ber çavên barandinê, di nimêja bîrêkirinê de ez diramim, rêyên zerbûyî dihêlim, xweşiyê kevir nakim, ta ku dapîrên te yên sihirbaz li min razî bibin, bi sihik e ew pêkvenûsan , tariye ew cihêbûn,ji bilî xirbeyên hêsirên te yên payîzî tiştekî guhdar nakim, li ser milên rêyan de , ez kefa toza genî dûr dikim, ji aramiya xwe ez  pendê xwe digrim, û ji kokên evîna xwe ez sîndîganekê distînim.**

**Ew xwezî  roçûn in , zerbûyî ne û virmor in, xwe li tirênên pêxwas de bi cih kirin e , aliyên xwe natewînin ji şorbûna hêsirên me yên zengarî, ji pirsên te re deziyên puç in, pepkûkiyê tînin, û bizdana beraxaftina bêhêvî  ne ,  ji**

**wendabûnê re stonên dil in, ji cîhanên min re ew çirûsîn e , jê re nifira şînbûnê ye, di nîvê girîneke ne berçav , ew evîna kelî min li ser lêvên te kuştî hîşt, wek payizeke nerm, û ew min ji derveyî sînorên axdariyê çekir, bi serserîtiya dengên germ , bi nermbûna kaniyekî tebitî , di nav hurgiliyên rêyan.**

**Tu nihêniyek û xweziyekî , babeliskekî di nav kûrahiyê de, zaroktiya rûkeniya te ya pêxwas , gemiyên çekirî di deryayekê de derbas dikin, û tîpên te yaseya reş binpê dikin, di depên mirinê de, di nav lêbêjên nepeniyê , ez derbas dibim, xewninên xwe yên yekem dişopînim, berve asoya kûr ez diçim, pistepistên min ji xemgîniyê diterpilin, di nav darên çandî de û li jor beyarên pîzotê, ma gelo wê piştî temarekê vejîn bibin!!?**
**ma gelo wê şahiya nediyar vegerînin?!!**

**Ji serdemên nalînan , ez li ewlehî û aramiyê digerem, di nav peyvan de ez jibîrbûyî me, xwe di nav domanê de dibînim ,tozên ropelan derbas dikim, eynika min e zigurd bang dike, û bêdengiyê di dilê min de vedigerîne, di çolên xemgîniya xwe de diterpilin, ez li pênosa xwe ya şîn digerim, li pey şopê zivistana xwe dikevim.**

**Natebitim qet , sax nabim, ji henaseberdanên te wek sermayekî ez derdikevim, mîna rondikên zuha, di hundirê sobeyeke zerbûyî .**

**Ey rengê bê ,di kûrahiyên min de, de lêvên xwe bide min ez wan xaç bikim, di aigrê arezûyê xwe de wan bisojînim, pêdiviyê min bi dînbûna te heye, min bibe, çixata berfê ji min re vêxîne, bi navê te ez beraxaftin dibim, li ser xewinên**

**xwe dinivîsim, û jibîr dikim , çendîn veşartin giranbû, berî tu hilat bibî , tu bê sînorî ,di roderkirina min de, û kefa sipiyî di çavên min de, de were, mêya min em di perestgeha xemgînyekê de bi tenê xwe nimêjê bikin, me bi yek dikir, û dilên me pêçandibû , li gel te jiyan demsalên nemiriyê ne û bê te agir û argon in , piştî te ti şahî venagere !**

**Dema ez dikevim hundirê ewr de, gewdeya te dinêrim, di evînê de li ser piştên çiyayan de bi hev digere, matmayîbûna dîmenê dipêçînim, wek zarokekî li bilindî dareke hevrês dinêre, xwe di her awirekî ji te xwe vedişêrim, dema tu hêdîka li min dimeyzînî , ji te hemî keriyên xunavê derketin, li ser girên gulên sor de, diçêriyan, evîn bi te girs dibû ta gihîşte asîmanan, ev payîza bê te ji xwe çûktir e, nîşanek ji gavên te , dema li pêş min tên, têr dike ku girnijîn bibe, û zerbûna pelên daran bike şînkayî.**

**Metirsiyên payîzê te bi rêve dibin , li cem mirina te ya bilmez de, û têgihiştina te nikare êrîşê dengê tirsê bike,**

**ji ber tu bi tiştê di navbera me de , ji demên hêsir û şevên zuhabûnê kufir dibûyî .**

**Ev fêrbûna te ye ,ey dîlê ,li cem perestgeha koçberiyê , tu qet perwerdekirina reftarên jêbirînê di xurtaniya li hev hatinê bernadî, ez şerkerê yê di hembêzê jiyanê de, ji fîxandina hêviya azad,di te de ez newestîm.**

**De armaiya xwe hilkişîne, û ji reşatiyan koç bike.**

**Li rêyan de mîna mêşa hingiva zêrîn bimeşe, qirikên kulîlkên bejî bi maçkirin , arezû û tîbûnê bade, de bi lêvên xwe di lêvên min de, hingiva payîza dilpijîn birjîne, û hew êdî bilorîne.**

**Rabe li gel xewinên me yên yekem, wan bêne wek hevsengî û bergirî di riwê cebilxaneya ragirtin û evdaliyê, di gorên gazindê de, qêrîna xemgîniyê di kûrahiyên xwe de vemrîne , di min de yara min êşa moriya sor e dema li ser qûma germ hildikşe, û di min de xemgîniya isota sor û tûj e , û di min de eger tu felsefeya yekîtiyê di kûrahiyan de hizir bikî ,welatekî di nav xwe de dikele, ew jî kurdistan e.**

**tu nediyarî ji henaseya xwe ya destpêkê , di wê demê tu xuşka laneyê bûyî, keça bêçariyê, neviya bilidiyan bûyî , dema sîper ji bilî xwe kesî nexwestibû.**

**Ez ew yarê hatî me ji gerestêrkekê di nav de, tev qurşîn û zordariye, bi rêya te ez ji rêzên kifikê rizgar dibûm, û ji mirina xwe ez veqetiyam, dema ez bûm e bêçareyek .**

**Em avşînan li ser milên dilên xwe de hildigrin , belavbûnên çiyayan di ferehiyên giyanên xwe de kome li ser hev dikin, û girnijînên zarokan li ser piştê dil de ezber dikin, evîna bilbilan bi derketinê ji rekehên xwe efyûnkêş dikin,ji bilî evînê em tiştekî rast nabînin, di navberê revên rewrewkên nêrumêk.**

**De dilê xwe yê giran bide min , ezê wê mîna kûza gazê li kêlek dilê xwe hilgrim, were em berfên avşînan maç bikin, bi ramûsanên me , wê rojbûnek jê re bê nivîsandin,wê ji me re li warên evînê de nasnameya du evîndaran çêbibe,piştî**

**wê emê netirsin, ji kê bitirsin, ji narvînekî serxweş û arode, ji lehiyên afirandinên me zikmakiya xwe wergirtibû, ta ku pê bênaviyên xwe veşêre!!!!?**

**Di min de te lehiya evîna har di giyanê mij de xepart, ji dîtina payîza kedî tu dilerzî, ji xemxwariyê tu vegeşbîn dibî , li paş seqemeke lawaz bi celbê laveyên me pirpitîbûyî, û em li ser germahiyê êrîş dikin ,bi helkolkên xweşiya xwe tu bi serserîtiya di şevên şeydabûna demkêş de kêfxweş dibî, bi mestbûnê tu çûxlikirî dibî , di nîvê dêmên derbasbûyan de, ên guh nedan e maçên me yên sêgoşeyî, ev dil biçûk e li ser**
**dînbûnê , xerabûyî ye mîna lawaziyê di katên nîgaşbûnê de li paş dûriyê.**

**Ez derdê koçberiya te ji cîhana xwe dikşînim, derdê gurbûna te mîna êgir , di devê çekekî zengarî dikşînim, li vir bêzariya te û ufkufiya te , deshilatibûna te , destpêvegirtiyê te ,peşûşbûna te , hemî xelekên nû ji tunebûnê zêde dibin, xwe li dûr qirikên hevdîtinên nehatine jidayikbûn dipêçin, agehdar be ji matmayîbûn û xwîntirşiyê û evdaliya bêhiş ,di perestgeha min de, de tirsa xwe kevir bike li pey min were , were li aliyê qubleya min , ew nimêj û tiwaf û çûna li şikefta pîroz e.**

**Ew bîrêkirin balafira giyanê ye, de rabe pêş bikeve, û xwe netewîne wek bizinê dema kîsên lastîkî dicû li ser kevîkên geravê.**

**Xweş bibe wek xewinê , ew armanc û hevdîtin û bîrêkirin e piştî pevçûnê.**

**Min di nav rehnên xwe yên germ de hembêz bike, mîna şevên cejinê û ferehiyekê bide min ji zaroktiyeke ku min nejiyabû , û sersertiyekê ku min jiyan nekirbû, nerm be bi evînê , çendîn ew bi hêz e , dirêj  û girs e, lêbelê birîndar e ji dijwariya zordariyê.**

**Strana xwe xelatî min bike , di katên şeva dawî de, zinadên me hevdû xwarin , lêvên me ji maçan şewq dan e, gewdeya te di tariyê de mîna şûrekî dibriqe, ez te**

**dixwînim, evdalî û hilm û di te de kefa xwe , dilpijîn xwe û dînbûnê di malzarokê te de diçînim, de were min bi barana lêvên xwe û giyanê binuxumîne,ji ber ku ez çiyakî rût im û lutkeyek e bi mijê  mişt im , şiyar be ji bilindiyekê te nagihîne min, agehdar be ji xwe ,ji ber carne  tu ne wek xwe yî.**

**Jiyan tê rêvebirin bi evîna zordar, wek evîna me yê ya giroveriya heyvê distîne, di dilê min de êşa bilûrê ye, dema zikê xwe digvuşe wek  ku di sanceke giran de be, di dilê min de bîbelank diweşin, wek hêsiran û dîmenê wek girnijînan nîgar dikin,di min de êşa avê ye dema berve germiyê derbas dibin, û êşa solafê ye , dema ji bilindiyan dikeve, serserîtiya kûrahiya bilmez min çedikin, ji jiyanê tiştekî fêr nebûn e, ji bilî zanista puçbûnê û wêjeya gotinên vala, li pergalekî ji germbûnê digerim, hîn jidayik nebûye, di cakêtin pembûyî û ji bahozên ku nikaribûn sextebûna şîndariyê hilkişînin, ji bîçimên ku nazdariya erdê radikirin û pirs dikirin çi rê heye ku mirov xwedê bixapîne.**

**Wax çendîn êşên min  kûr in, dema kovanan erzan dibînin , dema mîx diçînin li çaxê xaçkirinê.**

**Wax çendîn nalîn giran e , dema hêlana min bû û çenteya min bû, û ev keça ciwan yê şanên tengezaryê xelatî min kiribû, û bar kir.**

**Wax ji nalîna te çendîn wek mirinê ye û ez  jê têr bûme , ew sîndigana çendîn zorê li ser bê dike dema dînbûnê ,**
**bibe mînakekî li ser pêdara sindîganê dema dîdariya şahiyê dike.**

**Em fêrî xemgîniya erd û çiyan dibûn  , û derzandina binê lingan, dema diçin lutkeyan .**

**Xwe amade bike ji  maçkirina min re , roçûyî ye ew şahî wêranbûyî ye wek qûma germahiyê di katên nîvrûyê a yekem.**

**Gewdeya te sehneya zorengên rojhilatî ne, metirsiya hovîtiyê li cem birçiyan e, ew bayê sir e yê windabûnê dikuje ji damarê.**

**Nazik bibe mîna gulê piştî bihinkirinê û bi xweşiyê bibe bax, dema hembêzkirinê, me  xemgîniyê sêdar kiribû û keserberdanê gurand, ez bê te tenê depek cam im, mirin û jiyanê ji derveyî te zîndanekî bi girtiyan tijebûye, ji te re tiliîliyên zaroktiya xweda di nivîna jîndaran de , ji te re maçên xwîna min dema li ser girên memikên te gur dibin ta çavên tariyê derxînin, ey hêrsa şeydabûnê ,ji te re hewayên giyanê min yê bi bîrêkirinê lihevhatî dibin, ji mêrga giyanê te ye, yê  çîrokên  te kurtas dikin.**

**Xwedawenda min, ey balindeya quntaran, di bîra min de tu bûyî bahoz, tu çîroka evîna min e xwînçûyî yî, zelalî tu mîna ava Feratê, ji lêvên te re tîbûna min e kurdistaniye, ji azadî û qêrînan re xwe ditewîne, evîna te ji min re bajarê min e , encama pozbilindiya wê ye, û zîrekbûna zarokên wê ye , xwe ji xwelîdankê mirinê re nahêle, xwe ji nezaniya hovan diparêze.**

**Ji te hez dikim, xwedawenda min , di serdema bêmêriya pêxemberan, di te de efsanên evîndaran kurtas dibin, di te de lehengiyên nalînê ji pakrewaniyê, ji dema tazîbûnê de tacandin dibin, di te de serkeftina Kobanî tê nirxandin, ne quretiya Isparta.**

**Ji pistepistê te re qêrîn xwe mîna Xandî xûz dike, û hildikşe çiyan bi pergalê Gîvara, û pabendî narvîna Sêzîf dibe ,bi hilgirtina hîmên bîrêkirina min ji te re.**

**Eger ez hizrekî navînbama , wê te ez sirûdeke bi qircir bixwestama , tenaziya xwe bi vedengê xemê dike.**

**Eger ez ew girnijîna derbasbûyîbama, wê min karîba dûr, li paş çermên mirinê bi te tevderbasbûbûma.**

## Newaza dudiliyê

**Dema bihar pirsî , li ser piniya guhdana evîndaran bi hatina wê, biryar dabû ku bibe ramankar û hozanyarek, mirovan bi giştî û evîndar bi taybt , bibûn cihê ramana wê, û pêşî kar kir , li ser arandina şemalên xwe di dêmê keçikan de, ta bi mêyatiya xwe hest bibin, û dema li ser ramana xwe xebitî, rûda ku evîndar bi hevdîtinê ligel hezkiriyên xwe, pêş wê destpêkirin, hate bîra wê ew şahiya a bi êgir de têkel bûye, wisa bû yekem hilkeftin , buhar têde yek ji mehê xwe yî bedew , û ewa meha Adarê , soza evîniyê ji hemî gul, çûk û şeydayan re li pêş sirûştê , li ser girên serbilind de da, belkî we pirsî , li ser piniya şengiya buharê , bêguman we bi afirandina vê demsalê hest kir, û sergulbûna wê di gerdekê jiyanê de.**

**Bi stranê xwe yê xemgîn diponijim, ji telefona min derdikeve, û bi rêya dilê min derbas dibe guhê min, bi rêya bergeha zirav, stran tayê par hildigre, eger ew par vegere , wê em jê kîndar bibana, wek ku – Hitler – anîbû ziman.**

**Ez çav li her gavekî dikim, dibe ez têde kêfxweş bibim, ew buhar; jîndara bîrêkirina yekem e, û rêzana xweşiya biyan e, û helbesteke bi nûbûnê xemiliye, bi qelewiyê noqkirî ye.**

**Em xwe di paş ponijiyê de vedişêrin, di çarçoveyê rojbendeke girover de, me bi xwe re dibe, li hewşa destpêka balkêş de, bi rêya stranên matkirî , bi piniyê em wê jiyan dikin, pêş vaca yê xelekên hişên me wê bi rêve dibin, bi awayekî wek ku hertimî be.**

**Ma tu dizanî çendîn awazên te di me de , teze û hertimî ne?!**

**Nivîs û xemxwarî du hevmalên hev in,û evîn û heznekirî du dijmin in di henaseyê mirov de, ji ber ku bi ezperestiyê ve girêdayî ne.**

**Cîhana girover bi talîzokên xwe , me dorpêç dike, metirsiyan komel dike, di me de vêdixîne.**

**Gerdûn bi qêrînên me, xwe bi cih kirî ye, ji bangên me derdikeve, cîhana ku em têde ne teng e mîna rehnikên çavên nezan, lêbelê çavên xewinkar yên zana , bi bedewbûna gerdûnê û ferehiya wê bawer in.**

**Ta em li ser rêya azadiyê bimeşin, emê timî bindestê bayê mişextî û parçekirinê bin, Pozbilindî kevok dihêle , ku ezmên bi ava qebqeb û dilxwaziyê tije bike.**

## Qêrîn

**Ji yara xwe re got û ew digrî:**

**- Ezê çawa evîna xwe ji te re derbirîn bikim , di demekê ku derbirîn têde tengav bûn , û hest û xewin têde kêmbûn .**

**Ezê çawa te li kolanê pêş çavên xelkê hembêz bikim, di cîhaneke têde metirsî û gazind têne gerandin.**

**Û ma pê re diaxivî, li ezmên dinêrî, pala xwe da darekî hişk û got: ez kê hema mîna berga xweragir li ser bilindiyên xem û nexweşiyan de bihelim.**

**Di wê kêlîkê de hest kir ku pelên darên hişk bi ser porê wî û wê de dihatin e xwarê , û berdewam dikir bi beraxaftinê :**

**- Ezê hema mîna pelên payîzê biwerim, li ser derbasgeh û cadeyên cîteng de, û kî wê te bîne bîra min ,ji bilî bermayên baranê û tiştê ji buharê re mayî ji bedewbûnê ?!!**

**Û dema stranekî ji dûr ve bihîstibû, bang kir di riwê yara xwe de , ya bi giriyê destpê kiribû û go :**

**- Êdî stranên xemgîn nema ji lêvên sirûdbêjan derdikevin, biryar dabûn ku bi tenê xwe derkevin, ta ku alavên awazê û davekên wan derbas bikin, û ji her derê derkevin.**

**Dema keçikê tiliyên wî bi aramî girtin , bi lerzeke bêjimar hest kiribû, ji giyanê wî derdiket, keserek berda û pistepist kir:**

**- peyvên min rikeber in, rikeberî bi tiliyên min re dikin.**

**Bêdengiya yara wî kûrtir bû, ji her tiştê ku ew anîbû ziman,ew maça biçûk kurtasiyeke ji xemgîniyên evîndaran , hest kir bi wê bêzariyê û ma li ber riwê wê de, berdiaxivî û go:**

**- Ev jiyan êdî tenê dilopek av e, hêsirek çav e.**

**Ev jiyan bûye cudabûyeke rizî , tozê geş dike, têgehên perîşaniyê bi me ve hatiye gerandin wek gulistana çeperkirî, evîn bi dîtinên nexweş hat e derbaskirin, henasên me hatin e gunehkirin,  di biçîmên te yên efsanî de diponijîm, bêzarî û êş ew westandibû û her dima zimanekî ase,ji zikê ferhengan koç kiribû .**

**Xwe bi tozê darê û pelên wê yên payîzî  dişuşt, meşî , yara xwe hembêz kiribû, û bi pistepist jê re go :**

**-  Ey mîra a xwe bilind dibîne li ser gîhayê kesk û genima zer û erdê şil , û çolên zuha .**

**Ji bilindiya xemê te ez fêr bibûm, çawa şer bikim û  xwe radestî xemsariyê nekim.**

**Tewr nikarî hez neke, evîn ma rênas ji wî re û mirin ma jê re metirsî, tewr di jiyana xwe de derew ne dikir, ji ber vê jî min nikarî ezê ê bi nivîs û xemxwariyê hewesdar , ji wan**

**qut bibim, min ji wan re bi tembûra xwe lêdidabû û nêzî axdariyên wan dibûm, min soz dabû wan ku ez li ser wan deynim, bi rêya çîrokekê, ji felekê re binivîsim, dibe ku encamê ji evîna evîndaran û gengaziya wan hilîne, peyvên wî  ya ku ji yara xwe re gotibû, cihên xwe di xêzên min de girtin, dibe ku jiyan bi tevaya xwe eynikek be,  nabe evîn bimre, ji ber ku em wê di hundirê xwe de dijîn, wê wêje , huner û stran bibin xemla me,ji ber ku  em ji bona hezkirî û hezkirinê xwe dijîn .**

## Qeytanek doman ji jineke ji ewr

**Tîp dibin dojeh , nexweşî  û carne li xwedî xwe dernexûn dibin, mîna refê desteyekî jinavketî, û pir caran  raman nabin , ji bilî dijhevkirinê hember tiştê ku em şerm dikin wana bibêjin, an hewil bidin wana vegerînin, wisa di kêliyekê de, pênos di cihê xwe de bû mîx, min bi mirovê serberdayî bi nav kiribû, ji ber ku çênabe ez her tiştî têxim di hundirê deqekê de , ji nişkê ve ez bêdeng dimam, min nivîs berdewam nekir, dîwar li paş min virmor dibûn, peyvên gotinê qerimîn,  metirsî li paş ramanan dirazan , mîna avisekê çarmêrgî dibûn, naxwazim -Narînê - bênim bîra xwe, ew keça bejinkurt, cîgehên herî girtî, hevyaza serdana wê dike, wek deroniya wê ya porbûyî  li ser kesan de, matmayî,westiyayî  ji her tiştî , bêhêvî ye wek  fincana qehweyekî sar li ser textebenda gulistanekê, xemxwariya xwe ,qerebalixa xwe , mûdiya tîpên xwe di çotika giyanê de weşan dikir, êdî tênagihe dan û standinên koran û nalînên keran , em ji zangoyê derketin, ta ku em fîncanek kakaw vexwin, lê belê bi dizî ve sar bû ,ji sedema gengeşeyeke xav û kurt mîna bejina wê, dibû nîşanekê ji derengiya min ji dema ezmûnê.**

**- Oxir be niha!, emê hevdû bibînin?!, tevî ku hevdîtin ne bedewtir bû ji tiştê ku min ji te guman kiribû.**
**- wa , çima tu wisa dibêjî yaw?**
**- nizanim , ji xwe bipirse ?!**
**- ez ji te hez dikim.**
**-  û ez jî.**
**Ez çûm e ezmûnê û vegeriyam, min çavekî li hemî cîgehên yên bi xwendekaran  tije bûn e xistibû.**

**Gengeş e û axaftinên wan, seyrbûna ji pirsan , yek gazindê hevalê xwe dike, ku bi awayekî ne baş bersivên pirsan bi rêya berguhê jê re veguhêzandibû, û yek din şad bû bi bersivên xwe, tevî ku ew hêvî nake , ku encamekê li gor dilê xwe qezenc bike û herwisa.**

**Ez cefayên dudiliyê weşan dikim, tenaziya xwe bi hinek temaşevanan li ser gengeşeyên yên çêbûn e di nîvê qircirekê de akinciyê dikim, bi valahiyeke ji xewin û şiyariyê diponijim.**

**Ezmûn bi awayekî ne baş hat derbaskirin, çavmatiya xwe têbînî dikim , wek endezkarekî hewil dide ku mehnedanîna xwe li ser zirziyekî derneketiye, dima bendewar ji qêrînên xwîntirşê mûdî, min telefona wê kir  bersiv da , û min gote wê :**

**- Tu dizanî  ku ez ji lawaziyê heznakim , û ji serdana ponijînê jî , ji ber ku ew maleke ji beyarê pîstir e.**

**- Û ez jî , ji xwe re temara dûbarebûyî neyne, ez ne  zîrek im bi bazirganiya peyketinê li dû tiştekî ne ya min be, mebesta min ji vê yekê , tu yî.**

**Min got :**

**- Dibe  , ez hew di hundirê henaseya  ya xwar de mişext dibim.**
**- oxir be êdî.**
**- oxir be.**

**Di berêvarekê de, dûrbûna wê dirêj ket , ji ber ku bi mebest ,nediyariya xwe di çaxekî dirêj dikir, piştî salekê xuya kir, telefon kir, payîza wê gelek bi nalîn bû ji min re got ku di wê de dijî, û dihêle ku bîriya min bike, û min jê re got :**

**- Min pencereya xwe di riwê bîrêkirinê de girt.**

**- Çima te girt ?!**

**- Dema barkirina min hat, tu dereng mayî , çendîn hundirê min germ bû bi aliyê te, lê niha ….**

**-Lê belê min ji te re got ez lawaz im û nikarim ku hundirê te yî serkêş hembêz bikim.**

**- Û ez jî nikarim bi lawaziyeke ku tiştekî bi omîd nede biqedînim, oxir be.**

**- Oxir be.**

**Nameya wê ya dawî, nîşana bêhêviyeke reş bû , bîçimên xwe lihevhatî bû , ez jê durketim , min wê binax ne kir ,ji bilî vê carê ,ta bibe qeytanek doman ji jineke ji ewr .**

## Rawestanên fêrbûnê

**Di kêliyekê de , xem mîna ewran, li jor de belav dibûn, bi rêya nîgaşdanekî tenik û westiyayî, ponijîn ew bêzar kiribû, û vînên koleyan di buhara nezaniya erebî de amade dibûn, hemî mar şiyar dibûn, ta ku konan, ji penaberan re vegrin, û ji bo lihevkirin û peymanan li ser maseyên girover de lidarbixînin, û di bin sihwana van  kelevajî û qaryaya ya li her derê de belav dibe  , ramanbûn demekî ji ponijîna me distand, me bi belavkirina tîpan, li vir û wir  destpê kir, û pirs hijmara xwe ya berejêr destpê kir, belkî me ji vê temara  dirêj şiyar bike.**

**Ropela sipî ,hemî hêza xwe kome li ser hev dikirin  ta ku giraniyên peyvên mezin yên birçîbûn û binpêkirinên ku Efrîniyan  di efrînê dikşandibûn hilgirin, azariyên jinên yên rût û tazî di zîndanên çeteyan de, li ber kamêreyan de aşkere dibûn, li ber her kesê ku bi dilekî sar wana dişopand, li ber çavên navnetewiyên me ,yên doza paş komara Eflatonê dikirin, û li pêş çavên kurdewarên me yên bi xurtî ,bi werîsa hevgirtina xwînmijan girtibûn .**

**Êşên zarokên pêxwas, li dûr xêvetgehên Şehbayê de digeriyan, ev sermaya reşmarî xwe li dûr qirikên zarokên Serê kaniyê dipêçand, û dirêj ta Girê sipî digeriya, sirûda jihevketina mala kurdî dûbare dipêjand, û hîn ew ewtewta rabûyî di nav xwe de qelsî  û pîsbûnekî kûr vedişart, destkeftiyên civaka navnetewî di derbarê Rojavayê Kurdistanê bi destara bêdengiyê xwîn û hestî dihêrand, û hîn ew kulbûna penceşêrî ,lutkeyên Efrînê binpê dikir, û serweriya xwe li ser kevokên sipî desteser dikir, ew**

**hewildabûn bêhtirî carekê ku bi qebqebên xwe awaza azadiyê bişopînin .**

**Û keriyên xwînmijên por dirêj bi serbirin û şewatên zeviyên xelkê destpê kiribûn, ta ku sincên ronahiyê ji kokê wêran bikin, ev hemî ji bo temamkirina xeleka bizdana kurdî,barûd zeng negirtin û ne çekên xurt yên bi destê tirkan hatibû bikaranîn, moralên sloganî zeng negirtin û hîn qêrînên girtiyan pemal nedibû , yên hatin e revandin û kuştin, kî dikare wisa yekbar bimîne li ser xwe , di rewşekê temena wê bi salan e, êdî bihnên xwe yên dawî bilêv dikirin.**

**Pîvana rastîn ji azariya wan pênc salên derbasbûyî bêhtir e, ewan deh sal in ji tirs û zor û bêdengiya newêrek ,bi pîvana hêsira zarokekî , nalîna dayikekê û bavekî , û ewrekî reş û ezez, tariyekî tîr û zuha ye.**

**Em kê çi vê koçberiyê binav bikin, êdî ket henaseyên me û binyad bû.**

**Em kurd in, li ser quntarên êşê de sekinîne, şaristaniya me ya kevinar bergiriyê li me nake, em bûn e wek keriyên pezkovî û şêrên yên li başûra Efrîqiyayê hindek mabû qir bibin.**

**Em penageya jiyanekê dibin, wek germbûna zivistanê sir e, çîroka rojavayê welêt dibêjim, yê çavên xwe li ser çakûça zordariya ji polatê vekiribû, û li gel çakûçê di katên bêdengiyê de razabû, û niha bi henaseyên tazî dest bi cenga xwe ya troyî dike.**

**Ji cilên cinavê sipî û mirinê re gelek dêm hene, û ciwantirîn dêm ji mirinê re ,ew mirina aşkere û zelal e ,  mirov di katên sistbûna gewdeyî, ji ber ku tûjtirîn cureya mirinê, ew mirina hest , rûmet, cinav, bîr , dil û mirina hiş e, û ev rêbaza kujer û kuştiyan e û pîlangirê pirojeyan in, di rojhilatê nizm.**

## Rûznameya evîndarekî ji Kobanî

**Ji ber tu di jiyanê de xuleka xewineke ez wê jiyan dikim, min biryar da te bênim bîra xwe, li ser te bi meraqa zarokan binivîsim, ji jiyanê bi bêstek û xulekên wê ez bêzar bûm , di 21 ê Adarê de ez derektim, li te digeriyam, ez rastî gelek keçikan hatibûm, lê min te nedîtibû , li te di gerestêrk û neqşeyan de digeriyam lê rastî te nehatibûm, hêsirên min gav û şopên celbê, şerpîna baranê, mayînên sînoran û têlên wê dişopandin, ahînên min in bê dawî hatin e  min, tirumpêl niha li ser rêyên bîranînan bi min diçe , xemgînî li rast û çepên min tên  , eger berî xwe li çi alî bidim, wek rawestgehên rêwîtiyê li pêş min diyar dibin .**

**Tu dûrî ji min û ez jî mîna tekerekî şewitî li ser Meştenûrê , di şeva Newrozê de gur dibim.**

**Ez berve mirnê diçim , û jiyanê tenê di çiyayên te yên sipî de dibînim, bi te hest dibim  mîna bazekî bi tenê û birîndar, zêde metirsîdar dibim.**
**Omîda min tu xemgîn nebî.**
**Omîda min tu girnijîn bibî.**
**Welatê min.**

**21-Adarê – 2007**

# Şagirtê dojehê

**Berêvara nediyar me bi bûçikên cixareyên xwe dax dike, êdî hema derbasgehên hezkirinê di bîçimên me yên navenav de vedimrin .**

**Bi hemî evîn tu dinivîsî , di navbera te û gotarê de zendekî ji sîberê ye, li ser felekê , bi reşbîniyê mêrekî gîha du hezar sal diaxivî, ta ku tu carne ji min re bibêjî:**

**- Berêvar peyvek perjeng e , kokên hêviyê vedike, û evîn peyvek bîrêkirin e ,bi helbestên perjengê destpê dike.**

**Ez bi vê diramim , ji ber ku hêvî hemwateya hemî perjengê , an nalandinê ye, me dike li pêş berberiya narvînê de, di kêliya nivîsandinê , ji nû ve tu dibêjî :**

**- Bizanibe ey helbestvan ku tu ji malzaroka serêşiyê û ji hundirê derdkişandinê û êşê zayî.**

**Tu pirsên percankirî dadigrî , min dixî di nav rastehatinan de , dema ez hewil didim tiştekî ji zaroktiya xwe li gund vegerînim, û ez li ser piştê kerekî bûm, bena yê bi amana lastîkiya mezin , girêdayî dikişkişîne, li jêr bîrê dadikeve, piştê ker bê kurtan , êş dide kesê  yê li ser rûdinê.**

**Gundê te yê dagirtî dilşikestin , bi keserên hov tijebûyî bû , çendîn ji aramiya wê hez dikim ,bi rêya axaftinekê**

**hênik li gel te , bi kûrbûn di kûrahiyên felsefe û nepeniyên wê diramim, çendîn ew gira nêzik mala we, bedewtire,**

**gelek tişt ji awirên min in dûr ji ezmên re dibêjin, dûrî simên tirs û metirsiyê  ji siberojê .**

**Ez li ser bedewtirîn helwest dinivîsim , ew tiştê ku ez pê şehnaz dibim, tevî tarîbûna rojên lawaz  .**

**Mirin ew çîroka dûbare bûye di jiyana me de,  kesên din bêdengî û koçberiyê davêtin e hevdû , di dema ku em çîrokan dibêjin, wek kesên yên cixareyên titûnê xistin e devên xwe,  bi xwarina êşê, timî kêfxweş in, me jiyana pepûkên xwe berdewam jibîrnekiribû , lê belê em hayhoyên wan di xulekeke ji ramanbûn û serbizaftinê dikşînin, em li ser rastiyê dizanin, ew cihê tinazîkirineke bi armanc e ji jiyaneke ne ya me ye.**

**Çênabe kêliyên derbasbûyî malgir bibin, ji ber jiyana me vala ye ji çi hilmê, ji bilî talîbûna ku  bi gewriyê digre, di dema giriyê de dibrêje, min dixwest ji te re binivîsim, bê agehdarî , ta tu bizanibî ku tu di bîrê min de yî, wek çi canxwastingirekî ji dizî ve li tiştê buhirtî dinêre.**

**Erê birêzê min , ey gundiyê serkêş, yê bazdayî mîna hemî serkêş û cotkaran, ji piş û kurtên komên tundirew , yên diman mîna penceşêrê ,li deverên me de, berve Entaliya yê diçî , berve bajarê yonanî yê bihna şarisyaniyê jê tê  diçî Entaliya ya tirkan wê binpê kiribûn, nalbendê hespan, ta tu henarê çinî bikî û di êvarê de westiyayî  vegerî, mirin ji vê jiyanê re û mirin ji felsefeya birçiyan û sloganên wan.**

**Te rojekê ji min re got , wek ku tu xemxwariyê radigihînî , û belav dikî, dema te bi pistepistek miqris ji nişkê ve, te bi min re got :**

**- Em zarokên xemxwariyê ne ,di civakekê de dijîn, azad têde bindest e , mirin ji wê jiyana pepûk re, ti azadî nîne, ew ji rewrewkên lawazan in ,herwiha dojeh jî hevalê min ,ew baveke ji kesê ku derdan dikşîne, û birayeke ji kesê yê dirame û dayikek e ji kesê ku daxwaziyan dike.**

**Mirin ji dojehê re , çendîn ez rawestiyam , çîroka min ev bû mîna rawestgehekî bi êş , rehjenên dilê min ,piştê xwe bi bûçika katekî li dîwarekî girs de girêdabû, û ez hemî tiştên yên bi giriftariya êşê re hevaltiyê dike, di dema axaftina li ser êşê, belav dikim, tevî vê jî pêdiviye ku ez malê te yî wêranbûyî û çîrokên gundê ku ez û apê xwe me li hev kir li ser binavkirina wê, gundê miriyan bînim bîra xwe, û niha ew gund bûye yek ji derbasgehên şer û eniyên yên têde şer bi mirinê re tê kirin, navên wan di wan dever û şikeftan de jinbî bûn , hinek jî dibêjin ku di binê şikeftên wan de entîke û zêr hene, min ti hêvî di welatên bizdanê de nedît, û bajarên sîbera fereh , mêrên wê lehengiyê bi gotin û zîtzîtan diyar dikin bi rêya lêdana jinên xwe û barandina sixêfan li ser wan min tenê dengê pênosê didît, dema hêrsa xwe bi ser her tiştekî bi êş derdixistibû .**
**Tu şagirtê - Şopinhûrî - dema tu pesnê dojehê didî, çendîn tu bi azariyê re dilsoz bûye , bi rêya rûniştina xwe di bin wê de, dema te li vir digot :**

**- Bawer nebe bi striyê bêzariyê di nav gulan de, li paş êşên jiyanê zelalbûna hêviya wêrek berz dibe, ez bi tiştekî ji bilî nivîs û gotinên xwe bawer nebûm e , nalîna xwe derdixînim li ber xemgîniyê, vaye em gîhan e li qeraxa mirinê , çi hîn maye ey dojeh, bibe çi tu dixwazî û bisojîne, tiştê tu divê , wê ji bilî barên meraqên me raneke, ew hêsir û bêhêviyên**

**yên li ser me giran bûn e, em hest nebûn e bi zikreşiyê li ser miriyan.**

**Di dema dan û standinên me de , Heleb bi dîmenên serhildanê û rabûna li ser piyan dagirtî bû , û dengê top û qurşînan ranewestiya, ez dojehê dibînim, bang dide, û dengê wê li taxa Şêx Meqsûd ya xerbî bilindtir dibe û goristana Siryan ya kevin baş hawarên miriyan guhdar dikir, geh bi navê azadiyê û geh jî bi banga – xweda mezintir e yê bi zordariya har dagirtî bû , û pir ji caran , min guhê xwe dida li dengên yên radibûn ezmên bê hespên bi bask , û lingên yên li pêlavan digeriyan ,ta ku ji malekî wê piştî kêlîkekê were rûxandin derkevin, û li vir , li ser derbasgehên koçberiyê , xewinên me radibûn jor, mîna hilma bê û domana ku ji devên yên bi sermaya zivistanê hatin e dorpêçkirin derdiket, li ser dirêjî sînorên dûr yên vedenga pêlavên leşgeran wan dişopand .**

## Şewqdana giyanê

**Ew hevrika min e di hezkirina gewdeya dilçûyî de, di ferehiyên xewinên min de buhirtî ye.**

**Li gel min binçengê berbanga metirsîdar helmijîn dike, cilên perîşanên têr bi fêrbûnên xwe xemilî ne, endîzên orispiyên westiyayî ,li ser nivînên felekê de, xwe bi serîn dike, çendîn ez şerm dikim ,ji tiştê ku ezmana şîn li ser gewdeya xwe de, ji xwîn û gurandinê dibîne , jê re guhdarîbûna min e.**

**Firinde êdî dev ji şaperên xwe berdidin, dûvên dûpişkan bi xwe ve dikirin, nema firtikan ji cadeyê pencereya min dixun, ji ber ku zimanên maran yên di devê wan de jê re dibûn kelem, ez gelek di şevekê de bêzar bûm ji dema xwe .**

**Ev şeva, ji hev ketibû, min hîn di lezoka yekem de, ji çavzêliyê re hêlabû, ez ponijîna xwe pir caran dinivîsim bi hijmara zivîrandina erdê li dor xwe de, tiştê bi êş di guhertinê de, ku hevalên me hîn ji kelexa xwe ya pîroz derneketibûn.**

**Ew kelexa yê li paş sivîlbûnek derewîn de berz dibe, dibe xwe vedişêre, dibe jî ku hîn di qehfê – Nemrod – de spartî be.**

**Ew kelexa ji kêm kes ve xuya dibe, yên berkenê mirovê gewre nêçîr dikirin, bi kamêreyên xwe yên deherok , dîmena giriya wî digirtin.**

**Bi dîwarên yên evîndar bi ser de efsanên bendewariyên xwe yê tirsdar dinivîsandin lêkdan dibim, di katê xwe de vebijîn dibim.**

**Ez gupek mezin bi qasî kevçîka çayê  vedixum, ji sêwirê dirinde , yê li deryayên ramanbûna min de xwe bi cih kiribû.**

**Peyalên xwe yên binefşî dirjînim, li ser darebestên tunebûnê de helçon dibim, û ji ropela tazî re aşkere dibim, jê re bawerkirinên xwe dibêjim, ku wê bikim şanoyekî dagirtî bi cîtengiya nerm, têde – Ehlam Mestexanmî –  bi aramî raze , dûrî xêvetên êşa Cezaîrî .**

**Ev şano , nû dike hevaltiya – Gogan – bi – Fankux – re û zêde êşê binyad dike di navbera  - Edonîs – û – Bul Şaûl  de û di navbera – Cubran – û – Emîn Rêhanî – de, ev şanoya nakok û kûr bi zivirbûnên xwe, - Elbêr Kamo  - li ser sehneya wî radibe, bê ku bitirse ji sixûrê Sofiyêtî ,û têde – Endir Şaft -  bi cih dibe ta ku – Berbara- bibîne li ber çavê hêsiran , -Birnadşo – .**

**Di hundirê min de navnîşanên şeveke sermediye, dibe ku dînbûn hogirê min be , evîn rêhevala min be, di katê zayîna astengbûyî li her cihekî bedew de , bedewtir e ji tojbûna amadebûnê di dojehê de, çi rê ji jiyanê re bê giriya nerm nîne, li ser rêyên rabûyî berve êşê de, û daketî li qeraxê hêviya dirêj û dûr de, ez berve asoyên xwe derdikevim, bendavên belavbûnê û herêmên  wê ya nepenî diqetînim, di hundirê min de nifira keşe û perestgehan e, ta ez hêrsa xwe bi ser şagirt û xwediyên mêrê eyînê yên virnas derxînim, xweda li ser wan mîztibû !.**

**Metirsiyên vêketî , li ber ristan de xwe rêxistin dikin çirayên rehniya xwe li derbasbûyan re , bi qerebalixên xwe hildigrin.**

**Gelek êş ji meraqbûnên mirî re dihêlim, henasêyên xwe paş perdeyan, perwerde dikim, xwe jê re dikim eywan , ta payîz beranberî wê ,jê re bibe kavil.**

## Sîmfoniya zayenda kêmhatî

**Ez nizanim ji ber çi  bêdengî , bi çavên xwe yên dagirtîne keder û hêsir , li me dinêre.**

**Ev bêdengî bi me re bê beranber derdikeve, me bi pendê dadigre, di kateke em têde bê sûd mest dibin.**

**Mîna deziya domanê têdiçin , ji reswabûna mûdî, dem derbas dibe bi rehjenên dil re, di heman demê de, bi dîmenekî dilkêş, ji bihejivîna lêdana fêrek ve derdikeve, ew awirên ên rastiyê pesndan dikin, bi wergirtin û desteserkirina xwe .**

**Wek ku sehker bitenê dikarin dîtinê tekûz bikin.**

**Meraq jî diyarbû bi bedewtirîn wateyên xwe , û rûtbûn bû ,raberkirinekî saxlem, parçe dibe ,di wêneya hestên gurbûyî, meraqekî çêdike, dixwaze destxistin , malgirtin û zordariyê bike.**

**Hêzên xoşiyê , bi bêdengiya dilbijûk re pevdiçin, di kêlîka helçûn û geşepêdanê, di wê demê jî, rehjenên dil bi lez dibin, ziyanê radigihînin, hewl didin, bigihin bûneseriya nehatî pêkanîn , di katê derperandinê .**

## Temen

**Hemî rêwê diçin, bê ku xircirê bikin, lê ji ber çi xewinên me yên şîrîn , cîhiştî nabin .**

**Çima hemî tişt li vir û wir belavbûyî dibin, û gelek koleyên evînê ,berê xwe didan li çi malên kambaxbûyî û bêkesmayî, di baweriya wan de , ku ew perestgeh in,ji evdalî û ramanbûna tiştê buhirtî , çûyî û berbadbûyî.**

**Birastî , dilxwastin sert bûn bi dan û standinê xwe bi pakrewanan re , hemî diz  ji kaniyên zordarî û arîşeyî vedixwarin, ji bilî wan,ewan bi tiştê li ser wan hatî şadbûn, ji ber ew ji qurbaniyên catiya winda ne,ji temenê mayî, di cîhaneke hindik mayî tune bibe.**

**Ez dizanim ku windabûn paş mişextiya te ye, bi kulemergiya te hilkumîn dibim bê sozdayîn.**

**Tu rast şevbûrîkirina min dibî, ew jî mîna mîvanekî ewanebûye,di kolekekî zivistanî de, ji siha arezûya te bi sarbûna reh,vedixwe.**

**Ez rastî dêmê  te dibim, ey koçbûyê paş min , bi hêminî, nerm dibî bi hembêzkirina min  û carne sar dibî, dûrdikevî , mîna sêwirekî difire , û nizan e li kû , wax ji taya bîrêkirinê.**

**Findeke nû di tariyê de vêdixînim, bi stranekê an qêrînekê , rikberiya wê dikim, ta bi piştrastî raze, an bi xweşecanî bar bike, wê findê şewitî di rojbûna xwe yê sedsalî de vexwendî bike, ta hemî evîndarên giryayî, şeva bêbext bi dînbûn şermezar bikin, ta xemgîniyên xwe nû bikin, û  şewatên xwe vêxînin, ji ber kokên evînê najîn, bê ku serî hildin , ta ku bahoz û tariyê û reşatiyê reşkujî bikin, bi sawa dildariyeke nayê jêbirin, lê tê parçekirin.**

## Tiştekî mîna xewinê ye

**Ez nizanim wê çi bi min re çêbibe,dema ez deriyê nalînê li xwe vedikim,deriyekî kevin min digihîne ku ez te bi bîr bînim,bi nameyê te yê bi tenê a te ji min re nivîsandibû biponijim , berî ku şer û pevçûn li Sûrî gur bibe, welatê yê bû goristana xewinê , şevpestan wan xwaribû, zivistan di heman rewşê de pir dirêj e , wek tê xwestin, axaftinê min li ser te wê ne nû an kurt be, Delîl , tu demên dirêj di qehwexaneya Intirnêtê derbas dikî, li gel wê kirêta ya te bi nav kiribû, yê ziman dirêj û hiş xerpişî, te pêre sixêf parve kiribûn û carne te pişta xwe li ber rûtbûna wê bi rêya kamêraya Laptopa tozgirtî anî, te baş dizanibû ku bi min û te re di eynî demê ,sextebûnê dabeş dike, ev çaxa peyvên giran in, di vê cîtengiya ya xwe mîna reşmaran ,di rêya me ya zerbûyî de dirêj dike, ew bi peyvên xuşînî mîna rihê daişiyan diramin, pordirêjên yên derbasî çi gundî ji bajarên me dibûn û ez nizanim bi dawiya vê nalîna ku tim li min vedigere, wek vedenga qels û ez berî wê min ropel dû ropel diçirand, heta ku ez rastî ewlehiyeke demkî werim, ta te wînim bîra xwe, ey lawazê zirav mîna çîrokekî rojavayî , artşên zordariyê wê binpê kiribû, hemî sipîbûn di nêrgizê welatê min de jêbiribû, te ji min re got dawî carekê , ku tu tevlî hêzeke leşgerî bûye, hember zordariyê radiweste, lê min pê hest kir ku ew gotinekî pûç e di kasêteke zengarî , piçûkirinên biran tu nema dikarî derbas bikî, hemî li pey qurşîn , mirin talankirin û diziyê diketin, û tu hîn li ser xewineke**

**sêdarkirî nanê xwe dixwî, bi rêya qêrînên – xweda mezintir e – û destên har yên stuyan jêdikirin wek ku dîroka dirinde ji nû ve dûbare bike, di dema ku tu hemî ropel û şermezariyên xwe dicivînî ji penaberiyek ta penaberiyekê .**

**Heta penaberiyên me di nav leşgerbendên dizên qîmkirî, û dizên yên cilê artêşa fermî li xwe kirin e, dabeş dibûn .**

**Li qehwexaneya intirnêtê , hevdîtina me li wir bû , di destpêka berî mirina giştî di welatê min de, êdî me tiştek nas kir navê wê – Fecebook – te ez fêr kirim ku çawa wê bikarbînim, û çawa Emailê li ser Hotmailê çêbikim, ewan xweştirîn kêlî bûn, axaftina li ser wê xweş in ji ber ku sawîlke û gengaz in , berî ku mar zêde girs û dirêj bibin li deverên me yên pepûk de, mîna nanê belengaz û sêwiyên xwe.**

**Bîranîn gelek dirêj e, û ev asîman têrî çi qêrînên te nake, tu li benda mizgîniyekê dimînî, li bendê vejînbûna xwînên nû û hişên nû dimînî, li benda xewineke ku me ji bona wê dirêj em diman, derveyî komê, lê bajarê min Kobanî yê bi şûkulata evînê xemilîbû, û bi awirên biyan û biçûk matmayî bû , kolan û qeyseriyên taxan çavdêr dikirin , li gavên lingan û livên xelkê, dinêrîn.**

**Çendîn barana Kobanî bedewtir e, kolana 48 , girê Meşte nûrê, navenda çand û hunerê, darên hikûmetê,**

**bîçimên te dema tu helbestekê dinivîsî û li ser malperan de belav dikî,wisa xewinên me li gor meş û gavên me bûn, dema ez serdana xewineke biçûk an kêliyeke bi ken dikim, û berve qehwexaneya te têm, nalînê mîna taştê dixum, bi pênosa xwe digrim û dest bi nivîsê dikim, bi bîçimên germ tu bi min re diaxivî, mîna peyala çayê tu bi girnijînekê amade dikî, û niha jî ez mîna çi zarokî bi xwe mijol dinivîsim, çenta xwe ya dibistanî , pênos, pêsirînk û tênosa xwe dicivîne û diçe, ta ku raze ji ber ku sibeh wê zû ji xew rabe û biçe dibistanê.**

**Nivîsandin hezkirin e, dînbûn û şadiye, dema ez li her quncikî de dimeşim, ta ez rastî wateyekê werim, hembêzkirina hest ji erdê re, di gavê baranê, me xewin dû xewin , leylan dû leylan derbas dikirin , bi rêya meşa xwe ya dirêj heta em gîhiştibûn e malê, hestên nivîsê têkdiçûn dema hewil didan li ber kêliyên bedew de rabin, bi çavdêriyeke sert li ser hemî tiştên derbasbûyî û çûyî, herdû kurên**

**te yên ketine rê , di dema ku ez li kêlek laptopê rûdiniştim, xulek û bîstekan distînim, dema dikevim intirnêtê, û ropela Fecebookê li tiştê ku em bi rêya wê derdixînin, û derbasgehan di nav xwe û kesên din de saz dikin .**

**Newêrek naveroka çandê, ji navenda rewşenbîrî dizîn, li kêlek wê ewlehiya siyasî bû û li ser çepê wê de ,navenda partiya kevinar bû , û me ji çepikvan û derewkar û**

**daholciyan cîgehekî ji pozbilindiya xwe ya pîroz nedîtibû, ji ber vê jî , me di asîmana intirnêtê de bihnekî herî azad ji awaza azad û bitek dîtibû, li ser kevîkên nexwastin û pêta xewina ya wê helbet pêkwere , niha û piştî derbasbûna çend salan ,ji cenga navxweyî , tu ji min , li ser dizên nû dipirsî, cilên ol li xwe dikiribûn, û bihnên xwînê ji wan dihatibû , û qurşînên xwe berdan, çendîn em jê revîn û li ser komên çete û şoreşgerên kujer tu dipirsî, yê her yek ji wan xwe kiribûn nûnerekî fermî li ser gelên yên fêrî koçberiyê bibûn, ta cihekî ji xewinên xwe re bibînin, û hîn axaftin maye.**

## Valahî

**jiyan nerewayî ye, wek tê xwyan, ji ber çi em bi kêşeya heyî diramin, û em nîv dîtin in, nikarin dadperwerî çêbikin an ne diyariyekî çareser bikin, emê çi hêvî bikin, ji bilî şewatên demê niha, sextiya siberojê , û êşên hestewer û nîgaşdanê.**

**Ji bilî reweştên qepal di xwarina êşa belaş de û gilêza wî ya sargerm.**

**Derewa heyînê bi ser piraniya mirovan pêk tê ,   di dilên wan de bihna hêviyê ye.**

**Ewê biyan, ase ye ji têgihiştinê , nikare bi çareyekî birame, ew aloziya wênegirtinê ye, di vê hebûna metirsîdar , zehmet e ku em di çarenûsên tiştan de derbas bibin.**

**Dimeşin ta ku biyanan bibînin, sêtavan hembêz bikin.**

**Ev maça bendemanê ye li ser eniya penaberên yên hêsir û dilên xwe di wê penaberiya çavpan de winda kiribûn.**

**Ev qehfa alindeyê ye li ber rûçika heyvê de, di kêlîka roçûnê de xewindîtin dibe.**

**Li ser jiyaneke hatiye afirandin dinivîsim,berve şikestina xwe bê tirs diçim.**

**Ez û wê du nîşanên nepenî ne, em cengê bi narvîna şilîbûyî re bi maçekê an hembêzkirinekê dikin, li ser xemgîniyê bi serdikevin.**

**30-Cehzeranê- 2010**

## Viyana jineke evîndar

**Yarê min e, ê gencîneyên ezmên ji hêsirên cerxên nemayî ji baranê tiji kiribû, gewdeya min e dilnizim ,bi tazîbûna wê bipejirîne, bi gehiya xwe pîroz e, azadbûyî ye bi bilêvikirna xwe, bi gotinê xwe rewanbêj e, hemî zimanên cîhanê bilêv dikir, wek xelatekî bedew bipejirîne , dibe ku tu pê xweşecan bibî, û bi rêya evîna min ji te re bangên azadiyê , li ser qeraxên te de hêvî dikim, sozên evîna xwe didim hev, bi rêya sertiya te, ez te vexwendî dikim ta tu bi giyanê min kevî ji nû ve, ji ber ku kaniya rizgariyê berz e , di deverên min de , yên ji agir û rakêşeriyê cîteng bûn e, bi çeyê çavên te ,yên bûn penagehekî, ji xwedawendê deryayê û xwedawenda bêr û bedê , memikê min ên tozgirtî bi avê dilê xwe bişo, milyonên êş ,di giyanê min de xwe bi cih kirin e, xwe bi axdariyê mest kirin e, li ser gêncbûnekî di hestê min de sist bûn e.**

**Yarê min , çendîn tu min wek romanek evîn dinivîsî , di nav xêzan de tu rûtbûna felekê şermezar dikî.**

**(bi dawî bû)**

**- Jiyangeriya Daner :**

* Rêber Hebûn (Rêber Adil Ehmed)
* Nivîskar, helbestvan û rexnegir
- Bi du zimanan berhemên xwe dinivîse Kurdî û Erebî
* Rojbûn: Munbic - Rojavayê Kurdistanê 02.11.1987
* Di zangoyê Helebê de beşê zimanê Erebî xwediye
* Pirtûkên wî yên çapkirî :
- Qêrînên Roniyê, Helbest, Erebî- 2016
- (Leylan û nerîn, deq û xwendin – Erebî 2017)
- (Komekên Kurdistanî, pexşan, Pexşan,(Hevbeş e bi pinar Kobanî re - erebî -2019)
- (Qêrînên roniyê , Helbest – Kurdî-2020)
- ji hevkirina simbûl di romanên Helîm Yûsiv-rexne- Erebî 2020
- **Evîn hebûn e û hebûn zanîn e – raman- Erebî 2021**
- Bi sedan gotarên wî hene, li ser gelek malperên Elketronî û rojnameyên Kurdî û erebî de hatibûn e weşandin.

* Dameznerê malxaneya - Kombûna Zanyarên Azad- a eleketronî .

**https://reberhebun.blogspot.com/**
**reber.hebun@gmail.com**
**Whats app:004915750867809**

## - Naverok


| | | |
|---|---|---|
| 1 | **Diyarî** | 4 |
| 2 | **Hebûn destana heyîna dilgeş** | 5 |
| 3 | **Arezû** | 8 |
| 4 | **Azadî** | 11 |
| 5 | **Bangên du dînan** | 12 |
| 6 | **Bangên jinekê** | 16 |
| 7 | **Bazdan ew penageye** | 18 |
| 8 | **Bêdengî** | 20 |
| 9 | **Bêhinvedana şademaniyê** | 21 |
| 10 | **Xêr** | 23 |
| 1 | **Berî vegerê** | 24 |
| 12 | **Bîrnameyên birçîbûnê** | 27 |
| 13 | **Çirûskek xircir** | 28 |
| 14 | **Dema dînbûnekê** | 29 |
| 15 | **Deqên gelek kurt** | 43 |

| | | |
|---|---|---|
| 16 | **Rojbenda xewinê** | 56 |
| 17 | **Diltehlî** | 59 |
| 18 | **Êşa peyv** | 60 |
| 19 | **Evîn vîna bedewbûnê ye** | 65 |
| 20 | **Evînekê** | 66 |
| 21 | **Ey sih** | 69 |
| 22 | **Ezmana şadiyê** | 70 |
| 23 | **gewdeh** | 77 |
| 24 | **Girî** | 78 |
| 25 | **Girtinhev** | 80 |
| 26 | **Dewlemend û xizanekî** | 85 |
| 27 | **Xwezî min ji hebûnê bar bikra** | 87 |
| 28 | **Hembêzkirin** | 91 |
| 29 | **Hişbûn** | 92 |
| 30 | **Jibîrkirin** | 95 |
| 31 | **Kêmbûn** | 96 |
| 32 | **Metirsiya siberojê** | 99 |
| 33 | **Metirsiyên dilekî** | 102 |

| | | |
|---|---|---|
| 34 | **Mirin** | 106 |
| 35 | **Narînbendên kurdistanî** | 107 |
| 36 | **Newaza dudiliyê** | 125 |
| 37 | **Qêrîn** | 127 |
| 38 | **Qeytanek doman ji jineke ji ewr** | 130 |
| 39 | **Rawestanên fêrbûnê** | 133 |
| 40 | **Rûznameya evîndarekî ji  Kobanî** | 136 |
| 41 | **Şagirtê dojehê** | 137 |
| 42 | **Şewqdana giyanê** | 141 |
| 43 | **Sîmfoniya zayenda kêmhatî** | 144 |
| 44 | **Temen** | 145 |
| 45 | **Tiştekî wekî xewinê ye** | 146 |
| 4 | **Valahî** | 149 |
| 47 | **Viyana jineke evîndar** | 150 |
| 4 | **Jiyangeriya daner** | 152 |
| 49 | **Naverok** | 153 |